

KT

Zanîngeha Mardîn Artukluyê  
Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê  
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

DI TRADÎSYONA DENG BÊJIYA KURDÎ DE ŞAKIRO  
(JIYAN Û BERHEM)

Serdar ÖZTÜRK

10711015

Şêwirmend

Doç. ê Alk. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn 2014

KT

Zanîngeha Mardîn Artukluyê  
Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê  
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

DI TRADÎSYONA DENG BÊJIYA KURDÎ DE ŞAKIRO  
(JIYAN Ê BERHEM)

Serdar ÖZTÜRK

10711015

Şêwirmend

Doç. ê Alk. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn 2014

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürlüğüne

Bu çalışma jürimiz tarafından Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında YÜKSEK LİSANS / DOKTORA TEZİ olarak kabul edilmiştir.

(imza)

Başkan :.....

(Akademik Ünvanı, Adı-Soyadı )

(imza)

Üye :.....

(Akademik Ünvanı, Adı-Soyadı )

(imza)

Üye :.....

(Akademik Ünvanı, Adı-Soyadı )

(imza)

Üye :.....

(Akademik Ünvanı, Adı-Soyadı )

(imza)

Üye :.....

(Akademik Ünvanı, Adı-Soyadı )

Onay

Yukarıdaki imzaların, adı geçene öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

İmza

.....

Akademik Unvan, Adı Soyadı

Enstitü Müdürü

(Mühür)

## PÊŞGOTIN

Muzîka kurdî li ser hîmê dengbêjiyê ava bûye. Ji ber ku azadiya zimanê kurdî û perwerdeya kurdî nîn bû ez bi derengî bi vê gencîneyê hesiyam. Ez jî wekî hinek xortên kurd berê bi muzîka tirkî re hevnas bûm. Min li xwendîngehê û di nav hevalan de stranên tirkî digotin. Car caran digel ku qedexe bû jî malbata min di radyo û teyiban de li kilamên kurdî guhdar dikirin lê van kilaman wek zarokekî bala min nedikişand. Li aliyê din jî min meraq dikir ku çima ev kar bi dizî dihate kirin. Sal derbas bûn, me bar kir em Rojekê ez çûm saziyeke kurdan, li saziyê dengê ku dilê min ricifand kete guhê min. Çûn Stenbolê. Jiyan ji xeynî nava malê tev bi tirkî bû. Piştî wê rojê min jî dest bi strandina kurdî kir. Her ku min li muzîka kurdî guhdarî kir ez bi dewlemendiya wê hisiyam. Bi taybetî ji dengbêjên kurdan Şakiro bala min kişand. Min dixwest ku ez ji her aliyê ve Şakiro binasim. Îro derfet çêbû ku ez vê xebatê amade bikim.

Şakiro di nava muzîka kurdî ya gelerî de xwediyê cihekî girîng e. Wî bi şewaza xwe û dengê xweyê zîz û zelal di nava dilê kurdan de textek ava kiriye. Di jiyana xwe ya ku şêst sal domandiye de bi dehan band ji dengê wî hatiye dagirtin, li dîwanan, civat û dawetan bi sedan kilam gotiye. Gelek hunermendên kurd kilamên wî ji nû ve şîrove kirine û bi terzeke nûjen pêşkêş kirine.

Ev xebat jî li ser jiyana, berhem û dengbêjiya wî hatiye amadekirin. Di destpêkê de pênaseya çanda devkî hatiye kirin. Di çanda devkî de rola “bîr”ê û bandora wê ya li ser çanda devkî hatiye nîqaşkirin, vebêje û çîrokbêjî ji hin aliyan ve hatiye danasîn. Nêrînên li ser mijarê yê hin nivîskaran hatine ragihandin.

Di beşa yekem de çanda devkî ya kurdî, dengbêj û saziya dengbêjiyê, di dengbêjiyê de perwerdehî; qadên ku dengbêjî lê hatiyê îcrakirin hatiye nîqaşkirin. Di dengbêjiyê de şeweyên îcrakirinê û li gor mijaran kilamên dengbêjiyê hatine dabeşkirin. Di dengbêjiya kurdî de şewaza Serhedê bi nav û deng e. Şakiro jî yek ji nûnerên vê şewazê ye. Di vê beşê de li ser hin taybetmendiyên vê şewazê hatiye sekinîn.

Dengbêjê jin ên di nav kevneşopiya dengbêjiyê de cih girtine, di warê îcrakirina hunera xwe de bi hin pirsgirêkan re rû bi rû mane. Ji ber vê yekê jî di vê beşê de me behsa çend dengbêjên jin ên navdar û pêvajoya dengbêjiya wan kir. Di muzîka kurdî de dengbêjî xwedî roleke girîng e, bi taybetî ev rola dengbêjiyê ya di muzîka nûjen de, bi hin mînakên dîsa di vê beşê de hate nîqaşkirin.

Dengbêj bi hunera xwe bûne berdevkê civaka xwe. Yek ji vana dengbêjê navdar ê sedsala XXan Şakiro ye. Di beşa dawiyê de Dengbêj Şakiro û berhemên wî bi

berfirehî hatine nirxandin. Li ser nîqasha şagirtiya Şakiro ya Dengbêj Reso, nêrînên dengbêjan û lêkolîneran hatine ragihandin. Jiyana Şakiro ya rengîn ku li Agiriyê dest pê kiriye û piştî gera li gelek deverên cuda, di 60 saliya wî de li bajarê Îzmîrê bi dawî bûye hatiye vegotin. Hunermendiya Şakiro ji aliyê deng ve xwediyê hin taybetmendiyan xweser e. Naveroka berhemên wî ji aliyê şibandin, nifir, dua, sondxwarin, gazin, erotîzm, evîn û hwd. ve bi berfirehî hatiye şîrovekirin.

Helbet di vê pêvajoya dûr û dirêj a xebata me de gelek kesan alîkarî da min. Ez spasdarê tevan im lê belê divê ez li vir qala çend kesan bi taybetî bikim.

Di serî de ji Doç. ê Alk. Dr. Hayrullah Acar re spas dikim. Wî bi dîtin û ramanên xwe, derfetên xebatê dan min, şewirmendiya min kir. Her wiha ji bo keda wan a ku rê li ber xebatên kurdî vekir ji serokê Enstitûya Zimanên Zindî Prof. Dr. Kadri Yildirim û Doç. Dr. Abdurrahman Adak re jî spas dikim. Dîsa ji bo pêşniyarî û alîkariya wan spasiyê bo serokê Beşa Ziman û Çanda Kurdî Mamoste Ramazan Pertev, Mamoste Zülküf Ergün, Doç. ê Alk. Dr. Mustafa Aslan û Doç. ê Alk. Dr. Şah Vali dikim. Ji hevalê xwe yê hêja Tekin Çifçi û hevsera wî Sema Çifçi re spas dikim. Ji destpêka tezê heta roja dawîn bi rojan deriyê mala xwe ji min re vekirin, ez kîrim mêvan, di her beşa tezê de alîkarî dan min, bi çavekî pisporî teza min xwend, sererast kir. Zeki Gürür di deşîfrekirina gelek kilaman de piştgirî da min. Davut Yeşilmen, Ahmet Kan û pismamê min Mahmut Öztürk di berhevkirina çavkaniyan de alîkarî dan min. Celil Badıkanlı jî di hevaskirina malbata Şakiro de piştgirî da min. Mamoste Servet Deniz teza min radakte kir. Kekê min ê mezin Gültekin û hevsera wî Saadet di her dema xwendevaniya min de alîkarî dan min. Ez keda wan ji bîr nakim. Ji tevan re spas dikim.

Serdar ÖZTÜRK

Mêrdîn – 2014

**KURTE**  
**DI TRADÎSYONA DENG BÊJIYA KURDÎ DE ŞAKIRO**  
**(JIYAN Û BERHEM)**  
**SERDAR ÖZTÜRK**

Çand, têgeheke wisa berfireh e ku tevayiya bastanî, kevneşopî û baweriyên û di nav xwe de di hewîne, bi kurtî ew tiştên ku mirov di nava civakê de hîn bûye re çand tê gotin. Çandên ku tenê ragihandinê bi ziman pêk tînin, ji nivîsê û matbaayê ne haydar in wekî “çanda devkî ya yekemîn” tê binavkirin. Bi pêşketina teknolojiyê amûrên wekî radyo, televîzyon û amûrên din ên elektronîk, nivîs careke din qelibiyê ser zimanê axaftinê, ev yek jî wekî “çanda devkî ya duyemîn” hatiye binavkirin.

Çanda kurdan jî bêtir bi awayekî devkî heta roja îro hatiye. Berdevkên vê çandê yê herî berbiçav jî dengbêj in. Dengbêjan bi kilam û çîrokên xwe çanda kurdan ji nivîşên nû re ragihandine. Wana ev yek di çarçoveya hosta û şagirtiyê de pêk anîne. Kê mîzede hemû bûyerên rojane, pîrsgirêkên siyasî, şer û evîn bûne mijara kilamên dengbêjan. Dengbêjan bi vî rengî dewlemendiya zimanê kurdî heta roja îro parastine. Lê mixabin bi pêşketina teknolojiyê re civak ji dengbêjan dûr ketiye. Derfetên îcrakirina hunera wan kê mîzede bûye. Bi hilweşîna pergala mîrektiyê û begîtiyê re dengbêj tenê mane û bi pîrsgirêkên aborî re rû bi rû mane. Di bin van şert û mercan de hin dengbêjan hunera xwe heta mirina xwe domandine. Yek ji van Dengbêj Şakiro ye. Ev xebat bi mebesta danasîna jiyana û hunera Şakiro hatiye amadekirin.

Şakiro di dengbêjiya kurdî ya sedsala XXan de xwediyê cihekî girîng e. Bi taybetî yek ji nûnerê dengbêjiya herêma Serhedê tê nasîn. Şakiro di jiyana xwe de hemû keda xwe ji bo dengbêjiyê daye. Bi dehan kaset dagirtine lê belê bi xwe tu caran neketiye studyoyan. Şirketên muzîkê kasetên ku Şakiro bi amatorî li ber teyibê dagirtine li studyoyan ji nû ve weşandine û belav kirine. Şakiro dengê xwe yê tenor bi hostatî bi kar aniyê. Wî bi stîla xwe regekî cuda daye dengbêjiya kurdî. Mirov dikare di kilamên Şakiro de nîqaş, nîfir, dua, gazin û şîretan bibîne. Bi taybetî bi kilamên evîne Şakiro bûye berdevkê dildar, xemgî û dilşadan.

Ev xebat ji destpêkek û du beşan pêk tê. Di destpêkê de pênaseya çanda devkî hatiye kirin. Di çanda devkî de rola “bîr” ê û bandora wê ya li ser çanda devkî hatiye nîqaşkirin. Vebêjerî û çîrokbêjî ji hin aliyan ve hatiye raçavkirin û danasîn.

Di beşa yekem de çanda devkî ya kurdî, dengbêj û saziya dengbêjiyê; di dengbêjiyê de perwerdehî, qadên ku dengbêjî lê hatiye îcrakirin hatiye nîqaşkirin. Di dengbêjiyê de şewêyên îcrakirinê û li gor mijaran kilamên dengbêjiyê hatine dabeşkirin.

Di dengbêjiya kurdî de tradîsyona Serhedê bi nav û deng e. Şakiro jî yek ji nûnerên vê tradîsyonê ye. Di vê beşê de hin taybetmendiyên vê tradîsyonê hatine destnîşankirin.

Her çiqas hejmara wan kêr be jî dengbêjên jin di nava kevneşopiya dengbêjiyê de cihê xwe girtine lê di warê îcrakirina hunera xwe de bi hin pirsgerêkan ve rû bi rû mane, Ji ber vê yekê di vê beşê de me behsa çend dengbêjên jin ên navdar kir, û pirsgerêkên ku jinên dengbêj pê re rû bi rû mane hatin vekolandin.

Gelek muzîkjenên kurd ê roja me di warê afirandina stranan de ji kevneşopiya dengbêjiyê sîd wergirtine, û kilamên dengbêjan bi formên cuda ji nû ve şîrove kirine, lewma jî di muzîka kurdî ya nûjen de bandora dengbêjiyê bi hin mînakên dîsa di vê beşê de hate nîqaşkirin.

Di beşa duyem de jiyana Dengbêj Şakiro hatiye vegotin û kilamên wî ji alî mijarên wek nîfir, dua, evîn, şer û hwd. ve bi berfirehî hatine nirxandin. Li ser nîqaşa şagirtiya Şakiro ya Dengbêj Reso nêrînên dengbêjan û lêkolîneran hatine ragihandin.

**Peyvên Sereke:** Şakiro, Çanda Devkî ya Kurdî, Dengbêjî, Kilam, Dengbêj

**ÖZET**  
**KÜRT DENGEBÊJLİK GELENEĞİNDE ŞAKIRO**  
**(HAYATI VE ESERLERİ)**  
**SERDAR ÖZTÜRK**

Kültür; gelenek, görenek ve inançları içine alan karmaşık bir bütündür; kısacası insanın yaşadığı toplumda öğrendikleridir. Yazı ve matbaa kavramlarının varlığını bile bilmeyen, iletişimin yalnız konuşma dilinden oluştuğu kültürler, “birincil sözlü kültür” olarak adlandırılmaktadır. Teknolojinin gelişmesiyle yaşantımıza giren telefon, radyo, televizyon ve diğer elektronik araçların sözlü nitelikleri yazı ve metinden çıkarıp konuşma diline dönüştürdüğü için bu kültür de “ikincil sözlü kültür” olarak adlandırılmıştır.

Kürt kültürü de bugüne kadar daha çok sözlü şekilde gelmiştir. Bu kültürün en önemli sözcüleri de dengbêj geleneğini sürdüren dengbêjlerdir. Onlar kılam ve hikayeler yoluyla Kürt kültürünü yeni nesillere aktarmışlardır. Dengbêjlik belli bir eğitimi gerektirmesine rağmen dengbêjlik okulları mevcut değildir. Dengbêjler de eğitimi usta çırak ilişkisi çerçevesinde sürdürmeye çalışmışlardır. Dengbêjlerin söylediği kılamların konusu güncel olaylar, siyasi sorunlar, aşk ve kavgalar olmuştur. Dengbêjler bu şekilde kürt dilinin zenginliğini günümüze kadar korumaya çalışmışlardır. Maalesef teknolojinin gelişmesiyle birlikte toplum dengbêjlerden uzaklaşmış, dengbêjlerin sanatlarını icra etme imkanları azalmıştır. Mirlik ve beylik düzenin yıkılmasından sonra dengbêjler yalnız kalmış ve ekonomik sorunlar baş göstermiştir. Bazı dengbêjler bu şartlar altında ömürlerinin sonuna kadar hünelerini icra etmişlerdir. Bunlardan biri de dengbêj Şakiro’dur. Bu çalışma Şakiro’nun hayatını ve dengbêjliğini tanıtmak amacıyla hazırlanmıştır.

Şakiro XX. yüzyıl Kürt Dengbêjliğinde önemli bir yere sahiptir. Özellikle Serhat Bölgesi dengbêj geleneğinin temsilcisi olarak tanınır. Onlarca kaset doldurmuş olan Şakiro hiçbir zaman stüdyoya girmemiştir. Müzik şirketleri Şakiro’nun amatör olarak teyplerle kaydedilmiş kasetlerini stüdyolarda yeniden kaydederek yayınlayıp dağıtmışlardır.

Şakiro tenor olan sesini ustaca kullanmıştır. O kendi stiliyle Kürt dengbêjliğine farklı bir renk katmıştır. Onun kılamlarında dua, beddua, yakınma, tavsiye ve tartışmalara rastlamak mümkündür. Özellikle aşk kıamlarıyla, aşıkların, üzülenlerin ve mutluluğu yakalayanların sözcüsü olmuştur.

Bu çalışma genel bir giriş ve iki ana bölümden oluşmaktadır. Giriş kısmında sözlü kültürün tanımı yapılarak belleğin sözlü kültürdeki rolü ve etkisi



değerlendirilmiştir. Anlatı ve hikâye anlatıcılığı bazı yönleriyle ele alınıp ve tanımlanmıştır.

Birinci bölümde Kürt sözlü kültüründe dengbêj ve dengbêjlik kurumu, dengbêjlikte eğitim; dengbêjliğin icra mekânları ele alınarak dengbêjliğin icra biçimleri konularına göre bölümlere ayrılmıştır. Dengbêjlikte Serhat stili önemli bir yere sahiptir. Şakiro da bu stilin temsilcilerinden olduğu için Serhat stilinin bazı özellikleri ele alınmıştır.

Sayıca az olmalarına rağmen kadın dengbêjler de, dengbêjlik geleneği içinde yerlerini almış, fakat sanatlarını icra etme konusunda çeşitli sorunlarla karşılaşmışlardır. Bu nedenle bu bölümde ünlü birkaç kadın dengbêjden söz edilerek kadın dengbêjlerin karşılaştıkları sorunlar incelenmiştir.

Günümüzde, birçok Kürt müzisyen dengbêjlik geleneğinden faydalanarak eserlerini üretmiş ve dengbêj kılamlarını farklı biçimlerde yeniden yorumlamışlardır. Bu kapsamda modern Kürt Müziğinde dengbêjliğin önemi ve bıraktığı miras da değerlendirilmiştir.

İkinci bölümde Dengbêj Şakiro'nun yaşamı anlatılarak kılamları, dua, beddua, aşk, savaş gibi temalarla kapsamlı bir şekilde incelenerek. Şakiro'nun Dengbêj Reso'nun çırağı olup olmadığı konusunda dengbêjlerin ve araştırmacıların düşüncelerine yer verilmiştir

**Anahtar Kelimeler:** Şakiro, Kürt Sözlü Kültürü, Dengbêjlik, Kılam, Dengbêj

**ABSTRACT**  
**SHAKIRO IN KURDISH DENGBEJ TRADITION**  
**(HIS LIFE AND WORKS)**  
**SERDAR ÖZTÜRK**

The culture is a complex whole, in short the culture is what people learn in the society they live in. “Primary oral culture” is identified as the culture that communication is only formed by spoken language and those cultures even wouldn’t have the knowledge of the existence or the concept of writing and printing. However, as the development of technology brought telephone, radio, television and other electronic means into our lives and as they transform the oral text objects into the spoken language this culture is identified as “secondary oral culture”.

Kurdish culture was kept alive mainly as an oral culture. The most important representatives of this culture are the dengbejs who sustain the dengbej tradition. (Dengbej is who has a poetic style in verbal narrative and song). Dengbejs passed Kurdish culture on to new generations via kilam (songs) and stories. Although Dengbej tradition requires education there is no institution available to provide it. That’s why Dengbej bards try to continue the training within the framework of a master-apprentice relationship. The subject of Dengbej’s songs is the current events, political issues, love, and fights. They have been trying to present and protect the richness of Kurdish language with their kilams up until now. Unfortunately with the development of technology the society distanced Dengbej bards and also the opportunity to practice their art has been decreased. After the fall of Principalities order the Dengbejs left alone and they started to suffer from economic problems. Some Dengbejs have exercised their talents under these conditions until the end of their life. Shakiro is one of those Dengbejs. This study is intended to introduce Shakiro's life and his Dengbej side.

Shakiro has an important place in the 20 Century Kurdish Dengbêj history. He is particularly known as the representative of the Serhad (border) region’s Dengbej tradition. Although he has never worked in a studio environment Shakiro has recorded dozens of music tapes. Music companies re-recorded Shakiro’s amateur tapes for publishing in studios and distributed them.

Shakiro used his tenor tone voice successfully. His style added a different colour to the Kurdish Dengbej tradition. It’s possible to find prayer, curse, complaints, advice and discussions in his kilams. He became especially the representative of lovers, grievors and happiness finders with his love kilams.

This study consists of a general introduction and two parts. At the opening chapter the oral culture was identified and the role and influence of verbal memory were assessed. Some aspects of narrative and storytelling have been taken into consideration and identified.

In the first part Dengbêj instution was categorised (divided into sections) by subjects according education in Dengbej instution, the performing places and performance formats of Dengbej instution in Kurdish oral culture. Serhat style has an important place in Dengbej instution. As Shakiro is a representative of this style some of the features of the Serhat styles are discussed.

Although they are few in number, woman Dengbêjs have played a role in the tradition of the Dengbêj instution but they faced with different difficulties in performing their art. Therefore, in this section we have researched the problems Dengbêj women faced mentioning about the famous few woman Dengbêjs.

In our day, many Kurdish musicians performed their art using Dengbêj instution and reinterpreted Dengbêj kilams in many ways. In this context the importance of Dengbej instution and the inheritance in modern Kurdish music were also evaluated.

In the second part Dengbej Shakiro's life was explained in a comprehensive manner by interpreting his kilams, prayers, curses, love and war themes. The ideas of other Dengbejs and researchers about whether Sakiro was the Dengbêj Reso's apprentice was also included in this section.

**Key Words:** Shakiro, Kurdish Oral Culture, Dengbêj instution, Kilam, Dengbêj

## KURTEBÊJE

amd.	: Amadekar
b.n.	: Berhemên navborî
c.	: Cild
ç.	: Çap
h.b	: Heman berhem
hwd.	: Her Wekî Din
j.	: Jimare
h.g.	: Heman gotar
r.	: Rûpel
s.	: Sal
vgz	: Veguhêzer
wer.	: Werger
weş.	: Weşanxane
alk.	: alîkar

## NAVEROK

PÊŞGOTIN .....	II
KURTE .....	IV
ÖZET .....	VI
ABSTRACT .....	VIII
KURTEBÊJE .....	X
NAVEROK .....	XI

## DESTPÊK

1. ÇANDA DEVKÎ Û ÇÎROKBÊJÎ .....	1
1.1. Çanda Devkî .....	1
1.1.1. Di Çanda Devkî de Bîr .....	10
1.1.2. Di Çanda Devkî de Vebêje .....	12
1.2. Çîrokbêjî .....	13

## BEŞA YEKEM

2. ÇANDA KURDÎ YA DEVKÎ Û DENGEBÊJÎ .....	17
2.1. Çanda Devkî ya Kurdî .....	17
2.2. Dengbêj û Dengbêjî .....	20
2.2.1. Di Dengbêjiyê de Perwerdehî .....	25
2.2.2. Qadên Ku Dengbêjî Lê Tê Îcrakirin .....	27
2.2.3. Di Dengbêjiyê de Şêweyên Îcrakirinê .....	29
2.2.3.1. Tradîsyona Serhedê .....	30
2.2.4. Li Gor Mijaran Kilamên Dengbêjiyê .....	33
2.2.4.1. Lawje (Lawij, Lawik) .....	34
2.2.4.2. Lawikê Siwaran .....	35
2.2.4.3. Heyranok .....	36
2.2.4.4. Pîrepayîzok .....	37
2.2.4.5. Dîlok (Stranên Dîlanê) .....	38
2.2.4.6. Zêmar .....	39
2.3. Dengbêjên Jin .....	40
2.3.1. Meryem Xan (1904-1949) .....	42
2.3.2. Ayşe Şan (1938-1996) .....	43
	XI

2.3.3. Di Muzîka Nûjen De Dengbêjî .....	43
--	----

## BEŞA DUYEM

3. DENG BÊJ ŞAKIRO (1936-1996) .....	47
3.1. Jiyana Şakiro .....	47
3.1.1. Nav û Dengê Şakiro.....	50
3.1.2. Şakiro Şagirtê Reso ye Yan Na? .....	52
3.1.2.1. Dengbêj Reso (1902-1983) .....	53
3.1.3. Fonetika Şakiro .....	56
3.2. Berhemên Şakiro .....	58
3.2.1. Mijarê Berhemên Şakiro.....	59
3.2.1.1. Nifir.....	59
3.2.1.2. Dua/Die.....	61
3.2.1.3. Sondxwarin/Sond .....	63
3.2.1.4. Gazin .....	66
3.2.1.5. Evîn .....	67
3.2.1.6. Erotîzm .....	73
3.2.1.7. Şer .....	76
3.2.1.8. Şîn .....	82
3.2.1.9. Xweza /Sirûşt .....	84
3.2.1.10. Rola Axa û Began / Civak.....	86
3.2.1.11. Lavakirin.....	88
3.2.1.12. Şîret .....	89
3.2.1.13. Hêvî û Daxwaz .....	92
3.2.2. Hunerên Vegotinê di Berhemên Şakiro de.....	93
3.2.2.1. Analojî.....	95
3.2.2.1.1. Hêmayî û Paralelî.....	97
3.2.2.1.1.1. Pîvanên Dewlemendiyê.....	98
3.2.2.1.1.2. Hesp.....	99
ENCAM .....	101
ÇAVKANÎ .....	104
PÊVEK .....	114

## DESTPÊK

### 1. ÇANDA DEVKÎ Û ÇÎROKBÊJÎ

Di serdema me de ku xwendin û nivîsandin gelek pêşkete, têgihiştina çanda devkî ne hêsan e. Lewre em li gor çanda nivîskî tevdişer û jiyana me bi hêmanên vê çandê hatiye dorpeçkirin. Her çiqas destpêkê de xebatên li ser çanda devkî kêmbin jî, bi serdema nûjen re hejmarê van xebatan zêde bûye. Em dê jî hewl bidin ku di vê beşê de pênasîya çanda devkî bikin û girîngiya bîr û vebêjê ya di çanda devkî de binî ziman. Bi van hêmanan ve girêdayî em dê qala çîrokbêjiyê bikin. Lewre ji bo ku kevneşopîya dengbêjiyê baş bê fêmkirin divê em têbigihîjin ku çanda devkî çawa pêk hatiye.

#### 1.1. Çanda Devkî

Peyva çandê heta sedsala XVIIan wekî wateya wê ya Fransî bi wateya çandiniyê dihate bikaranîn. Cara yekemîn ramangerê navdar Voltaire peyva çandê bi wateya pêşketin, pêşxistin û mezinkirina hişê mirovan bikar aniye. Ev peyv ji vir derbasî zimanê almanî bûye û di ferhengeke ku di sala 1793an de çap bûye de wekî “culture” bi cih bûye<sup>1</sup>, lê belê di wateya ku îro tê bikaranîn de himê vê peyvê antropologê Îngiliz Tylor, di sala 1871an de daniye. Li gor Tylor çand, berhevoka adet, bawerî û saziyan e, bi kurtî çî tiştên ku mirov di nava civakê de hîn bûbe ew çand e.<sup>2</sup>

Her çiqas pênasîyên çandê cuda bin jî, ji pênasîya ku Tylor daniye mirov dikare bigihîje hin taybetmendiyên hevbeş:

Çand, tiştêkî xweveber nîn e, piştî ku mirov hate dinyayê di nava jiyandê de hîn dibe. Bi perwerdehiyê ava dibe.<sup>3</sup> Çand, dîrokî û domdar e, loma jî bi çandên din re di nava têkiliyê de ye. Lê belê ev têkilî li gor demê û rewşê diguhere.<sup>4</sup> Ev guherîn digel ku mirov aciz dikin jî encameke guherînê bixwe ye. Ji ber ku tu mirov bêtî ku di nava çanda xwe de mezin bibe nikare bikeve nava çandê din.<sup>5</sup>

Çand ne pergaleke yekser e, li gor her civakê di nava pêvajoyeke cuda de diherike. Faktorên dîrokî û hawîrdorî bandorê li çandê dikin. Taybetmendiyên serbixwe ku bi dîrok û hawîrdora civakê ve negirêdayî bin dibe ku neyên fêmkirin.<sup>6</sup>

<sup>1</sup> Bozkurt Güvenç, *İnsan ve Kültür*, weş. Remzi Kitapevi, İstanbul, 1984 r.96.

<sup>2</sup> Claude Levi-Strauss, *İrk, Tarih ve Kültür*, wer. Arzu Oyacıoğlu, Reha Erdem û hwd., weş. Metis İstanbul, 2007 r. 169.

<sup>3</sup> Güvenç, *İnsan ve Kültür*, r. 103.

<sup>4</sup> Levi-Strauss, *İrk, Tarih ve Kültür*, wer. R. 54.

<sup>5</sup> Ruth Benedict, *Kültür Örüntüleri*, wer. Mustafa Topal, weş. Öteki, Ankara, 1999, r. 57.

<sup>6</sup> H.b., r.65.

Çand ji civakekê heta civakeke din diguhere, bi vê wateyê malbat, tax, gund, bajarok jî dibin binbeşên çandê. Heger em bibêjin çand tiştêkî civakî ye, wê gavê dahatûya wê jî bi civakê ve girêdayî ye.

Çand, pêdiviyên civakî û xwezayî yên mirovan temam dike. Ji ber ku çand xwezayî ye, hevşibîna hin taybetmendiyên çandê jî asayî ye. Du aliyê çandê hene, yek jê îdeal, a din jî rastî ye. Carinan her du nêzikî hev dibin lê belê pîrî caran ji hev dûr in.<sup>7</sup>

Li gor dîrokzanên çandê, yek ji sedema serkeftina şerê hebûnê û berdewamkirina jiyanê, ragihandin e. Amûra ragihandinê jî ziman e. Lewra mirov nikare li serkeftineke tenê, ku têkiliya wê bi ziman re tune be, rast bê. Ziman hevîrê çandê ye. Jixwe nêzîkbûna ziman û çandê di dîroka pêşketina zimanan de jî eşkere dibe. Mirov, ziman û çand, sê rastiyên bi hev re girêdayî ne.<sup>8</sup> Ziman ewqas girîng e ku bi tena serê xwe pergaleke ragihandinê nîne, xwediyê gelek fonksiyona ye. Wek ku Althusser dibêje ziman saziyek e, tecrube û agahiyên ku mirov ji zayîna xwe heta mirina xwe pê re rû bi rû dimîne tev çalakîyên zimanî ne. Ziman pratîkek e ji bo tesewiran.<sup>9</sup> Divê mirov ziman wekî dayineke Xwedê bifikire. Heger mînakên ziman ên pêşîn amade nebûna ziman îcad nedibû an jî ziman nedihat kifşkirin<sup>10</sup>

Ne diyar e ku ziman kengê, çawa, li ku derê û bi çi rengî derketiye holê lê belê em dizanin ku ziman ji bo mirov, civak û çandê çiqas girîng e. Lewre em zimanan bi gelemperî, bi rêya nivîsê dinasin. Digel ku li gor lêkolînên dawîn dîroka mirovahiyê digihîje milyonek sal berê jî mixabin nivîsên ku niha li ber destê me ne, tenê digihîjin 5500 sal berê.<sup>11</sup> Ji ber vê yekê heta niha tu rêbaz nehatine ditin ji bo ku em bizanin, bê ka beriya nivîsê çend ziman winda bûne û çend ziman tevlî zimanên din bûne. Îroj jî bi sedan zimanên ku tînin axaftin nehatine nivîsandin, ji ber ku hîn tu nivîsên li gor van zimanan nehatine îcadkirin. Ji vî aliyê ve tiştê ku neguhere devkîbûna ziman e.<sup>12</sup>

Damezinerê zimanzaniyê yê hemdem Ferdinand de Saussure jî dibêje ku mijara ziman a bingeşîn, zimanê devkî ye. Li gor Saussure, ziman û nivîs du pergalên ji hev cuda ne. Sedema hebûna nivîsê destnîşankirina ziman e. Mijara zimanzaniyê bihevedanîna bêjeyên nivîskî û devkî nîn e. Lê belê peyv carinan wisa bi dangan re li

<sup>7</sup> Bozkurt Güvenç, *Kültürün ABC'si*, weş. YKY, İstanbul, 2011, r. 55-56.

<sup>8</sup> Nermin Uygur, *Dilin Gücü*, weş. YKY, İstanbul, 2011 r. 96.

<sup>9</sup> Louis Althusser, *İdeoloji ve Devletin İdeolojik Aygıtları*, Vgz. Remezan Alan, wer. Yusuf Al, Mahmut Özışık, Weş. İletişim, İstanbul, 1989, r. 97.

<sup>10</sup> Derya Gülsoy, "Medyanın Altyapısına Muhalef Bir Yolculuk, Noam Chomsky", *Kadife Karanlık*, amd. Nurdoğan Rigel û hwd. Weş. Su, 2005, İstanbul r.159.

<sup>11</sup> Dogan Aksan, *Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim*, weş. Türk Dil Kurumu, Ankara, 2000, r. 94.

<sup>12</sup> Walter j. Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, wer. Sema Postacıoğlu Banon, weş. Metis, İstanbul, 2010, r.19.



hev dikin ku peyv diçe li serê civatê rûdinê<sup>13</sup> Saussure bi alikariya du delîlan zimanê devkî derdixê pêş. Yek ji van, ziman ji nivîsê kevintir û berfirehtir e; ya duduyan pergalên nivîsê yên heyî jî li ser zimanê devkî hatine avakirin. Digel ku zimanê nivîsê bi perwerdehiya li xwendîngehan ve girêdayî ye û xwediyê rûmetekê ye jî, pêşanî ya zimanê devkî ye.<sup>14</sup> Bi kurtî zimanê devkî beriya zimanê nivîskî tê.

Walter J. Ong, çandên ku ragihandinê tenê bi zimanê axaftinê pêk tînin, ji nivîsê û matbaayê ne haydar in, wekî “çandên devkî yên yekemîn” bi nav dike. Miqabilî vê yekê bi pêşketina teknolojiyê amûrên wekî radyo, televizyon û amûrên din ên elektrônîk, nivîs careke din qelibîye ser zimanê axaftinê. Ong, van çandan jî wekî “çandên devkî yên duyemîn” bi nav dike.<sup>15</sup> Ji bo fêmkirina çanda devkî ya yekemîn, têgihîştina wateya deng a di nav van çandan de dê bi kêrî me bê. Daxwaza ragihandina hêmanan bi deng pêk tê. Ziman wekî kaxizekî ye, raman rûyê pêş e, deng jî yê paş e.<sup>16</sup> Deng dema ku winda dibe tê bihîstin. Sekinandina deng û serdestiya wî ne gengaz e. Digel ku deng bi îşaret, zimanê bedenê û ramanên ku hîna nebûne deng, hatiye astengkirin jî, tiştên devkî bi axaftinê ve girêdayî ne.<sup>17</sup> Peyva ku tê gotin eger daxuyaniyeke bingeîn an jî ji devê aqilmendekî derketibe jî ku ji aliyê kesekî din ve nehatibe bihîstin, tewş e; ew ê bimire û ji holê rabe.<sup>18</sup> Li gor Mikhail Bakhtin, ji bo peyvê, ji tunebûna bersivê xerabtir tiştek tune ye, ji ber ku peyv bihîstin, fêmkirin, bersivdayîn û careke din bersiva pirsê dixwaze.<sup>19</sup> Lewma axaftin di kêlikê de pêk tê. Di vir de ya girîng dem e, axaftina her du aliyan di heman demê de pêk tê.

Digel ku zimanê axaftinê di jiyana mirovan de xwedî cihekî girînge jî bi sedsalan di xebatên ziman û wêjeyî de kesekî dest nedaye taybetmendiyên zimanê devkî. Gelek lêkolîner bi cezbeya metnên nivîskî ketine û vegotina devkî an cureyek ji vegotina nivîskî hesibandine yan jî hêjayî cîdiyeta cîhana zanistî nedîtine. Bi taybetî di nîveka duyemîn a sedsala XVIIIan de li dijî wêjeya devkî tê derketin. Bi vî awayî li hember wêjeya devkî biyanîbûn dest pê dike, wêjeya devkî weke berhemên çîna jêrîn a gel tîne biçûkxistin. Lê belê di rastiyê de qabiliyeta axaftinê beriya afirandina nivîsê, ji

<sup>13</sup> Ferdinand De Saussure, *Genel Dilbilim Dersleri*, wer. Berke Vardar, weş. Multilingual, İstanbul, 1998, r. 56.

<sup>14</sup> Zeynel Kıran, *Saussure'den Günümüze Dilbilim Akımları*, weş. Yabancı Diller Kitap ve Yayın Merkezi, Ankara, 1986, r.46.

<sup>15</sup> Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, r. 23-24.

<sup>16</sup> Barış Çoban, “Aynalar Şovalyesi Ya Da Bilinç Dışının Kaşifi Lacan”, *Kadife Karanlık*, amd. Nurdoğan Rigel û hwd., weş. Su, İstanbul, 2005 r. 279.

<sup>17</sup> Eser Köker, *Kitapta Kurutulmuş Çiçekler*, weş. Dipnot, Ankara, 2010, r. 41.

<sup>18</sup> Jacques Ellul, *Sözün Düşüşü*, wer. Hüsamettin Arslan, weş. Paradigma, İstanbul, 2004, r. 40.

<sup>19</sup> Mikhail Bakhtin, *Karnavaldan Romana*, wer. Cem Soydemir, weş. Ayrıntı, İstanbul, 2001, r. 364-365.

destpêka pêşketina hişmendiyê û şûnde, bala mirovan kişandiye û rê li ber fikirîna li ser axaftinê vekiriyê. Gelek gotinên pêşyan ku ji hawîrdorê cîhanê hatine berhevkerin, bi çavderî, xweşikî û taybetmendiyên axaftina pêşîn a mirovan dagirtî ne. Piştî îcadkirina zimanê nivîsê bi sedan salan jî axaftinê ji sêra xwe tişteke wînda nekiriyê.<sup>20</sup> Mîna ve yekê ya herî berbiçav jî, hunera xîtabetê ye ku hîmê wê ji aliyê Arîstoyê yewnanî ve beriya du hezar salan hatiye danîn û ji wê gavê heta niha çanda rojava li ser dixebite.

Gelek lêkolinerên ku bala xwe dane ser nivîsê, bêyî ku li ser bifikirin, zimanê devkî weke beşeke ji çanda nivîskî hesibandine û cureyên hunera devkî wekî metneke ku nehatiye nivîsandin pejirandine. Bi vî awayî ji xeynî hunera xîtabê cureyên din ên hunera devkî wekî tiştên ji rêzê û ne hêjayî lêkolînê dîtine. Bi vî awayî rûmeta hunera devkî kêmkirine.<sup>21</sup>

Çanda devkî ya pêşîn bi nîqaşên li ser Îlyada û Odesa ya Homeros dest pê kiriyê û ev yek weke “pirsgirêka Homeros” hatiye bi nav kirin. Kesên ku di Serdema Antîk de bi wêjeyê ve mijûl dibûn pê hesiyar ku helbestên Îlyada û Odesa naşibin helbestên din ên yewnanî. Her wiha çavkaniya van helbestan ne diyar bû. Feylesofê Îtali Vîco (1668-1744), îdîa dikir ku kesekî bi navê Homeros qet nejiyaye lê destanên Homeros, her çawa be, berhemên hevpar ên civakê ne. Di sedsala XVIIan de Hedelin (1604-1676), êrişî destanên Homeros kiriyê û ev her du destan wekî berhemên li dijî ol û sincê tawanbar kiriyê. Li gor Vîco, ev destanên ku li ser navê Homeros tên nasîn jî, di eslê xwe de “rapsodî”ne û ji aliyê kesên din ve hatine berhevkerin. Lê belê di sedsala XVIIIan de arkeolog û dîplomatê Îngliz Robert Wood, bi xebatên xwe rê li ber angaşteke nû vekiriyê. Li gor Wood, Homeros bi xwendin û nivîsandinê nizanibû. Berhemên xwe tenê bi hêza bîra(hafiza) xwe afirandine. Milman Parry, xebata xwe ya doktorayê di sala 1928’an de amade kiriyê. Di vê xebatê de ispat kiriyê ku Homeros di helbestên xwe de, rêzîkên şeş kîte bi kar aniyê. Ev şeş kîte bi dorê ji kîteyêke dirêj û du kîteyên kin pêk tê. Ev pergala wekî “heksametrîk” tê binavkirin. Homeros jî ji bo ku gotinan li hev bîne, rengdêrên çêkirî û gotinên qalibî bi kar anîne<sup>22</sup>. Ev rêbaza dema ku bi lihevanîna rengdêran a kevneşopiyên devkî re tê ba hev, helbest û kilamên ku ji dubareyên zêde pêk tên dertîne holê.

Erîc Havelock di şopa Parry de çûye û gihîştîye hin encaman. Ji bo çanda yewnanî ya dema Homeros gotinên qalibî girîng bûn. Ji ber ku digel helbestvanan,

<sup>20</sup> Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, r.21.

<sup>21</sup> Yuri M.Sokolov, *Folklor, Tarih ve Kuram*, wer, Wer. Yerde Özer, weş. Geleneksel, Ankara, 2009, r.46.

<sup>22</sup> Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, r. 31-35..

hemû cîhana devkî jî ji qalibên wisa sûd werdigirt. Di çandên devkî de ji bo ku tiştên hînbûyî winda nebin dubareya domdar pêwîst bû. Rêbazên axaftina qalibî him ji bo zanîne him ji bo rêvebiriya civakê pêwîst bûn.<sup>23</sup>

Ong pêkerên (dinamik) vegotin û çanda devkî bi kurtî wiha vedibêje:

“ Di çandên devkî de ji bo ku tiştên hînbûyî ji bîr nebin, pêdivî bi dubareyê heye. Zanista ku hatiye hînbûyîn bi girêdan, dubare û qaliban ji nifşê nû re tê ragihandin. Lewma qalib, bi gotinên pêşyan û biwêjan hatine kifşkirin û xebitandin. Çanda devkî xerîbê rêbazên çareserkirinê ye; bi rêya komkirinê dubareyên zêde rêya vegotina berheman zêde naguherîne. Ji ber ku di nava jiyane de ye, vegotin nêzikî jiyane ne û yek ji rêbazên aşkerekirina vegotinê ye. Di vegotinan de hêzeke berxwedane, pêşbirkê û hevgirtî xuya dibe. Di çandên devkî de ku axaftin wekî berhemeke saf a yekîtiya gotin û tevgerê pêk hatiye ew tenê teşeyek tevgera mirovî nîn e her wiha zanista ku bi zorê hatiye destxistin û bi hesûdî tê parastin bi xwe ye. Teşe û rêbazên vegotinê yê çanda devkî piştî xwe didin hevhişî û beşdariya civakê. Wateya vegotinê, ji ber ku pêdivî bi razberkirinê nabîne û li gor derdora şênber diguhere, di dema xwe de giranbûha dibe”.<sup>24</sup>

Çanda devkî ji aliyekî ve zanînen di derbarê pêvajoya mirovahiyê de dihewîne ji aliyê din ve hevgirtina tebeqeyên civakên ji nivîsê haydar nîn in xurt dike. Civakên bê desthilatî cerbandinên xwe, aqil, bawerî û kevneşopiyên xwe bi vî rengî ji nivîşên nû re radigihînin. Çanda devkî îroj jî bi awayekî hevpar bi hest, daxwaz, tirs û bîranên xwe di nav gel de dijî.<sup>25</sup>

Hin nivîskar wekî sedema paşveçûna çanda devkî, nivîsê nîşan didin. Yek ji vana Tristan Tzara ye. Ji ber ku îro hema hema di hemû çandan de têgeha nivîsê û cerbandinên ku piştî xwe didin nivîsê hene, bi wateya xwe ya rastîn çandên devkî yê yekemîn nemane. Loma jî Tzara, ji bo destpêkirina serdemeke nû ya efsaneyên devkî, daxwaza şewitandina hemû pirtûk û pirtûkxaneyan kiriye.<sup>26</sup> Lê belê di gelek çandên serdest û bindest ku teknolojiyê bikar tînin de, hîn jî em li şopa bermayiyên ramanên çanda devkî ya yekemîn rast tên.

Ji bo têgihîştina mijarê divê em li ser çanda nivîskî jî çend gotinan bibêjin.

<sup>23</sup> Köker, *Kitapta Kurutulmuş Çiçekler*, r. 15.

<sup>24</sup> Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, ji bo agahiyên berfireh ( Bnr.. 53-67)

<sup>25</sup> Köker, *Kitapta Kurutulmuş Çiçekler*, r. 13.

<sup>26</sup> Susan Sontag, "Susmanin Estetîği", *Sanatçı Örnek Bir Çilekeş*, amd. Yurdanur Salman û Müge Gürsoy Sökmen, weş. Metis, İstanbul, 2008, r. 66.

Du sedemên afirandina nivîsê hene. Ya yekemîn, nivîs bi îhtimaleke mezin ji bo bazirganiyê hat afirandin. Ji bo ku bê zanîn ka çend sewalên kîjan malê hene, divê nivîs bihata bikaranîn. nivîs baneşanek û amûreke bîrî bû. Ya duduyan dibe ku afirînerê tabletên pêşîn, têgihîştibe ku mirov dikare di tabletan de zanînen bê ser û ber berhev bike. Lê belê sînoren mêjiyê mirov diyar in. Tabletên axîn, ji bo zanîne ji nû ve pêşkêş bikin pêdiviyê bi xwediyê bîrekê nabînin. Mînak, ji bo ku mirov peyamekê bigihîne yekî din pêdivî bi çûyîna xwediyê peyamê tune.<sup>27</sup>

Arkeolog, li gor tabletên ku li Mezopotamyayê, ji binê erdê hatine derxistin dibêjin ku nivîseke bi vî rengî, cara yekemîn Beriya Îsa yazdeh hezar sal berê hatiye nivîsîn.<sup>28</sup> Her yek ji van tabletan amûrekê simbolîze dikir. Ji van nivîsên wêneyî re “pîktogram” tê gotin. Dema ku gelek pîktogram tene ba hev ramanekê îfade dikin lewma jî ji van nivîsan re “îdeogram” tê gotin. Beriya Îsa di salên 2900an de pîktogram ji holê rabûn û li şûna wan nivîsa mixî ya Sûmeriyana bi cih bû. Di nav wan de hin lîste hatine dîtin ku pewira hîndariyê yan jî ferhenga pêşîn dibînin. Dema ku nivîsên tabletan dest bi diyarkirina peyvên zimanê axaftinê kirin û şûnde, ji xeynî hesabên bazirganiyê, normên dadê tiştên ku dihatin gotin jî êdî dihatin nivîsandin.<sup>29</sup>

Di pêvajoya pêşketina nivîsê de, gava herî mezin, derbasbûyîna nivîsa fonetîk e. Di vî cureyê nivîsê de nîşanê êdî nakevin dewsa têgeh û amûran; dikevin dewsa deng. Bi vî awayî di navbera nivîsê û axaftinê de têkiliyek çêbûye û nîşanên ku hatine bikaranîn her yek ji wan bûye nîşana dengê.<sup>30</sup>

Li gorî Marshall McLuhan ji xeynî alfabeya fonetîk tu alfabeyên wêneyî, îdeogramîk an jî hiyeroglîfik nikarin mirovan ji jiyana qebîletiyê derînin. Alfabeya fonetîk rê li ber azadî û serxwebûna cîhana deng a sêhrî vedike. Fonetîk deng û nîşanan nêzikî hev dike.<sup>31</sup> Di vî serdemê de ku peyv bi nivîsê qelibîye ser amûrekê, mirov neçar mane ku bi qasî guhên xwe, çavên xwe jî bi kar bînin. Nivîsê, axaftin ji seheka deng-bihîstinê derxistiye û ber bi seheka dîtinê ve biriye. Bi vî awayî nivîsê him axaftin him şeweya ramîne guherandiye.<sup>32</sup> Li gor Sokrates, ev guherandin tiştêkî neyînî ye. Ji ber ku vî rêbaza ragihandinê ramanên mirovan jî diguherandin. Dema ku peyv carekê hate nivîsandin rê li ber belavbûna wê vedibe; kesên ku dixwînin wateyên cuda

<sup>27</sup> Alberto Manguel, *Okumanin Tarihi*, wer. Füsün Elioğlu, weş. YKY, İstanbul, 2010, r.212-213.

<sup>28</sup> Barry Sanders Oküzün A'si, wer. Şehnaz Tahir, weş. Ayrinti, İstanbul, 2010, r. 58.

<sup>29</sup> Georges Jean, *Yazı İnsanlığın Belleği*, wer. Nami Başer, weş. YKY, İstanbul, 2002, r. 18-21.

<sup>30</sup> Murat Yağcı, *Sözlü Kültürden Yazılı Kültüre ve Elektronik Kültüre Geçiş Süreçlerinde Düşünsel ve Toplumsal Değişimler*, Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Halkbilim (Etnoloji) Anabilim Dalı (Teza Lisans Bilim ya Çapnebûyî), Ankara, 2005, r. 22.

<sup>31</sup> Marshall McLuhan, *Gutenberg Galaksisi*, wer. Gül Çağlı Güven, weş. YKY, İstanbul 2007, r. 35.

<sup>32</sup> Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, r. 104.

jê dertînin. Bi demê re xwediyê peyvê ji bîr dibe û peyv li gor kesên ku wê şîrove dikin wateyên nû distînin. Êdî taybetmendiya gotinê û peyvê ji holê radibe. Platon ku di çanda rojavayî de cara yekemîn çanda nivîskî derxistiye pêş û qala wê kiriye, ew jî wekî Sokrates li dijî çanda nivîskî derketiye. Lê belê xemên Platon ji yên Sokrates cudatir in. Li gor Platon; “nivîs” bîrê kor dike û zanîneke “çêkirî” diafirîne. Gotin dikare rastiye bixe destê mirovan lê belê nivîs tenê dikare dîmena rastiye bide mirovan. Nivîs bi kêrî kesên ku jixwe dizanin tê, lê rêbaza kesên ku dixwazin hîn bibin divê devkî be. Platon jî bi demê re wekî her kesî nivîs pejirandiye û bi kar aniye; lê belê wî berhemên xwe bixwe nenivîsandiye û bi awayê xwendina diyalogên bi dengê bilind amade kiriye.<sup>33</sup>

Di serdema antîk a rojava de wisa dihat bawerkirin ku hemû berhem hêjayî xwendinê ne. Ji ber ku hemû berhem ji bo xwendina bi dengê bilind hatibûn amadekirin. Vê rêbazê heta dawiya sedsala XIXan, bi hin guherînan, berdewam kiriye. Heta îcadkirina matbaayê serdestiya deng û guh dom dikir. Ji ber ku nivîs wekî destxetan dihatin parastin, têgihîştina nivîsê ew qas hêsan nîn bû. Lewma jî xwendevanan hewl dida ku, beşek be jî, nivîsê di heşê xwe de bihêlin. Destxetan ji aliyê naverokê ve gelek taybetmendiyên çanda devkî dihewandin. Vê yekê jî karê kesên ku dixwestin nivîsê ji ber bikin hêsan dikir.<sup>34</sup> Lê pêşketina matbaayê bandora çanda devkî ya li ser çanda nivîskî qels kir.

Piştî matbaayê êdî xwendin û belavkirina pirtûkan hêsantir bû. Mirovan pêdivî bi xwendinên tomerî û dengê bilind nedîtin. Her kesî pirtûka xwe dida bin çengê xwe û kîngê bixwesta ji xwe re bêdeng dixwend. Di encama vê yekê de takekesî bi pêş ket û mirov ji hev qetiyar. Têkiliya di nav mirovan de qels bû.<sup>35</sup> Sedama vê yekê jî matbaa bû. Matbaya ku bêjeyan ji têkilîdanîna nav mirovan a bingeha cîhana dengên derdixê û tîne rasta dîtbariyê û ji bo birêkxistina zanîne, rasta dîtbariyê bi awayekî din bi kar tîne, çavkaniyên hiş û binhişê mirovan objektîftir, ji kesayetiye dûr û ji hêla olî ve bêalibûnekê nîşan dide.<sup>36</sup>

Piştî van nîqaşan danberheva çanda devkî û çanda nivîskî dibe ku riyeke nû li ber me veke. Em dikarin helwesta mirovan a li hember îcadkirina nivîsê di helwesta qebîleyeke çermesorên Amerîkî ku di demeke nêzîk de hatiye kifşkirin, texmîn bikin. Dema ku çermesoran çav li mirovên ku bi pirtûkan re diaxifin kiribûn heyirî mabûn û

<sup>33</sup> Gul Batuş, “Neil Postman, İnsan Aklının Kendi yarattığı Teknoloji ile dostluk arayışı”, *Kadife Karanlık*, amd. Nurdoğan Rigel û hwd. Weş. Su, İstanbul, 2005 r. 265-266.

<sup>34</sup> Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, r.142-143.

<sup>35</sup> Derya Altay, “Küresel Koyun Medyatik Mimari Marshall McLuhan”, *Kadife Karanlık*, amd. Nurdoğan Rigel û hwd., weş. Su, İstanbul, r. 17.

<sup>36</sup> Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, r.156.

bawer nedikirin ku kaxizek karibe biaxife. Derbarê vê mijarê de çîrokeke xweş heye. Wekî ku Ramazan Pertew ji Umberto Eco neqil dike, xwediyê bendeyekî çermesor selikek hêjîr û nameyêkê dide destê bende û wî ber bi deverêkê ve bi rê dike. Çermesor di rê de piraniya hêjîran dixwe û yên mayî tevî nameyê digihîne xwediyê nameyê. Zilam nameyê dixwîne lê hêjîran nabîne. Wî çermesorî bi xwarina hêjîran tawandar dike. Lê çermesor digel vê delîlê rastiyê înkâr dike û neletê li nameyê tîne. Piştî demekê vê carê hejmara hêjîran di nameyê de dinivîsin û careke din bi rê dikin. çermesor dîsa hêjîra dixwe lê vê carê beriya ku hêjîran bixwe (ji bo ku rê li ber tawanbarkirinê bigire), nameyê dixwe bin kevirêkî. Li gor wî, heger name xwarina wî ya hêjîran nebîne, nikare qala wî bike. Lê vê carê dîsa bi xwarina hêjîran hatiye tawanbarkirin. Li ser vê yekê çermesor li xwe mikur hatiye û bextewariya xwe ya li himberî pîrozbûna kaxiz diyar kiriye<sup>37</sup>

Wekî ku ji mînaka jor jî xuya dibe nivîs, axaftinê mayinde dike û bi vî rengî cudatiya navbera çanda devkî û çanda nivîskî aşkere dike. Di çanda nivîskî de peyv, ji aliyekî ve mayinde dibin û ji wendabûnê xilas dibin lê ji aliyê din ve tevgera (dînamîk) xwe wînda dikin û disekin. Heçî yê ku bixwaze, demeke diyar jê re tune ye, dikare here nivîsê bibîne û sûdê jê wergire.<sup>38</sup> Lê di çandên devkî de ev yek bi bîrê ve girêdayî ye, minak, çîrokeke ku di dema xwe de her kes dizane, piştî demekê tenê hin kesên ku tê bîra wan dikarin vebêjin.

Hîmê bêjeyan digihîje ragihandina devkî. Digel vê yekê nivîs bi hemû hêza xwe di bin destê tiştên dîtbarî de ye. Peyv ji bo guh e, nivîs ji bo çav e. Nivîs peyvê ji xwediyê wê diqetîne û tiştêyî dike.<sup>39</sup> Mirovên ku di çanda devkî ya yekem de dijîn dikarin gelek tiştan hîn bibin, jixwe gelek ji wan zana û zanyar in; lê nikarin “lêkolinan” bikin.<sup>40</sup> Di çanda nivîskî de jî gotin tim heman tişt e û dubare dibe. Heta bêdawayîyê diherike, ji ber vê yekê jî mirov dikare li ser peyvê lêkolinan bike.<sup>41</sup> Yek ji cudatiya navbera van her du çandan ev e: Tiştên ku ji aliyê çanda devkî ve hatine afirandin û ji aliyê nixên huner û mirovahiyê ve girîng bûn, bi desthilatiya nivîsê ve xera dibin û careke din nayên afirandin. Ligel vê yekê vîna mirovan bêyî nivîsê, heza xwe ya heyî

<sup>37</sup> Ramazan Pertew, “Zarok û Edebiyata bi Zimanê Zikmakî”, *Nûbihar*, j. 116, 2011, r.54.

<sup>38</sup> Mc Lluhan, *Gutenberg Galaksisi*, r.31.

<sup>39</sup> H. b. r. 65.

<sup>40</sup> Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, r. 21.

<sup>41</sup> Ellul, *Sözün Düşüşü*, r. 40.

nikare tevî bi kar bine û nikare berhemên din ên xweşik biafirîne. Di vê çarçoveyê de çanda devkî neçar e ku nivîsê biafirîne û dê biafirîne jî.<sup>42</sup>

Çanda nivîskî bi ferheng, rêzenivîs, jînenigarî, sernav, hunandina bûyeran, roman û çîrokan, peyv ji vebêjê wê veqetandiyê, dijberê xwe afirandiyê, di serdema çanda elektronîk de kevneşopiyên devkî kirasê xwe guherandine û ber bi ji nû ve hêzdarbûnê ve diçin. Veguherîna van kevneşopiyên elektronîk, him têkiliya peyvê ku bi nivîsê dest pê kiriye û bi matbaayê bi pêş ketiyê xurt kiriye him jî vîna me xistiye serdema çanda devkî ya duyemîn.

Ev serdema nû weke gundekî gerdunî ji nû ve hatiye afirandin. Cîhan ji dewsa ku biqelibe ber bi pirtukxaneya Îskenderiyê, ji bo zarokan wekî berhemên xeyalên zanistî, qelibiyê kll.0ompîtûrekê, mêjiyekî elektronîk.<sup>43</sup>Lê belê Ong vê serdema elektronîk dişibîne serdema çanda devkî ya yekemîn. Di vê serdemê de beşdarbûn zêde bûye, hestên civakê bûne vînek û ji qalibên devkî sûd hatiye wergirtin. Ong îddia dike ku serdema elektronîk ji serdema devkî pêşkêftir e, ji ber ku serdema elektronîk hîmê xwe ji matbaayê û nivîsê girtiye. Di serdema yekemîn de ji ber ku derfeta lixwevegerînê nîne, mirovan berê xwe daye derve lê di serdema duyemîn de, ji ber ku derfetên lixwevegerînê pêk hatine jî mirovan berê xwe dane derve. Bi kurtî yek ji neçarî pêk hatiye, ya din bi dilxwezî pêk hatiye.<sup>44</sup>

Digel ve yekê Ong diyar dike ku amûrên elektronîk pirtûkên çapkirî ji hole ranekirine, beravajî vê yekê hejmara pirtûkan zêde kiriye. Sedema vê yekê jî bi çapkirina hevpeyvînan û derfetên belavkirinê ve girêdide. Bi vî awayî amûrên elektronîk xizmetê ji çanda devkî re dikan. Lewma jî Ong serdema elektronîk dişibîne serdema çanda devkî ya yekemîn. Bi ser de hejmara guhdaran di vê serdema dawîn de zêdetir in.<sup>45</sup>

Gelek kesan nêrîna Ong kêmtir dîtine û rexne kirine. Barry Sanders yek ji van kesan e. Li gor Sanders, amûrên elektronîk çanda devkî bi pêş naxin. Ji ber ku hemû tiştên ku bi rêya van amûran tên ragihandin berhama pevbestînekê ne û ji xwezayîbûnê dûr e. Her tişt berî ku bê pêşkêşkirin hatiye amadekirin. Derfetên xirakirinê û ji nû ve çêkirinê hene. Her wiha ji bo ku amûrek taybetiyên devkîbûnê bihewîne divê guhdar jî, bi pirsên xwe, bi bersiv û nîqaşên xwe beşdarî pêvajoya axaftinê bibe. Di axaftinê bi

<sup>42</sup> Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, r. 28.

<sup>43</sup> Derya Altay, *Kadıfı Karanlık*, r. 53.

<sup>44</sup> Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, r. 161.

<sup>45</sup> H.b. r. 160-161.

rêya amûrên elektronîk de, guhdar nikare peyva kesê ku diaxive bibire.<sup>46</sup> Lê em dizanin ku di dema axaftinê de birîna peyvan, bersivdan, qaîdeyeke jêner e.

Derbasbûna peyvan a nivîsê û çapkirinê tenê wekî pêşveçûneke teknolojîk nîne. Her pêşveçûn bi xwe re şeweyeke jiyane ya nû û têkiliyên civakî tîne. Dema ku bi çavê jiyana raya giştî mijar tê nixandin, mirov dikare bibêje ku bi pêşketinê nivîsê û matbaayê re mirov bi rêberiya bêdeng a pirtûkan tenê mane. Di rewşa îro de çapemenî gelekî berfireh bûye û bi pêş ketiye. Ev pêşketinê ferazî û çêkirî rê li ber serdemê devkî ya duyemîn vekirine.<sup>47</sup>

Bi kurtî, mijara têkiliya navbera çanda devkî û çanda nivîskî de nîqaşên cuda hebin jî, hemû ronakbîran ramanên xwe bi rêya nivîsê belav kirine û em jî bi saya vê rêbazê îro van berhaman dîxwînin, ji nîqaşan agahdar dibin. Îro her çiqas çanda devkî bi awayekî jiyana xwe bidomîne jî, çanda nivîskî û amûrên elektronîk bandoreke girîng li ser jiyana me dikin. Ne guncaw e ku em veşerî çend hezar sal berê û di serdema çanda devkî de bijîn. Lê gelek berhemên çanda devkî a ku bi rêya bîr û nivîsê gihiyaye roja me hin jî di jiyana çandî de xwedê ciheke girîng e. Ev yek jî encama hevbêş a her du çanda ne.

### 1.1.1. Di Çanda Devkî de Bîr

Xebatên bîra hevpar di nîveka sedsala XXan de hatine rojevê. Di vî warî de xebata civaknas û feylesofê Frensî Maurice Halbwach ku bi navê “Çarçoveya Bîra Civakî û Bîra Hevpar” ku di sala 1925an de weşandiye wekî destpêka serdemê ye. Bi vê xebatê hin hêmayên wekî hiş, bîr û bibîranîn ku wekî karên takekesî dihatin zanîn êdî ji bo civakê û koman jî hatine nîqaşkirin. Li gorî Halbwach “bîr” bi bi şert û mercên civakî ve girêdayî ye. “Bîr” tevî civakê tê diyarkirin û bêyî ku hişmendiya civakî hebe bibîranîn pêk nayê. Ango ji bo ku bîreke takekesî pêk were pêdivî bi çarçoveyeke civakî heye. Serpêhatî ne takekesî ne.<sup>48</sup> Ji bo bibîranînê pêdivî bi tecrûbeyê civakê ya hevpar heye. Lewra her bîranîn, her serpêhatiya ku em şahidê wê ne û raman û hestên mirovan bi kesên din re di nava têkiliyekê de ne. Kes, cih, dîrok, hevok û raman bi civaka ku em perçeyek ji wê ne pêk tên.<sup>49</sup>

Wekî ku tê dîtin hem bibîranîn hem jî jibîrkirin bi civakê ve girêdayî ye. Gelo em li gor çî bibîrtînin an jî jibîr dikin? Halbwach vê rewşê bi sê faktoran ve girêdide:

<sup>46</sup> Sanders, *Öküzün A'sı*, r. 44-45.

<sup>47</sup> Gul Batuş, *Kadîfa Karanlık*, r. 275.

<sup>48</sup> Mîthat Sancar, *Geçmişle Hesaplaşma*, weş. İletişim, İstanbul, 2010, r. 41.

<sup>49</sup> Paul Connerton, *Toplumlar Nasıl Anımsar*, wer. Alaeddin Şenel, weş. Ayrıntı, İstanbul, 1999, r. 60.



- 1- Girêdayîna bi demê û cih ve
- 2- Girêdayîna bi grûbê ve
- 3- Ji nû ve sazkirina dîrokê.

Girêdayîna bi demê û cih ve, ji aliyê xwespartineke şênber ya bîrê ve girîng e. Wekî mînak, cejn demeke ku hevpar tê jiyîn diyar dikin. Herweha xwespartina serpêhatiyên ya cihên diyar jî dê bi bîra hevpar zelaltir dibin. Girêdana bi grûbekê re destnîşankirineke giştî ye ku bîra civakî, tenê bi wan kesên ku barkêşên wê ne re dikare hebûna xwe bidomîne. Li gor vê yekê grûba ku serpêhatiyên wan yên hevpar hene, bi du aliyan dikare xwe biparêze. Yek ji vana xweserîbûn e, a din jî domdarî ye. Ji nû ve sazkirina dîrokê jî eşkere dike ku çi bîr nikarin rabirdûyê yeko yeko biparêzin. Lewma jî bîr neçar e ku her daîm xwe ji nû ve saz bike.<sup>50</sup>

Hewldaneke din a girîng ya Halbwach jî muqayeseya di navbera dîrokê û bîrê de ye. Li gorî vê nêrînê, bîra me ne bi dîroka ku hatiye hînkirin, bi dîroka ku hatiye jiyîn ve girêdayî ye. Bîra hevpar domdar e û ji yekê zêdetir bîrên hevpar hene. Bîra hevpar di hemem demê de tabloyeke hevşibînan ne û li ser grûbên civakî û hevşibînan wan li hev kiriye. Dîrok rewşa şewqdana demeke ku di nava pirtûkan de kêma hatiye nivîsîn e. Ya rast dîrok hemû rabirdû nîne. Bi şematîzekirinê her serdemê ji serdemên pey xwe vediqetîne û wekî beşên serbixwe û yekpare difikire. Bîr xwe dispêre berdewamî û hevşibînanê lê dîrok xwe dispêre cihêrengî û bêpergalîyê.<sup>51</sup>

Bîra çandî jî berê xwe dide hin xalên rabirdûyê. Lê belê rabirdû di bîrê de weke xwe namîne, bêtir li dora hin şiklên sembolîk dicive. Ji bo bîra çandî ne dîroka rastî, lêbelê dîroka ku di hişê mirov de maye, girîng e. Yek ji taybetmendiyên bîra çandî ya girîng ev e ku bûyer di nav bîrê de wekî rîtuêlan hatine teşekirin.<sup>52</sup> Di bîra çandî de serpêhatî bi awayekî teqez têne şênberkirin. Bi gotinên devkî, bi stran û listikan kodkirineke sembolîk bi awayekî kevneşopî tê kirin. Veguhêzêrên bîra hevpar pîranî ji kesên pispor ku di nava civakê de bûne xwedî rûmet pêk tên. Keşe, muzîkşînas û şaman hin ji wan kesan in.<sup>53</sup>

Bi kurtasî, nîqaşên li ser bîra hevpar îro jî berdewam dikin. Bîra hevpar, bi taybetî jî di gihandina dîrokê û ramanên komên ku nikaribûne xwe bi nivîsê vebêjin de peywireke girîng girtiye ser milên xwe. Wekî ku tê zanîn dîrok bi nivîsê tê destpêkirin.

<sup>50</sup>Jan Asman, *Kültürel Bellek*, wer. Ayşe Tekin, weş. Ayrıntı, İstanbul, 2001, r.43-44.

<sup>51</sup>H.b. r. 46-47.

<sup>52</sup>Sancar, *Geçmişle Hesaplaşma*, r. 45.

<sup>53</sup>Asman, *Kültürel Bellek*, r. 57.

Wê gavê jî civakên ku ne xwediyê nivîsê ne wekî ku derveyî dîrokê bin têne hesibandin. Lêbelê em dizanin ku her komê an jî civakê, kêm zêde piştgiriyeke daye pêvajoya dîrokê.

### 1.1.2. Di Çanda Devkî de Vebêje

Cureyê vegotina devkî yê herî berfireh, ji çanda devkî ya yekemîn bigire heta xwendin-nivîsandin û çanda enformasyona elektrônîkî, vebêje ye. Vebêja ku xala herî girîng a cureyên huneran pêk tîne, ji hêlekê ve hunera herî girîng a hunerên gotinî ye.

Nivîs wekî amûreke teknolojîk a gotinê ji bo şaristaniyê çawa ku zanîn û tecrûbe tomar kiriye, di çandên devkî û bi taybetî jî ew civatên ku bi nivîsê re hevnas nebûne; zanîn û tecrûbe, bi rêya tecrûbeyên devkî hatiye tomar kirin. Di nav van tecrûbeyên devkî de, ew çîrokên ku mijara wan çalekiyên mirovan in, wekî ku Hevelock jî behsê dike, ji ber ku di civatên devkî de kategoriyên wekî zanistî û nedîtbar peyde nebûne, ew berhem zanîn û tecrûbeyên civatî temsîl û şamil dikin. Parastina zanînê ya ku bi dubareyê tê stirandin, esasên çîrokgotinê jî diyar û êşkere dike.<sup>54</sup>

Di vê xalê de binyada vegotinê bi zindîkirina bûyerên bibîrhatineke demî, di çarçoveya kevneşopîya hozanan de dimîne. Vegotinên çanda devkî yê yekemîn ku ne xwediyê tevneke bûyerên kronolojîk in ku em di wateya modern de dizanin, bêtir xwediyê binyadeke epîsodîk in. Sedema yekemîn a vê helbet taybetiya hûnandina zihnî ya ku vebêjer xwediyê wê ye. Vebêjerê ku ne xwediyê şansê hunandina nivîski ye, bi girêdana xwe ya bi kevneşopîyê ve komikên bûyeran dike nava qalibên vegotinên berî xwe. Girîngiya ku bîr di çanda devkî de xwedî ye, geşedana îcadên ku dê alîkariya bîrê bikin pêwîst kiriye. Di vê xalê de qalib ji bo hêsankirina bicihkirina zanînê li ciyê ku dê kom bibe dikevin dewrê. Ango girîngiya bîrê di çanda devkî de tenê ezberkirin nîn e lê qeydkirina bîranîn û bûyeran e. Ev qalibên ku weke nivîsê hatine îcadkirin, vî barî ji ser bîrê radikin.<sup>55</sup>

Qalibên vegotina modern ên wek “hûnandina bûyerê” di vegotinên devkî de tune ne. Hûnandina bûyerê ji bo hîmê vegotinê hêmayên wek “tema”, “çeşn”, “şexs” di nav pevbestîna demê de tê honandin. Di çanda devkî ya yekemîn de vegotinên xwedî bûyera honak nayên parçekirin ji ber ku pêvekî ye. Di yek kirina gotinî de bûyerên ku divê “di navê de” dest pê bikin xeynî çend beşên kurt tu carî bi şewaza “honakiyînê” ji aliyê demê ve nexistiye nav rêzekê. Horatius ji bo hozanên destanan wiha dibêje: “Yekser

<sup>54</sup> Ong. *Sözlü ve Yazılı Kültür*, r.164-165.

<sup>55</sup> Osman Doğu Bingöl, *Günümüz Kent Yaşamında Sözlü Kültürün Yeni Sanatsal İfade Aracı Olarak Kullanımı*, Yıldız Teknik Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Sanat ve Tasarım Anasanat Dalı (Teza Lisansa Bilind ya Çapnebûyî), İstanbul, 2006, r. 4.

dikeve nav bizavê û guhdaran ber bi nav bûyeran ve dikişîne” Horatîus bi vê gotinê dixwaze destnîşan bike ku hozanê destanan ji rêza demê re riayet nakin. Lê di vegotina devkî de ev şêwaz ji hunera peyvê wêdetir ji ber mecbûriyetekê pêk tê.<sup>56</sup>

Di vegotinên devkî de qenc-xirab, xweşik-nexweşik, erênî-nerênî, di nav hev de ne, lê vebêjer her tim alîgirê qencyê, xweşikiyê û erênîyê ye. Ango mebesta vebêjer ew e ku bala guhdarvana bikişîne ser vê xalê. Lê ji ber ku vegotinên devkî bê delîl hatine neqilkirin bi hin guhertinan ve rû bi rû mane.

Bi kurtasî vegotinên aîdî çandên devkî, di warê fonksiyonelbûnê de dabeşî 4 qisman dibin.

- 1.Coş û şahî, şevbihêrk
- 2.Fonksiyona piştgirîdana sazî û rewresmên civakî
- 3.Fonksiyona neqilkirina têgehên kulturî û yên perwerdeya civakî,
- 4.Fonksiyona têgeheke reaksiyoner, a ji gef û tund û tûjiyên civakê direve.<sup>57</sup>

Di serdema çanda devkî ya pêşîn de, vegotina ku li ser esasên terîfkirina hîs û fikrên mirovan ava bûbû, îro ji qedr û payebilindiya xwe ya berê bi dûr ketiye. Benjamin jî dibêje ku “vegotin, îro zêde bi qedr û qîmet nîn e.” Lewre hemû agahdariyên di derbarê dinya û alemê de bi awayekî hazir radixînin ber çavên me. Her ji ber vê yekê, ew tiştên ku li der û dorê diqewimin, êdî ji bo çîrokgotinê (story telling) ne, ji bo enformasyonê sûdwar û fonksiyonel e. Lêbelê, dema ku ew çîrok dîrekt neql dibe, tu şîrove lê nayê barkirin, ev yek beramberî nivê hunera vegotinê tê. Divê, tiştên awarte, bi hemû hûrgiliyên wan ve bîr terîfkirin<sup>58</sup>

## 1.2. Çîrokbêjî

Di civaka Rojava de kevneşopiya çîrokbêjiyê bi Homeros dest pê kiriye û di civaka wê demê de populer bûye. Lê ew kesên ku bi wateya kurên Homeros, xwe wek “Homeridesî” bi nav kirine, yên ku cara yekem kevneşopiya çîrokbêjiyê wergerandine têkiliya hosta-şagirt û ev yek ji xwe re kirine têşeya jiyanê. Homerîdesên ku B.Z. di sedsala 6an de li Girava Sakizê (Khios) xwendengehek damezirandine, ji vê demê bi şûn

<sup>56</sup> Ong. *Sözlü ve Yazılı Kültür*, r. 168-169.

<sup>57</sup> Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev, Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weş. Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü, İstanbul, 2013, r. 52-56.

<sup>58</sup> Walter Benjamin, “Hikâye Anlatıcısı”, *Son Bakışta Aşk*, amd. Nurdan Gürbilek, wer. Nurdan Gürbilek, weş. Metis Yayınları, İstanbul, 1995, r. 82.

de di nav axa Yewnanan de deng vedane û vebêja destanan kirine bin hîmayeya xwe. Homerîdesî lêzimtiya xwe ya bi Homeros re ji manewiyatê bêhtir, wek law û neviyên Homeros nîşan dane. Kesên ku bi homerîdesan re kevneşopiya çîrokbêjiyê domandine ji wan re “rhapsodoi” hatiye gotin. Vana dema ku çîrok vegotine darikê “rhabdos” bi kar anîne. Ji aliyê din ve di destanên ku Homeros bi xwe vegotiyê de qala “aoidos”a dike. Hozanên ku di nav destanan de derbas bûne wek aoidosî hatine binavkirin. Bi vê wateyê, di nav rhabdosî û aoidosiyande cudahî heye. Yek ji wan, ji hozanên ku di destanên Homeros de jiyaye, lê yê din, ji kesên ku destanên Homeros ji girseyan re vegotiyê. Hozanên ku di vê civakê de digihên mîna çandên devkî yên din, di destê wan de amûrên muzîkê yên li gorî rewşa xweza û civaka sazkirî, destanên bi hêmayên rîtuêlî û mîfî vedigotin.<sup>59</sup>

Di kevneşopiya çîrokbêjiya Ewropaya Serdema Navîn de, “mînstrel” û “bard”an karê vegotinê girtibûne ser milê xwe. Ji ber ku van kesan kevneşopî û zanîna civakê derbasî nîfşên nû dikirin, civakê qîmet dida wan. Ji hêla torinan ve mazûbaniya wan li şato û serayan dihate kirin û wan jî derfeta vegotina çîrokan ji çîna torinan re didît. Van çîrokbêjan çîrok û efsaneyên xwe yên evînî û qehremanî, bi awayekî helbestî bi amûrên xwe yên muzîkê vedigotin. Her çiqasî zimanê wan zimanê kolanan jî bû, ji hêla çîna torinan ve jî dihate tercîhkirin. Ev çîrokbêjên di bin parastina çîna torinan û manastirê de, di nav çîrokbêjên bijare yên Ewropa de bûn.<sup>60</sup>

Çîrok xala herî girîng a çanda devkî ne û çîrokbêj jî dilê eşîr ango civakê ne. Ew çîrokên ku çîrokbêj vedigotin, ne çîrokên, ji rêzê û ketûber bûn. Ew çîrok jixwe ji aliyê mirovan ve dihat zanîn, mirovan ew çîrok her guhdarî dikir û dizanibûn. Çîrok, hînî mirovan dike ku gelo ew kî ne û tiştên ku mirov bawer dike, tîne bîra wan. Ev çîrok, endamên civatan nêzikî hev dike. Çîrokbêj, di çîrokên xwe de, mijarên, wekî dîrok, heqîqet, lehengî, bawerî, felsefe, sinc û hezkirinê dirêse. Ew kesên ku van çîrokan dibêje nemaze mêr e û bi giştî jî kalemêr e, piştî tecrûbeyên dûr û dirêj digihê merheleya bi îmtiyaz. Êdî dikare bi ser navê her kesî qisetan bike û bibe berdevkê wan. Çîrokbêjên kulturên devkî, di jiyana modern de beramberî mirovên rûspî û zana tîn.<sup>61</sup>

Çîrokbêjê ku zanayî û şarezaiya xwe nîşanî derdor dike, divê heqîqetê bi zimanekî wisa bibêje ku, ciwan an kalemêr/pîrejin bi awayekî eşkere fêhm bike. Divê dengê wî bigihê guhê hemû mirovan. Divê tu kes ji dûrî wî nemîne. Bi vî awayî, dê

<sup>59</sup> George Thomson, *Tarih Öncesi Ege II*, wer. Celal Üster, weş. Payel, İstanbul, 1991, r. 215-340.

<sup>60</sup> Abidin Pariltı, *Dengbêjler, Sözüün Yazgısı*, weş. İthaki, İstanbul, 2006, r. 48.

<sup>61</sup> Sanders, *Öküzün A'si*, r. 14-15.

şensê bicihkirina çîrokê di bîra guhdaran de mezintir bibe û dê bibe perçeyeke jiyana guhdaran. Û xwesteka guhdaran ku vê çîrokê belav bike dê zêdetir bibe.<sup>62</sup>

İsmail Görkem taybetmendiyê çîrokbêjîyê ji gotara R.Georges a bi navê *Hikaye Anlatım Olayının Anlatılmasına Doğru* (Bi Ber Vegotina Buyerên Çîrokbêjîyê ve) wiha neqil dike:

“1- Di her çîrokbêjîyê de herî kêr, kesek heye ku peyamê dide (encoder), kesek jî heye ku peyamê digire û tehlîl dike (decoder) û ev kes (çîrokbêj-guhdêr) bi peyameke tradîsyonel, ya ku ji berê ve hatiye pejirandin hevdu fêhm dikin. Di dayîn û tehlîlkirina peyamê de, ne tenê “ziman” îşaretên dest û dev jî xwedî roleke mezin in. Di her çîrokgotînê de peyamdayîn, bi rêya “dîtin” û “bihîstinê” pêk tê. Meseleya şîrovekirina çîrokê, di dirêjahiya çîrokgotînê de her berdewam dike.

2- Çîrobêjî, meseleyeke civakî ye; di vê behsê de herî kêr kesek çîrokbêj e û kesek jî guhdêr e.

3- Her buyera vegotina çîrokê bi tena serê xwe ye û çîrokbêjî din naşibin wê çîrokê. Çîrobêjî, di nav cih û dem û şertên civakî de rûdide û bi careke din jî nayê dubarekirin. Di çîrokgotînê de her çend gelek tişt bişibin hev û din jî, ev rastî berevajî nabe.”<sup>63</sup>

Çîrokbêj, çi wext behsa çîroka xwe bike, divê, behsa tiştên cur bi cur bike. Rojekê lehengê çîrokê di riyekê re dibe û rojêke din, di rêyêke cuda re tine. Lê leheng her heman leheng e û her car, di dawiyê de tê cem wan mirovên ku li benda wî ne. Dîsa jî tu kes çîrokbêjan bi durûtî û derewkariyê tawanbar nake. Tu kes, gumanê nake ku çîrokbêj behsa derewan û tiştên xeyalî dike.

Mirov, divê her fiksiyonê, her honandinê û vegotina her behsê bê guman qebûl bike. Ji ber ku tu pîvana berawirdkirina çîrokê û behsan nîne, ew kes nikare xwe bigihîne tu encamê.<sup>64</sup> Her çîrok bi awayekî vekirî yan girtî, xalên baş di hundirê xwe de vedihone. Ev başî di hinek çîrokan de wek dersên sincî, di yeke din de wek şîretan, di ya sêyemîn de dibe wek gotinên pêşiyên an destûreke civakî. Lê di her rewşê de, çîrokbêj ew kes e ku dikare aqil bide xwendekarên xwe. Lê mixabin wekî ku Benjamin jî diyar dike êdî hukmê çîrokbêjîyê nemaye, ji zû de ji me dûr ketiye û dûrtir jî dibe. Êdî

<sup>62</sup> Benjamin, *Son Bakışta Aşk*, r.84.

<sup>63</sup> İsmail Görkem, *Halk Hikâyeleri Araştırmaları*, weş. Akçağ, 2008, Ankara, r.13

<sup>64</sup> Sanders, *Öküzün A'sı*, r. 28.

em kêmtir rastî kesên ku bi hostayî çîrokan li hev tînin dibin. Û êdî em pir rastî kesên ku ji guhdarkirina çîrokê aciz in, dibin. Wek ku tişteki me bixwe, tişteki ku em pê bawer bûn ku em winda nakin mîna ferîşteyên me, wek ku behreya parvekirina tecrûbeyên me ji destên me hatibe stendin.<sup>65</sup>

---

<sup>65</sup> Benjamin, *Son Bakışta Aşk*, r. 77-80.

## BEŞA YEKEM

### 2. ÇANDA KURDÎ YA DEVKÎ Û DENG BÊJÎ

Weke ku tê zanîn nivîs cara yekem li Mezeopotamyayê ji alî Sumeriyan ve hatiye bikaranîn. Digel vê yekê çanda nivîskî li vê erdnigariyê bi temamî nebûye desthilatdar. Wek parçeyeke vê erdnigariyê li Kurdistanê jî hîn bandora çanda devkî heye. Digel gelek sedeman, raboriya çanda devkî ya dûr û dirêj jî di pêkanîna vê yekê de sedemeke girîng e. Di hin serdemên dîrokê de kes û sazîyên ku zanîn afirandine û ragihandine nişên nû her tim hebûne. Di civaka kurdan de jî dengbêjan ev peywir bi cih anîne. Dengbêjên kurd bi hunera xwe berhemên çanda devkî ya kurdî veguhastine nişên paşerojê. Ji ber vê yekê em dê di vê beşê de li ser çanda devkî ya kurdî, dengbêjî û kevneşopiya dengbêjiyê hûr bibin.

#### 2.1. Çanda Kurdî ya Devkî

Di çanda kurdî ya devkî de folklor qadeke gelek girîng e. Ji ber ku folklor di dîroka kurda de wek binyadek arkaik namîne. Di hin ciyan de bi berhemên nivîskî yên wêjeyî re cih guherandiye. Di navbera nivîsê û wêjeya devkî de bûye navbeynkar. Ji vê jî girîngtir folklor di jiyana gelê kurd de bûye rêgeza tomarkirin û ragihandina dîrokê. Digel hebûneke hindik a wêjeya nivîskî, ragihandina wêjeyê, piranî, bi awayê devkî kirasê folklorê li xwe kiriye.<sup>66</sup> Lewre li dewsa nivîsê gelek tiştên xwe bi gotinê û bi dev veguhezandine hev. Kurdan bawerî bi gotinê, wêjeya devkî û folklorê anîne. Dewlemendiya folklorê kurdî bala Celadet Elî Bedîrxan kişandiye. Bedîrxan, ji bo folklorê kurdî dibêje “folklorê me di nav folklorên dinyayê de di rêzên pêş de ye. Di rojhilata nêzik de çî folklor nagihêjin a kurdan.”<sup>67</sup> Vê dewlemendiyê bala gerok û lêkolîneran biyanî jî kişandiye. Yek ji vana Vilçevskî ye. Bazil Nikitin, nêrina Vilçevskî a der barê folklorê kurdî de weha neqil dike “di warê wêjeya kurdî de, ji bo lêkolîneran tiştê herî balkêş bê ser û berbûna folklorê ye.”<sup>68</sup>

Heger ji sedemên dewlemendiya folklorê kurdî yek jê bêparhiştina sazî, dezgeh û derfetên bikaranîna zimanê zikmaki ya nivîsê be, sedema din jî hebûna dewlemendiya çand û dîroka kurdan a kevnare ye. Têkiliya kurdan û gelên cîran ên wekî Faris, Tirk,

<sup>66</sup> Erol Mutlu, “Kürt Müziği Üzerine”, *Kürt Müziği*, Edîr. Abdullah Keskin, weş. Avesta, İstanbul, 1996, r. 54

<sup>67</sup> Herekol Azîzan, “Klasîkên Me”, *Hawar*, j. 33, amd. F. Ceweri, weş. Nûdem, Stockholm, r.810

<sup>68</sup> Bazal Nikitin, *Kürtler*, weş. Deng, İstanbul, 1991, r.445.

Ereb û Ermeniyan jî bandor li ser folklorê Kurdî ya devkî kiriye. Kurdan destanên Mezopotamyayê, çîrokên Farisan, mîtolojiya Yewnaniyan û biwêjên Ereban girtine û di bendera çanda xwe de hewandine. Gelek caran jî çanda xwe ya dewlemend ji van gelan re pêşkêş kirine.<sup>69</sup> Di folklorê kurdî de cureyên wekî helbest, çîrok, çîrçîrok, gotinên pêşiyar, metelok, tiştanok û hwd. ji aliyê çavkaniyan ve wekî berhemên ku kurdan bi tecrûbeyên xwe afirandine, yên ku ji kevneşopiya Rojhilata Navîn mane û berhemên ku ji cîranan hatine girtin ango hatine adeptekirin dikarin bêne dabeşkirin.<sup>70</sup> Lê divê em ji bîr nekin ku folklor her di cihê xwe de nemaye. Her gav xwe nuh kiriye û rabirdûyê ji bo dahatûya amade kiriye, ji ber vê yekê aliyekî folklorê yê hemdem jî heye.

Ji ber sedemên siyasî, aborî û erdnîgarî kevneşopiya çanda devkî ya kurdan heta demeke nêzîk gelekî ber bi çav bû. Digel vê yekê dîroka çanda kurdî ya nivîskî jî gelekî kûr e. Wekî hejmar hindik bin jî di sedesala VIIan de dest bi nivîsandinê kirine. Lê belê berhemên edebî yên nivîskî ji sedesala Xan û şûn de xuya dibin. Ev berhem ji aliyê beşeke piçûk ên civakê ve hatine afirandin û xwendin. Statuya kurdî di dema mîrekiyên Botan, Bedlîs, Erdelan û yên din de gihîşt asteke bilind. Gelek cureyên wêjeyê di vê serdemê de derketin meydanê.<sup>71</sup> Helbestvanên kurd di bandora dengbêjan de mane, ji kilamên wan sûd wergirtine, çîrok û kilamên wan nivîsandine.

Em li vira bi kurtî dikarin qala çend nava bikin ku berhemên wan ên nivîskî gihîştine roja me. Melayê Cizîrî (1567–1640) hehelbestvanekî navdar ê wêjeya klasîk a kurdî, û xwediyê dîwanekî ye. Feqiyê Teyran (151563?–1641?) helbestvanekî girîng yê sedesala XVI û XVIIan e. Ji herêma Muksê ye. Helbestên wî di nav gel de bi awayekî devkî hatine gotin. Bi demê re bûne beşek ji folklorê Kurdî. Bi navê *Hespê Reş*, *Şêxê Senanî û Bersîs* sê berhemên wî hene. Melayê Bateyî (1675?-1760?), di sedesala XVIIan de li gundê Batê yê Colemergê jiyaye. Helbestvanekî girîng ê vê sedesalê ye. Nivîskarê *Mewlûda Kurmancî û Zembîlfiroş* e. Ehmedê Xanî (1651-1707) wêjeyanê din ê navdar ê serdema edebiyata klasîk a kurdan e. Xanî nivîskarê berhama bi nav û deng *Mem û Zînê* ye. Bilî vê berhemê bi navê *Eqîda îmanê*, *Nûbahara Biçûkan* du berhemên wî yên din jî hene<sup>72</sup>

Bi dû van nimûneyên pêşîn ên wêjeya nivîskî re, şerhên dîne Îslamê hatin. Ayet, telqîn û şerhên olî bi zîmanê Kurdî hatin nivîsandin. Di nav van berhemên dîne de yên

<sup>69</sup> Kemal Burkay, *Geçmişten Bugüne Kürtler ve Kürdistan*, weş. Deng, İstanbul, 1992, r. 214

<sup>70</sup> Jwaideh Wadie. *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi*, wer. İsmail Çekem, Alper Duman, weş. İletişim, İstanbul, 2009, r. 53.

<sup>71</sup> Kendal Nezan. “Kürt Müziği”, *Kürt Müziği*, Edit. Abdullah Keskin, wer. Necdet Hasgül, Weş. Avesta, İstanbul, 1996, r. 11.

<sup>72</sup> Adurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2013, r.186-257



herî belavbûyî Mewlûd in. Mewlûd, bi şêweyeke helbestî behsa jidayikbûna Hz. Mihemmed dike. Bi her sê zaravayên sereke yên kurdî Mewlûd hatina nivîsandin. Her weha berhema nivîskî ya pêşîn ku bi zaravayê dimilî ( zazayî) hatiye nivîsîn jî mewlûd e.<sup>73</sup>

Ji serê sedsala XVIIan û şûnde lêkolînerên biyanî dest bi xebatên berhevkirina folklorê kurdî kirine. Cara pêşîn di sala 1711an de li Ermenîstanê bi alfabeya ermenkî berhemeke folklorî ku tê de 115 gotinên pêşiyên hene, ji alî Mecrop Mastoc ve hatiye nivîsandin. Paşê lêkolînerên wekî K.Aygonî (1838-1908), F. Le Coq (1901) û hwd. li ser folklorê kurdî hin berhem çap kirine<sup>74</sup>.

Kurdên ku ji ber sedemên cuda neçar mane û koçî Sovyetê kirine, piştî 1930î berhemên folklorî yên kurdî weşandine. Heciyê Cindî û Emînê Evdal berhemeke bi navê *Folklorê Kurmanca* di sala 1936an de çap kirine. Di nav vê berhemê de gelek nimûneyên destan, çîrok û kilamên kurmancî hene. Di dîroka weşangeriya kurdî de cihekî Hawarê yê taybet heye. Hawar bi pêşengiya Celadet Elî Bedîrxan ji aliyê hin rewşenbîrên Kurdistanê Bakur ku sirgunî Şamê bûbûn ve hatiye çapkirin. Di nav rûpelên Hawarê de gelek berhemên folklorî hatine weşandin.<sup>75</sup>

Di serê sedsala XXan de hin rewşenbîrên kurd li Stenbolê dest bi xebatên weşangeriyê kirin. Hin kovarên wekî *Jîn, Kurdistan, Hetawî Kurd* hatin çapkirin. Digel ku ev weşan bêtir siyasî bûn û doza hişyarkirina netewa kurd dikirin jî hin berhemên folklorî jî di nav rûpelên kovaran de cihê xwe girtin<sup>76</sup>. Lê piştî sazkirina Komara Tirkîyeyê derfeta xebatên folklorî nemaye. kurdî bi awayekî fermî hatiye qedexekirin, rewşenbîrên ku doza kurdî kirine rastî zextan hatine. Lewma jî xebatên çanda devkî ya kurdan di bin navê folklorê de bi zimanê tirkî hatine kirin. Berhemên ku hatine amadekirin jî an nehatina çapkirin an jî wekî berhemên çanda tirkan hatine nîşandan. Hin rewşenbîrên kurd ên wekî Yaşar Kemal, destanên kurdî kiriye mijarê romanên xwe.<sup>77</sup>

Piştî ku qedexeyên li ser zimanê kurdî hinekî sist bûn, xebatên çanda devkî ya kurdî jî ji nû ve dest pê kirin. Berî ku qedexe rabin hin rewşenbîrên wekî Musa Anter di nav kovarên tirkî de cih dan hin berhemên folklorî yên kurdî. Lê belê berdêla van

<sup>73</sup> Mehmed Uzun, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, weş. İthaki, İstanbul, 2010, r.39.

<sup>74</sup> Yıldırım, Pertev, Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, r. 52-56.

<sup>75</sup> H. b. r.72-80.

<sup>76</sup> Mehmed Uzun, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, r.70.

<sup>77</sup> Özdemir İnce, "Yaşar Kemal ile Soyleşi", Radikal, 17-18 Gulan, 2002, vgz. Süleyman Öz, *Doğu ve Güneydoğu Anadolu Sözlü Kültüründe Hikâye Anlatıcılığı*, Mimar Sinan Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü (Teza Lisansa Bilind ya Çapnebûyî), İstanbul, 2003, r.19.

hewldanan gelekî giran bû. Digel hemû zextên li ser kurdî, folklorê kurdî bi taybetî li gundan hebûna xwe domand. Ev yek jî girêdayî bikaranîna zîmanê kurdî ya di jiyana rojane û hunerî de ye. Nûnerên çanda devkî jî jin û dengbêj in

## 2.2. Dengbêj û Dengbêjî

Di nav kurdan de ji ber ku çanda niviskî pêş neketiye girîngiya cureyên vegotinê derketiye pêş. Bi vî awayî dengbêj li gor hinekan feylesofên peyvê, li gor hinekan hostayên peyvê yên wêjeya kurdî û li gor hinekan jî bîra ziman û dîroka kurdî ne. Dengbêjan bi hûnandina kilaman, gelek nîrxên dîrokî, çandî û mîtolojîk gihandine roja îro.<sup>78</sup>

Ji bo ku em dengbêjiyê fêhm bikin divê em hinekî bidin ser şopa dîroka dengbêjiyê. Dengbêjî kevneşopîya vegotina çîrokan a bi awayekî xweser e. Kurdan di dîrokê de yek jê împaratorî (împaratoriya Medan), di nava hin desthilatîyên din de jî mîrîtî û begîtiyên xweser ava kirine û bi vî awayî hebûna xwe domandine. Di vê pêvajoyê de çîrokên xwe di heman demê de wekî dîroka xwe hesibandine.<sup>79</sup> Vebêjê vê hunerê jî dengbêj in. Îzady, koka destpêka vê huner û kevneşopiyê li Kurdistanê, digihîne hatina Ariyan a Kurdistanê.<sup>80</sup>

Ji nav Partan ku qewmekî nêzîkî kurdan e, gelek dengbêj, stranbêj û muzîkjen gihîştine. Ji van hostayên wêjeya devkî re “Gosan” dihate gotin.<sup>81</sup> Van Gosanan carna li qesrên qiral û began, carna jî di nav pîrozbahiyên gel de hunera xwe pêşkêş dikirin. Em nikarin bibêjin ku ev hunermendên deng û peyvê yê kevn ne xwediyên hiş, raman û afirîneriyê bûn. Heger em ji dîroka kevn a Partan bi rê bikevin û werin roja îro, em dikarin bibêjin ku kevneşopîya huner û çanda dengbêjiya kurdan, wekî berdeamiya kevneşopîya Gosanan e. Divê em ji bîr nekin ku Sîn Lekke Unnînî li perestgehan Destana Gilgamêş tevî îlahîyan xwendiyê. Dema ku em li kevneşopîya dengbêjiyê dinîhêrin, hevşibîna çanda Gosanan û dengbêjiyê bi hêsanî tê dîtîn. Dengbêjan jî wekî Gosanan hunera xwe geh li qesrên mîr û began, geh jî di nav gel de pêşkêş kirine.<sup>82</sup>

Kurdan bi taybetî ji sedsala XIVan heta dawîya sedsala XVIIIan bi awayekî xweser xwe bi rê ve birine. Di sala 1514an de, di navbera Osmanîyan û Safewîyan de li

<sup>78</sup> Miraz Ronî, “Dengbêjîk ve Edebiyat”, *Înatçı Bir Bahar Kürtçe ve Türkçe Edebiyat*, amd. Vecdî Erbay, weş. Ayrinti, İstanbul, 2012, r. 280.

<sup>79</sup> Parilti, *Demgbêjler, Sözüün Yazgısı*, r. 65.

<sup>80</sup> Mehrdad R. Izady, “Kürtler ve Müzik”, *Kürt Müziği*, Edîf. Abdullah Keskin, wer. Mutlu Öztürk, weş. Avesta, İstanbul, 1996, r. 23.

<sup>81</sup> Izady, “Kürtler ve Müzik”, r. 23.

<sup>82</sup> Ronî, *Înatçı Bir Bahar Kürtçe ve Türkçe Edebiyat*, r. 281-282.

Çildêranê, Îro navçeya bajarê Wanê ye, şer dertê. Di encama vî şerî de Safewî têk diçin. Piştî vî şerî mîrîtiyên kurdan dibin xwediyê rêvebiriyan xweser. Bi vê xweseriyê re kurdan li welatê xwe di warê ziman û çanda xwe de pêşketinên mezin pêk anîne. Di van deman de, dengbêj bûne nîrxên hêja yê çanda kurdan.<sup>83</sup> Lê belê dengbêjî tenê vegotina efsaneyên kevn, destanên lehengiyê, bobelatên ku hatine serê hin gelan û kilamên evîne nîn e. Berê dengbêj wekî peywirdarên olî yê ku diyar diyar digeriyan û baweriyên wê demê belav dikirin bûn. Dengbêjan di heman demê de rewresmên olî bi rê ve dibirin. Bi vî rengî berê civakê bi awayekî manevî û derûnî didan ser şopa hin baweriyên.<sup>84</sup> Ev pîralîbûna dengbêjan heta dema karbeşiyê domandiye, ji vê deme bi şûn de ji bilî dengbêjiyê karên din ketin destê yê ku di karbeşiyê de bûne hosta.<sup>85</sup> Îro kême be jî hin derwêşên terîqetan li nav gundan digerin û metnên olî bi awayekî muzikî pêkêş dikin. Lê belê wekî dengbêj pejirandina van kesan mijara niqaşê ye.

Heger em vegezin ser peywira dengbêjan a roja îro, li gor çavdêriyan me yê li malên dengbêjan û hevpeyvînan me yê bi dengbêjan re, dengbêj vebêjereke ku bûyer û qewimînan bandoreke giran li ser civakê kirine, bi awayekî hestiyar û estetîk, pêşkêş dike.

Peyva dengbêj bi awayekî etîmolojîk him wateya “deng” him jî “gotin”ê di nava xwe de dihevine. Dengbêj yekpariya gotin û deng e, dengvedan e. Zindî û dualî ye. Ango yê ku dibêje û yê ku guhdarî dikin li ba hev in, di nava têkiliyekê de ne. Dengbêj hostayên hunera gotinê ne. Hostayên ku peyvê dihûnin, wekî hevîrekê nerm dikin û teşeyekî hunerî didin “gotin”ê.<sup>86</sup> Dengbêj peyvê dike newayeke xweş û li guhên me dialiqîne.

Li gor Mehmed Uzun, dengbêj, ew hosta ye ku pîşe û cih û warê wî deng e. Dengbêj kesê ku kalamê dike kilam e, dibêje û vedibêje ye.<sup>87</sup>

Li gor dengbêjên îro jî wateya dengbêjiyê dîroka kurdan ve girêdayî ye. Gelek nûnerên ku vê mirata devkî ji me re radigihînin dengbêjiyê, wekî dîroka devkî ya civaka kurd bi nav dikin. Li gor Dengbêj Silheddîn, dengbêjî: “Dîrok e, bê dengbêjî dîrok

<sup>83</sup> Jwaideh, *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi*, r. 43-44.

<sup>84</sup> Bedran Hikmet, “Dengbêj Geleneği”, *İnatçı Bir Bahar Kürtçe ve Türkçe Edebiyat*, amd. Vecdi Erbay, weş. Ayrıntı, İstanbul, 2012, r. 290.

<sup>85</sup> Ramazan Alan, *Bendname*, weş. Avesta, İstanbul, 2009, r.268.

<sup>86</sup> Nedim Dit, “Dengbêj Geleneğinin Sonu Ya Da Bu Geleneğin Son Halkası: Reso”, *Bîr*, j. 6, Zivistan, 2007, r.172.

<sup>87</sup> Mehmed Uzun, *Dengbêjlerim*, weş. Gendaş, İstanbul, 2005, ç. 6, r.11.

wenda ye. Wekî ku tu tiştêkî bikî binê axê, xweliyê bavêjî serê.”<sup>88</sup> Bi van gotinan jî girîngiya dengbêjiyê ya eşkerekirina dîroka kurdan diyar dibe.

Dengbêj Mehmed Metin Barluken dengbêjiyê, wekî ziman û çanda kurdî bi nav dike. Bi xêra dengbêjiyê ziman û çanda kurdî ji dîrokê gihîştîye roja îro. Li gor wî, dengbêj berdevkê çand û zimanê kurdî ye.

Dengbêj Zekî dibêje “Dengbêjî huner e, evîn e û ajotîneke di nav dîroka kurdî de ye.”

Li gor Dengbêj Yaqûp dengbêjî, pirtûkeke dîrokî ye ku hîn nehatiye temamkirin. Pirtûkeke devkî ye, çavkaniyeke dîrokî ye<sup>89</sup>.

Aliyekî dengbêjiyê jî ragihandin e. Dengbêj Seîd dibêje “Dema ku radyo, tv, pirtûk û rojname tune bûn dengbêjan bi kilamên xwe bûyer û serpêhatiyên girîng ji civaka xwe re radigihandin. Bi vê peywira xwe dengbêjî hinekî jî mamostetî ye.”<sup>90</sup>

Li gor dengbêj Nejmeddîn dengbêjî, kedkariya çand û hunera gelê kurd a bi rêya deng e.<sup>91</sup> Wekî ku ji van pênaseyan jî tê femkirin, dengbêjî di nava rabirdû û dahatûyê de pireke ji deng û peyvê ye. Dengbêj di heman demê de çîrokbêj e. Berpirsyarê vegotina çîrok, destan û efsaneyan e. Ji ber ku ew şahidê dema xwe bûn, diviyabû serpêhatiyên gelên xwe, mêrxasî û xayintiya di nava mirovan de, rabirdûya gel, şer, evîn, nasname û bûyerên din bianîna ser ziman. Navê wan ne dengbêj bin jî, di nav her gelê li Rojhilata Navîn de kesên ku peywira dengbêjan bicih tînin hene. Van kesan ji ber du sedemên girîng vegotina çîrçîrokan li gor çîrokan li paş hiştine. Ji van sedeman yek jê, çîrçîrok ne li gorî mêran in, a din jî çîrçîrok wekî “çîrokên derewîn” hatine hesibandin û derfeta vegotina çîrçîrokan a li her derê û her demê ye.<sup>92</sup> Çîrokên ku dengbêj dibêjin nîşana cerbandin û serpêhatiyên mirovan in. Lewma jî di civaka kurdan de ji van çîrokên ku dengbêj dibêjin re “kilamên rûniştî” ango “kilamên giran” tê gotin.<sup>93</sup> Taybetmendiyeke dengbêjên kurd jî ew e ku çîrokan bi melodî vedibêjin. Li gor Kendal Nezan, dengbêj ji bo ku peyvên ji bîr nekin çîrokê bi melodî dibêjin.<sup>94</sup>

Berhema xebata dengbêjan a herî girîng kilam e. Ji vegotinên bi melodî yê dengbêjan re “kilam” tê gotin. Hin caran peyva “stran” jî ji dewsa kilamê tê bikaranîn. Lê belê her du ne yek in. Gotin û melodiya stranên li gor kilaman siviktir e. Zana

<sup>88</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Dengbêj Silhedin”, 29.05. 2012, Mûş.

<sup>89</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Dengbêj Yaqûp”, 29.05. 2012, Mûş.

<sup>90</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Dengbêj Seîd”, 29.05. 2012, Mûş.

<sup>91</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Dengbêj Necmeddîn”, 29.05. 2012, Mûş.

<sup>92</sup> Parilti, *Dengbêjler, Sözüün Yazgısı* r. 63.

<sup>93</sup> H.b. r. 77.

<sup>94</sup> Nezan, *Kürt Müziği* r.14.

Farqînî beyt, lawik, azîze, payîzok, hore û hwd. dixê bin banê kilaman û vana wekî stranên bêpîvan dihesibîne.<sup>95</sup>

Li hin herêman dengbêjan çîrokên xwe digel amûreke muzikê pêşkêş dikirin, hinekan jî tu amûr bi kar nedianîn. Amûrên muzikê jî li gorî taybetiyên erdnîgariyê diguherin. Bo nimûne li cihên çiyayî, her ku nêzikî herêma Qafqasan dibû amûrên pîfikirinê yên mîna bilûr û pîpikê bi giranî dîhatin bikaranîn. Li herêmên Mêrdîn Riha û Amedê amûrên bi tîr derdiketin pêş. Li devera Mêrdînê bi bandora mitriban ribabê cihekî taybet girtiyê.

Ji aliyê din ve hinek dengbêj ji ber ku bi dengê xwe ewle bûn û dengê xwe wekî amûrekî bi kar dianîn, tu amûrên muzikê bi kar neanîne. Bi armanca ku cihê amûran dagirin û wê valahiya nebûna amûran ji holê rakin, di nav çîrokê de bi rîtm û bilindkirin û daxistina dengê xwe bandora amûrê pêk anîne. Kîteyên wekî lo lo lo lo, lê lê lê lê, wî wî wî... valahiya amûrên muzikê dagirtine.<sup>96</sup>

Di vê mijarê de Miraz Ronî dibêje ku di serdema mîrîtî û begîtiyên kurdan de dengbêjan hunera xwe li qesr û qonaxan, ligel gelek amûran bi awayekî orkestrayî pêşkêş dikirin. Lê mixabin piştî belabûna desthilatiya kurdan dengbêj jî ji qada bajaran ber bi herêmên bejahî vekîşiyane. Di van deman de dengbêj bê xwedî man e û neçar mane ku hunera xwe bê amûr û bi tena serê xwe pêşkêş bikin.<sup>97</sup>

Her dengbêjekî jî stîl û estetîkeke wî ya taybetî heye. Ji ber vê jî mirov ji her dengbêj û çîrokbêjî re nikare bibêje, ev dengbêjekî baş û hosta ye. Ji bo ku mirov ji dengbêjekî re bibêje baş û hoste, divê mirov bi qayde, kevnşopî û rêbazên dengbêjiyê bizanibe. Dengbêjê baş xwediyê stîl û awazeke taybet e. Divê stranên xwe bi xwe biafirîne û bibe pêşengê ekolekê.<sup>98</sup> Di vî warî de mirov dikare wek mînak Evdalê Zeynikê nîşan bide. Yaşar Kemal, di hevpeyvîna ku bi Azra Erhat re kiriye de, li ser afirînerî û hostatiya Evdal sekiniye û weha gotiye: “Dema ku dengbêjan kilama Memê Alan dixwendin, yên derdorê, ev Memê Alanê Evdalê Zeynikê ye, digotin. Xuya bû ku Evdal, him helbestên xwe dixwend, him jî destanên kevn dubare dikir.”<sup>99</sup> Karabetê Xaço, Ahmedê Fermanê Kîkî, Resoyê Gopala û Şakiro jî dengbêjên hosta û bi nav û deng in.

<sup>95</sup> Zana Farqînî, “Navê Stranan”, *Jiyana Rewşen*, j.3, Berfanbar, 1996, Stenbol, r.9.

<sup>96</sup> Abidin Pariltî, “Cih û Girîngiya Dengbêjiyê Di Muzika Kurdî De”, wer. Samî Berbang. *Zend*, 2007, r.121

<sup>97</sup> Ronî, *Înatçi Bir Bahar Kürtçe ve Türkçe Edebiyat*, r. 282

<sup>98</sup> Mehmed Uzun, *Dengbêjlerim*, r. 34

<sup>99</sup> Azra Erhat, *Sevgi Yönetimi*, weş. Can, İstanbul, 2003, r.238-239.

Ji berê de dewlemend û malmezinên kurdan wekî kevneşopiyekê rûmeteke mezin didan hunerê û hunermendan. Mînaka vê yekê jî parastin û hewardina dengbêjan e. Dengbêj di bin baskên van dewlemendan de dijiyan her cure pêdiviyên wan ji aliyê xwediyên malê ve dihatin pêkanîn. Dengbêjan jî karê xwe bi awayeke profesyonel dimeşandin. Heger em çend mînakan bidin, em dikarin bibêjin ku Selîm Silêmanê ku tê gotin di sedsala XVIIan de jiyaye, dengbêjê Mîr Şerefê Begê Hîzanê bû. Evdalê Zeynikê, dengbêjê Surmeli Mehmed Paşa bû, Ehmedê Fermanê Kîkî dengbêjê Reşîd Begê bû. ( Ev dengbêj paşê diçe binxetê û heta mirina xwe li mala Celadet Elî Bedîrxan dimîne) Karapetê Xaço ku bi eslê xwe Ermenî bû, demeke dirêj ji mala Filîtê Qûto re dengbêjiyê dike.<sup>100</sup>

Dengbêj ji bo her eşîrê, beg, axa û mîrekî nîşana serbilindiyê bû. Began carinan dengbêjên xwe dianîn ba hev û ew dixistin lecê. Mînaka vê yekê jî leca Şêx Silê û Evdalê Zeynikê ye. Şêx Silê dengbêjê Tahirxanê Qeleniyê ye û Evdalê Zeynikê jî wekî ku me li jor gotibû, dengbêjê Surmeli Mehmed Paşa ye. Her du began bi dengbêjên xwe, pesnê xwe dane û li ser vê meselê ji hev re name şandine. Pişt re Evdal rabûye çûye Îranê û bi Şêx Silê re ketiye lecê. Leca li dîwana Tahirxan heft roj û heft şevan domandiye û di dawiyê de Evdal bi serketiye.<sup>101</sup> Beşek ji leca wan wiha ye.

“... ”

Evdal go: - şêx Silê

Şam, Heleb, Diyarbekir –

Ew tê hesavê goveka dinê,

Wez diqûrim notilî qulingê vê Emenê,

Deng ji min dernayê.

E zê merivekî bişînim bal mîrê Qeleniyê,

Bira dermanekî min ra bişîne, ez ê bixumû

Dengê min ê here qîz û bûkê vê Bexdayê

Şêx Silê go: - Evdal, gotina te ye,

Şam, Heleb, Diyarbekir ew tê hesavê, go, weka dinê

Hê mîrê Qeleniyê xemiliye, gul ketinê.

Xelqê sivê şebeqê radive tela bextê xwe dixweze Xudê Teala,

Evdalê Zeynikê rizayê xwe dixwaze -

<sup>100</sup> Parilti, *Dengbêjler, Sözüün Yazgısı*, r. 88-89.

<sup>101</sup> Ahmet Aras, “Evdalê Zeyniikê Lirîzma Kurdî Gihandiye Dereceya Herî Bilind”, *Nûdem*, hevpeyvîn: Mustafa Aladağ, j. 23, 1997 r. 120.

Ji mala Şero vê torinê”<sup>102</sup>.

Dengbêjê ku bi ser biketa ji bo mîrê wî şanaziyeke mezin bû. Lê belê dengbêj di pêşkêşkirina huner û gotina xwe de serbixwe bûn. Dem hatiye berê tîrên xwe dane mirê xwe jî. Piştî helweşîna pergala mîrîtiyên kurdan, dawiya sedsala 19’an, dengbêj jî bê xwedî man. Ji bo ku debara xwe bikin, dest bi kar û barên rojane kirin. Hinek jî koçber bûn. Wekî mînak, Karapetê Xaço ji mala Filîtê Quto derket çû Sûriyeyê bû leşkerê fransiyî. Lê belê li hin gundan hinek kesên dewlemend li gor derfetên xwe li hin dengbêjan xwedî derketin. Dengbêjê bi dawetan û şevbihêrkan bi sînor ma.

Bi kurtî, gelê kurd erdnîgariya xwe, jiyana xwe ya civakî, ecibandî û hestên xwe jî di nav de hemû pêvajoya jiyana xwe bi çanda dengbêjiyê aniye ziman. Îro jî dema ku em li ser kîjan efsane, destan, û bûyerên lehengiyê lêkolînekê bikin, em dê rastî berhemên dengbêjan bîn. Ji bo gelê kurd kilamên dengbêjan belgeyên dîrokî ne. Hemû kitekitên jiyana kurdan bi alîkariya van kilaman ji nifşekî gihaye yê din.<sup>103</sup>

### 2.2.1. Di Dengbêjiyê de Perwerdehî

Perwerdehiya dengbêjan jî wekî qadên din ên jiyana di çarçoveya şagirt û hosta de pêk hatiye. Di vê mijarê de Nikitin ji O. Mann wieha vediguhezîne:

“Di nav kurdan de, digel xwendingehê ku ji aliyê meleyan ve dihatin bîrêvebirin, em dikarin bibêjin ku xwendingehên newayê ku helbestên epîk xurt dikirin jî hebûn. Xortên ku qabilyeta dengbêjiyê pê re hebûn diçûn ber destê hostayekî û repertuara devkî ya wî hostayî hîn dibûn. Hejmara dengbêjên ku bi xwendin û nivîsandinê dizanin gelekî kêmtir e. Lewma jî perwerde tenê bi rêya devkî dibû. Paşê ev şagirt diçûn ber destê hin hostayên din jî. Van şagirtan di berdêla vê perwerdehiyê de yan kar û barên mala hosta dikirin an jî hinek pere û tiştên din ên wekî xwarinan didan hostayê xwe.”<sup>104</sup>

Lêkolîner Ahmed Aras, li dijî tesbîta Mann derdikeve. Ew dibêje ku bi wateya xwendingeha dengbêjan tu sazîyên kurdan tune bûn. Ango tu mekanên ku kesên ku dixwazin bibin dengbêj û li wir dersê bibînin tune bûn. Namzetên dengbêjiyê, di bin bandora dengbêjên ku ji xwe re wekî model didîtin de diman û paşê diçûn dîwan û

<sup>102</sup> Hecîyê Cindî, *Kilamên Cimeta Kurda*, weş. Lîmûş, Yerêvan, 2008, r. 66.

<sup>103</sup> M. Zahir Kayran, “Kürt Folkloründä Dengbêjlik Geleneği”, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, amd. Mehmet Bayrak, weş. Özge, Ankara, 2002, r. 510.

<sup>104</sup> Nikitin. *Kürtler*, r. 474

odeyên ku dengbêj lê hunera xwe pêşkêş dikir rûdiniştin û li wan guhdarî dikirin. Li wê derê ew kilamên ku dihatin gotin di mêjîyê xwe de tomar dikirin. Bi vî rengî hêdî hêdî hînî dengbêjîyê dibûn. Li van odeyan şagirt him hînî kilaman dibûn, him jî hînî rabûn rûniştin û edet û toreyên dengbêjîyê dibûn. Heger dengbêj kesekî ku gerok ba, şagirt jî bi wî re gund bi gund digeriyan. Bi vî rengî perwerde dibûn.<sup>105</sup>

Mirovên ku di çandên devkî de dijîn gelek tiştan hîn dibin. Lê belê ev hînbûyîn bi rêbaza xebatê pêk nayê. Şagirt bi hostayan re təkiliyeke xurt datînin. Gotinên wan guhdar dikin, dubare dikin, gotinên pêşîyan, biwêjan û hin qalibên din hîn dibin, paşê di bîra xwe de van tiştên ku hîn bûne distrên û bi teşeyeke nû pêşkêş dikin.<sup>106</sup> Li vir em dikarin serpêhatiya Dengbêj Kesê nîşan bidin. Kesê, dengbêjîyê li dîwana dengbêjan hîn dibe. Li mala wan dîwan tê danîn, Dengbêj Resoyê Gopala li diwanê kilaman dibêje. Kesê jî bi baldarî lê guhdar dike. Bî wî re miraqa dengbêjîyê çêdibe. Ji her kilameke Reso carê çend gotinan jiber dike. Paşê dide pey şopa Reso. Her devera ku dîwana Reso lê tê danîn, xwe digihîne û bi vî rengî hewl dide ku kilamên Reso jiber bike.<sup>107</sup>

Şagirtên dengbêjîyê bi bandora xortaniyê jî berê kilamên evîne ( heyranok) yên bi rîtm digotin. Ji ber ku gotina van kilaman hêsantir bû. Paşê hêdî hêdî dest bi payîzokan dikirin. Di gavên pêşîn ên hostatiyê de bi dengbêjên din re diketin lecên piçûk. Her ku hostatî bi pêş diket û dengbêj bi xwe bawerî dîanî, êdî dikaribû destan û kilamên lêhengiyê bigota. Lê belê hostatiya esas, afirandina kilamên xweser, meqamên xweser e. Piştî vê pêvajoyê dengbêj ji hostayê xwe destûrê digire û bi serê xwe karê xwe dimeşîne.<sup>108</sup> Wek mînak li gor Karapetê Xaço kî karibe “kilamên mêraniyê” bibêje, ew “dengbêjê hosta” ye. Lewma jî, dema ku li Radyoya Rewanê daxwaza kilamên evîne ji wî tê kirin, Karapet daxwaza wan paş de vedigerîne û ji wan re dibêje; “kilamên eşq û evîne dema ku em ciwanbûn me digotin, şerm e ku mirov li ber mêran kilamên bi vî rengî bibêje. Ez dikarim kilamên lehengiyê bibêjim.” Li gor Karapet, kilamên eşq û evîne yê şagirt û dengbêjên ku hin nebûne hosta ne.<sup>109</sup>

Dengbêj hin tecrûbeyên xwe bi şagirtê xwe re parve dikir. Di nav van tecrûbeyan de çîrok, destan kilam û meqam û qayde jî hebûn. Normên civakê li ode û dîwanan bi şagirt û guhdaran re dihatin parvekirin. Hoste agahiyên ku li deverên din pêk hatine ji civatê re radigihandin. Bi vî rengî civat ji pêşketinan agahdar dibûn.

<sup>105</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Ahmet Aras”, 10.08.2012, İzmir.

<sup>106</sup> Sanders, Öküzün A’sı, r. 28.

<sup>107</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Dengbêj Kesê”, 29.05.2012, Mûş.

<sup>108</sup> Süleyman Öz, *Doğu ve Güneydoğu Anadolu Sözlü Kültüründe Hikâye Anlatıcılığı*, Mimar Sinan Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü (Teza Lisansa Bilind ya Çapnebûyî), İstanbul, 2003, r.99.

<sup>109</sup> Salihê Kevirbirî, *SedsalaQêrînekê Karapetê Xaço*, wer. Şerîf Derînce, weş. Do, Stenbol, 2009, 67.



Di nav dengbêjiyê de kevneşopiyê girîng hebûye. Ev kevneşopî îro jî cih bi cih didome. Ew kesên ku dibin dengbêj, diçin bi dengbêjên din re dikevin lecê û bi wî awayî xwe îspat dikin. Evdalê Zeynikê jî dema ku dest bi dengbêjiyê dike, diçe bi gelek dengbêjan re dikeve lecê û tim bi ser dikeve. Yek ji van mînakên leca Gulê û Evdal e. Gulê ya ku bi eslê xwe Ermen e di wê demê de azep bûye. Dengbêjê gelek jêhatî û wisa bi xwe bawer bûye ku sond xwariye û gotiye :” kî ku di dengbêjiyê de zora min bibe, ez ê bi wî re bizewicim.” Evdal vê gotinê dibihîze û diçe bi Gulê re dikeve lecê. Di encama ve leca dût û dirêj de Evdal bi ser dikeve lê Evdal ji ber ku berê zewiciye, bi Gulê re nazewice.<sup>110</sup> Beşek ji vê lecê wiha ye:

“ ...

Gulê go:

Evdal merûmo,

Ji Xamûrê heta vira

Xûn rijiya ser kevira,

De tu were mi ra bêje

“xuşkê”, ez bêjim “lo bira”

Evdal go:

Gulê Merûmê,

Minê çandiye kundirê bejî

Minê avdaye hêsirê çavê xwe û te jî

Xwedê huba dilê min

Bavê dilê te jî<sup>111</sup>

### 2.2.2. Qadên Ku Dengbêjî Lê Tê Îcrakirin.

Di dengbêjiyê de bi qasî guhdaran mekan ji girîng e. Di serdema Mîrektiyan de qadên dengbêjiyê qesr û qonaxên mîr û began bûn. Piştî belavkirina mîrîtiyên kurdan mekanên dengbêjan jî guherî. Êdî mekanên dengbêjan li gundan malên dewlemendan, axayan an jî malên ku dawet lê dihate darxistin bûn. Ji bo ku dengbêj hunera xwe pêşkêş bikin odeyên herî mezin dihatin amadekirin û ev ode wek “dîwanxane” dihate binavkirin. Rêwîtiya dengbêjan qonax bi qonax bû. Çûyîna ji qonaxekê, bi ber ya din, an peyatî an jî li ser piştê hêstirê bû. Ev rêwîti nêzikî rojekê berdewam dikir. Dema ji qonaxekê biçûna qonaxêke din, heger cihê ku dê herin diyar be, mala ku lê bimînin jî

<sup>110</sup> Ahmet Aras, *Evdalê Zeynikê*, Weş, Deng, Stenbol, 1996, 42

<sup>111</sup> Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda*, c. II, weş. Naûka, Moskova, 1978, r.82

diyar e. Di nav van malan de bêhtir malên axa, hecî, xwendî, beg an jî mezinên gund terciha dengbêjan e. Dema çîrokê, kilamê û destanê şev e, demsal jî zivistan e. Ji ber ku havîn demsala xebatê ye û şevên havînê jî kin in. Kesek nebûye şahid ku dengbêjekî xwediyê kevneşopiyê, çîrok, kilam û destanên xwe bi roj vegotine.

Li aliyê din, ew dewrêşên ku me berê jî qal kiribû kirasên ji cawê spî li xwe dikirin, erbane li milê wan diçûn li nav gundan digeriyan. Van kesan bi erbanê re îlahî dixwendin, jiyana pêxember û peyrewên wî digotin, şerên ku pêxember beşdar bûye bi awayekî kilamkî digotin. Pesnê pêxember didan. Lê belê berevajî dengbêjan ev kes havînê digeriyan û piştî pêşkêşkirina hunera wan, gundiyan li gor derfetên xwe hinek diyariyên wek hirî, pez û qût didan wan.<sup>112</sup>

Êvarê piştî şîvê, zarok dixistin xewê. Bêdengî dihat dabîn kirin. Zilamên gund berê xwe didan mala ku dengbêj lê ye û bi kelecana li benda destpêkirina bernameya dengbêj disekinîn. Zilamên gund dizanibûn ku dengbêj dê wana bibe dinyayeke din. Dengbêj beşdarî civatên tevlihev nedibû. Ew vebêjê civakên amade û bi rêk û pêk bû. Divê cihê dengê xweser jî taybet bûya. Di nava bêdengiya civatê û dengê dengbêj de têkiliyeke efsûnî hebû. Navê van şevên ku her kes dihat cem hev, dengbêjan çîrok û kilam digotin, şevbihêrk bû. Di van şevbihêrkan de dengbêj li serê dîwanxaneyê dihate rûniştandin, balif didan paş piştî wî û dora wî. Bi vî awayî cihê dengbêj xweş dikirin û derfetên vegotina dengbêj amade dikirin. Vê rewşê dilê şagirtên dengbêjiyê germ dikir û ji bo ku rojekê zûtirîn bigihîjin cihê dengbêj hewl didan. Dengbêj Zekî vê rewşê wekî serboriyekê weha vedibêje: “ Ez diçûm dîwanxaneyê ku pala dengbêjan tije balif kirine, mînder dane binî, çay û qehwe dane ber wan. Min xweziya xwe bi wan dianî û min di dilê xwe de digot, Xwedê bê erê, ev derfet bikeve destê min ez dê şopa wan bajom. Da ku ez jî li ser vê mînderê rûnê û çay û qehwe bê ber min.”<sup>113</sup> rûmeta ku gel daye dengbêjan bi vê mînakê baştir diyar dibe.

Bi demê re dengbêj ji xeynî dîwanxaneyan li dawet û şahîyan de jî dest bi pêşkêşkirina hunera xwe dikin. Ev yek jî bi pirsgirêka aborî ya dengbêjan ve rasterast girêdayî ye. dengbêjan ji bo keda xwe ji gundiyan hinek xelat werdigirtin. Lê ev xelat ne pere bû. Wekî diyariyekê qût, pez û hwd. bû.<sup>114</sup> Dengbêjên ku di dîwanên giran de xwedî ciyekî girîng bûn êdî sazbandên dîlan û şahîyan e, ango ew kesên ku demekî

<sup>112</sup> Muhsin Kızılkaya, *Kayıp Divan*, Weş. İletişim, ç.3, İstanbul, 2001, 15-18.

<sup>113</sup> Serdar Öztürk, “ Hevpeyvîn: Dengbêj Zeki”, 29.05.2012, Mûş.

<sup>114</sup> Yusuf Uygur, *Kültürel Bellek ve Dengbejlik: Doğu Anadolu'daki “Dengbejlik” Geleneğinde Bellek Üretimi*, Mimar Sinan Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Sosyoloji Anabilim Dalı (Teza Lisans Bilind ya Çapnebûyî), İstanbul, 2009, r.31.

serboriyên mîr û serhewayên cengan dikirin weqayîname, êdî girîngiya xwe winda kirin û bêpiştekan man.<sup>115</sup>

### 2.2.3. Di Dengbêjiyê de Şêweyên Îcrakirinê

Piştî amadekariyên pêwîst, dengbêj berê xwe dide civata ku li dîwanxaneyê rûniştîye dipirsî: “Ez bi gotin bibêjim an bi meqam?” yê li dîwanxaneyê hemû dizanin ku dengbêj dê vê pirsê bipirse. Hemûyan bi hev re, “ka tu pêşiyê çîroka wê bibêje.” Dengbêj li ser vê yekê dest bi gotina çîrokê dike. Civat jî xwe ji bo destana bi meqamî amade dike. Çîrok zêde dirêj najo, ji ber ku ya girîng “deng” e. Dengbêj di kêliya heri girîng de çîrokê dibire û dest bi vegotina bi meqamî dike.<sup>116</sup> Bi meqam re dengbêj, bi rîtimeke diyar, rêzikên dirêj bi lez û bez li dû hev rêz dike. Rêzikên kin dirêj dike paşê kiteya berî ya dawiyê bi awayekî hunerî û bi derbdan (vurgu) dirêj dike. Kîteya dawîn jî bi awayekî sist û bê deng ji devê dengbêj dertê.<sup>117</sup>

Dengbêj dema ku kiteyên dirêj li dû hev rêz dikin, divê xwediyê henaseke(nefes) mezin bin û detone nebin, bi rojan bistrên jî divê dengê wan nekeve û tu giriftî çênebe. Ji bo vê yekê jî dengbêj du rebazan bi kar tînin. A yekemîn, destên xwe didin ber guhê xwe, tiliya wan tê ber cênîyê wan, kefika destê wan jî tê ber guhê wan. Ew kefik ji dengbêjan re dibe eko û peywira monîtorê dibîne. Ev yek jî rê li ber detonebûnê digire. Tiliya ku tê ber cênîyên wan jî nahêle ku dengbêj gotinan ji bîr bike.<sup>118</sup> Ya din jî “sewta serî” ye. Bi vê teknîkê dengbêj dengên xwe rihetir bi kar tînin û nahêlin dengê wan kêmbibe û bikeve. Bi vî awayî dengbêj bi salan dikarin hunera xwe berdewam bikin.

Kilam di valahiyê de nayên gotin. Dema ku dengbêjan kilamên xwe bê amûr digitin, hevbandorek di nav dengbêj û guhdervanan de pêk dihat. Reaksiyonên guhdaran dibe ku bandorek erênî lir ser dengbêjan bike<sup>119</sup>. Kesên li der û dora dengbêj hinek peyv, kîte û gotinên wek “sihet xweş”, “can can” û “hañññ” bi melodî dinewhirandin. Vê yekê ji dengbêj re derfeta behnvedanê dida. Li aliyê din rê dida ku dengbêj berdewama kilamê bîne bîra xwe. Guhdaran jî bi beşdarbûna çîrok û kilaman motîvasyona dengbêj zêde dikirin. Herdu alî jî pesnê hevûdin didan. Vê yekê jî kelecana dengbêj zêde dikir. Dengbêjê ku di serê çîrokê de bêalî bû, her ku di nav çîrokê de diçû dibû alîgirê qenciye. Guhdar jî beşdarî çîrokê dibûn. Xwe didan aliyê lehengê çîrokê bi wî re

<sup>115</sup> Alan, *Bendname*, r.269.

<sup>116</sup> Kızılkaya, *Kayıp Divan*, r. 55.

<sup>117</sup> Nikitin, *Kürtle*, r. 475.

<sup>118</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Sadık Kandil”, 29.05.2012, Mûş.

<sup>119</sup> Edward R. Haymes, *Sözlü Destan Sözlü Şiir Araştırmasına Bir Giriş*, wer. Ali Çelik, weş. Türk Dil Kurumu, Ankara, 2010, r.37

dijyan. Guhdar jî naxwazin bibin alîgirê kesên xerab. Lewma jî wexta ku kesekî xerab, xayîn, qirêj û bêbext tê kuştin, civat bi hev re naletê li wî kesî tîne. Bi vî rengî qencî û xerabî baş eşkere dibe, tixûbên ehlaqî diyar dibin. Êdî her kes kirinên xerab û baş ji hev diqetîne. Civak li ser norman li hev dike.<sup>120</sup>

Di dema vegotina çîrok û kilaman de xwediyê peyvê tenê dengbêj e û hemû guhdar jî mêvanên dengbêj in.<sup>121</sup> Xwediyê malê jî dî nav de kesek nikare têkilî dengbêj bibe. Dengbêj jî bi vî yekê dizane lewma jî heta ku jê tê xeletiyên nake. Lê belê her kes dizane ku heger xeletiyek li dijî dengbêj were kirin, dengbêj di bin vî yekê de namîne û ew dê kevirekî bavêje gûzika kesê ku xeletî kiriye.

Dengbêjî hunera xweşkirinê bû. Lewma jî her navekî rengdêrekî wî/ wê hebû. Heger qala şer bikirina, ji wî şerî diwartir şer; ji wî lehengî jêhatîtir leheng nîn bûn. Heger kilama evînê bigotina, ji wê jinê xweşiktir jin, ji wî mêrî qeşengtir mêr tune bûn. Mêr di şer de wekî Ristemê Zal in, di dadê de mîna Hz. Omer in. Di wêrekîyê de wekî Derwêşê Evdî ne. Heger li ser quretî û mezinatiyê be mîna Nemrûd û Firewînan in. Di gelacyê de wekî Bekoyê Ewan in.<sup>122</sup> Ava kaniyên di kilamê de mîna “ava zezemê” ye. Li çiya û baniyan xezal diçêrin, her cure fêkî tê dîtin. Bi kurtî dengbêj wisa dike ku guhdar her tiştî bê kêmanî xeyal bike. Di hişê guhdaran de mirovê “îdeal” nîşan dide.

### 2.2.3.1. Tradîsyona Serhedê

Serhed di dengbêjiyê de roleke girîng leyistiye. Di vî heremê de gelek dengbêj gihîştine û ev der bûye kaniya kilaman. Bi dîtîna me, ji ber ku li Serhedê zivistan salê heşt mehan didomîne û debara gelê heremê xwedîkirina sewalan e, dema vala zêde ye lewre xwedîkirina sewalan zivistanê pir demê nagire. Mirov di van demên vala de tîncem hev û bi çîrokan, bi kilaman bi hev re demeke xweş derbas dikin, ev yek jî dibe sedema zindîbûna dengbêjiyê.

Axa, beg û paşayên herema serhedê li gorî yê welatê jêr li dengbêjiyê bêtir xwedî derketine. Li ba wana dengbêj pir bi qedr û qîmet bûne, her yek ji wan dengbêjên wan ê taybet hebûye. Li Serhedê “dengbêj destûrdayî bûne” heger axa yan jî begekî bêxatîrî li dengbêjekî bikira, ew ji aliyê gel ve dihat rexnekirin. Dengbêj carina wek şêwirmend tevgeriyane rexne û şîretê xwe li piştekan xwe kirine. Ji ber vî rola girîng a dengbêjan axa, beg û paşayên Serhedê li dengbêjên baş geriyane û ew birine kirine

<sup>120</sup> Şerefxan Cizîrî, *Kultur û Edebiyata Devk*, weş. Nûdem, Stockholm, 1999, r. 32

<sup>121</sup> Benjamin, *Son Bakışta Aşk*, r. 92.

<sup>122</sup> Z. Zinar, “Sitranê Kurdî û Pêvajoya Wê ya Dîrokî”, *Nûdem*, j. 21, Stockholm, 1997 r. 42.

dengbêjên xwe. Bo nimûne wekî me berê jî gotibû dengbêjê Surmeli Memed Paşa berê Gula File, paşê jî Evdalê Zeynikê bûye, dengbêjê Kor Husên Paşa, berê Dengbêj Taha, Paşê jî Feqiyê Qizqapanê bûye.<sup>123</sup> Wana bi dengbêjên xwe pesnê xwe didan û serkeftina dengbêjên wan ji bo wan rûmeteke girîng bû.

Di dengbêjiya Serhedê de yê ku herî derketiye pêş Evdalê Zeynikê (1800-1913) ye. Wî hin di zaroktiya xwe de dest bi dengbêjiyê kiriye vê yekê jî di kilameke xwe de aniye zimana û dibêje: “xortekî çardeh sali bûm, dest bi dengbêjiye kir”.<sup>124</sup> Jiyana wî ji du merhaleyan pêk tê. Evdal ji salên 1850 heta 1865an dengbêjê serayê ye. Di vê demê de hem berhemên ku ji selefên wî ghiştibûn wî gotiye hem jî li ser evin, şer û buyerên cuda yê mîrê xwe kilam afirandiye ku yek ji van kilaamên wî qala şerê Xozandaxê dike. Di sala 1865an de li ser daxwaza Osmaniyên, Sürmeli Mehmet Paşa şervanên li herema Serhedê berhev dike û diçe li Edenê ji bo şikandina serhildana Xozandaxê şer dike.<sup>125</sup> Evdal jî tevli qefla ku diçe Xozandaxê dibe, lê beriya ku herin Xozandaxê Evdal, gazina dike û dibêje:

“Hezar mêrî nebe li Xozandaxê winda neke  
Perdê bûka li darveneke  
Me li welatê Serhedê rûreş neke”<sup>126</sup>

Piştî ku Sürmeli Mehmet Paşa û şervanên xwe beşdarê şer dibin him li qada şer him jî ji ber ku di riya vegera wan de bayê samê li wan radibe gelek kes dimrin û Mehmet paşa jî li cihekî bêhnvedanê bi êrîşa ziyakî jiyana xwe ji dest dide. Çavên Evdal jî ji ber bayê samê kor dibin.<sup>127</sup> Ev yek jî nîşan dide ku Evdal dengbêjekî pêşbînî û bi gazinê xwe mafdar e. Ji vir pê ve jiyaneke zor û zehmet li benda wî ye lewre piştî mirina Mehmet paşa bê piştekan dimîne, û ji ber ku çavên wî nabînin dema xwe bi qulingeke bask şikestî derbas dike. Her çiqas paşê çavên wî baş bûbin jî êdî Evdala kal dibe û ji diwan û şahiyên dûr dikeve. Ev jî merhaleyêke din a jiyana Evdal e.

Evdal ji aliyekî ve destanan bi meqam gotine ji aliyekî ve jî bi xwe kilam afirandine. Ji ber vê yekê ye ku dengbêjiya wî wek destpêka tradîsyona Serhedê tê pejirandin. Hemû dengbêjên Serhedê domdarê dengbêjiya Evdal in. Di sala 1966an de

<sup>123</sup> Ahmet Aras, “Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê”, *Bîr*, j. 7, Stenbol, 2007 r. 231-232.

<sup>124</sup> Ehmed Cengîz Çamlıbel, *Evdalê Zeynikê*, weş. Deng, İstanbul, 2005, r.15

<sup>125</sup> Mehmet Gültekin, *Zargotina Kurdên Serhedê*, weş. Avesta, İstanbul, 2013, r.27.

<sup>126</sup> Gültekin, *Zargotina Kurdên Serhedê*, r.47.

<sup>127</sup> Çamlıbel, *Evdalê Zeynikê*, r.15.

di nav Ahmed Aras û nebiyê Evdalê Zeynikê, Emerê Zeynikê de hevdîtinek pêk tê, di vê hevdîtînê de Emerê ku kalikê xwe dîtibû dibêje ku hemû dengbêjên Serhedê kêmezêde di stîla Evdal de kilam gotine. Lê Şeroyê Biro yê ku di Radyoya Rewanê de distrê ew hema hema wek kalikê min distre.<sup>128</sup> Piştî Evdal li Serhedê dengbêjê herî navdar Mistefayê Xelê Heyran e. Mistefa bi texmînî di navbera salên 1896-1898 de li gundê Qazîcelalê ya ku li ser Xorasanê ye ji dayik bûye û di serê salên 1950yê de jî çûye ser dilovaniya xwe. Kilamên ku li ser serhildana Berazan û Seyîdan niha tên gotin (neh-deh kilam) gelek ji vana yên wî ne. Mistefayê Xelê Heyran piştî serhildana Şêx Seîd kilamekî derdixê<sup>129</sup> û beşek ji kilamê wiha ye:

“ ...

Wey lêêê.. wey lê, wey lêêê  
 De bira şewqa Kela Xinûsê lê nexista  
 Li Bingolê ji xwe re çiya bi çiya lolooo  
 Bira neda bimbareka Qolhêsarê  
 Derê mizgefta û camiyan  
 Bi destê bavê şêx Xiyasedîn digirtin, kelepçe dikirin  
 Didan pêşiya cotê cendirmeyê singûliyan  
 Berî wî dane Enqerê-Horgofê  
 Nav hezar û pênsed mêrê di girtiya”<sup>130</sup>

Piştî Mistefayê Xelê Heyran jî di Serhedê de gelek dengbêjên baş derketine; wek Ferzê (1890?-1950), Reso (1902-1983), Şakiro (1936-1996), Huseyno (1936-2001), Lê agahiyên der barê Ferzê de gelek kêmin. Li gorî hin kesan Ferzê di dawetekê de bi xeletî hatiye kuştin û li gorî hinekan jî ev yek ne rast e. Dengbêj Reso di kilama xwe ya ku ji bo Ferzê gotiye de wiha dibêje:

“ ...

Şahê dengbêjan  
 Teyrê ser milê qîzan û bûkan wî  
 De bavê Mihemed Salih namekê didane destan  
 Digo li gundê Jevir dawet e  
 Kerem ke were kambaxa vê dawetê way way way”<sup>131</sup>

<sup>128</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Ahmet Aras”, 10.08.2012, İzmir.

<sup>129</sup> Ahmet Aras, “Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê”, *Bîr*, j.7, Stenbol, 2007 r. 234-235.

<sup>130</sup> Aras, “Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê”, 235-236

Dengbêjiya Serhedê helbet tenê ji van dengbêjên ku me li jor qala wan kir pêk nayê. Piştî wana dengbêjên wekî Zahiro, Salihê Beynatî, Sadîk, Kazoyê Garisya, Keremê Oqçiya, Evdirehmanê Patnosî, Dengbêj Kazo, Silhedin, Fexredin, Kesê, Gazin, Saide, Şemsa Çaço, Xosrofê Dengbêj, Cahîdo, Nergiza Hemê u hwd. Di nava vê tradîsyonê de cihê xwe girtine û hewl dane ku heta roja me vê tradîsyonê biparêzin.

Dengbêjên Serhedê dema ku kilaman dibêjin, li gor mijara kilamê dengê xwe nizim û bilind, dirêj û kurt, tund û nerm dikin. Dema ku gotina kilamê ne dirêj be wê gotinê dirêj dikin û dengê xwe dilerizînin. Bandora erdnîgariyê ya li ser deng wek rastiyeke zanistî tê pajirandin. Dengê kesên ji deştan bin, naziktir û nermtir e. Tîzbûna dengê wan zêde nîn e. Lê dengê çiyayîyan tîz û berz e. Ji ber ku îklîma herêma Serhedê jî tund e ev yek bandorê li ser şîrovekirina kilaman dike û dengbêjên vê herêma gotina bi lez û bez rêz dikin, bi dengekî tîz û tûj kilamên xwe dibêjin. Di Melodiyên Serhedê de mirov rastî rîtmên wek 5/8, 10/8 an jî 7/8 nayê. Zêdetir rîtmên wek 3/4 û 4/4 yên ku awayên bingehîn in tên bikaranîn. Binyada rîtmên melodiyan jî di bin bandora erdnîgariyê de dimîne.<sup>132</sup>

Li aliyê din wekî çiya û zozanên Serhedê îqlîma wê jî bûye mijara kilaman. Di kelkela havînê de mirov dikare belekiyên berfê li ser çiyên bibîne, ev yek her çiqas di demsala havînê de bandoreke erênî li ser jiyana mirovan kiribe jî di demsalên din de bûye sedema gazinan. Weki mînak:

“... ”

Lê lê dayê rebenê welatê me Serhedê ne tu war e

Ne havîn e, ne payîz e

Pêşî zivistan e ne bihar e”.

#### **2.2.4. Li Gorî Mijaran Kilamên Dengbêjiyê**

Kilam di nav jiyana kurdan de cihekî girîng digrin. Kurdan li ser gelek tiştan kilam gotine. Kurd dema xebitîne kilam gotine, dilê wan êşiyaye kilam gotine, çûne şer kilam gotine, hatine kuştin li ser wan kilam hatiye gotin, evîndar bûne kilam gotine.

---

<sup>131</sup> Kevirbirî, *Filîte Quto, 20 kilam&20 Qewîmîn*, r.145.

<sup>132</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Zelal Gökçe”, 15.10. 2012, Stenbol.

Di nav kilaman de gelek mijar hene. Ev yek jî di dabeşkirina cureyên kilaman de astengiyan derdixe pêşiya me. Digel vê yekê jî mirov dikare bi giştî qala hin cureyên kilaman bike ku M. Celadet Bedirxan di kovara Hawarê de cih dayêkê

#### 2.2.4.1. Lawje (Lawij, Lawik)

Lawje bi taybetî di nav Kurdên başûr û rojhelat de gelek belav e û bi eslê xwe gundewar e<sup>133</sup> Hewayên serbest in, rîtmeke wan a diyar tune ye. Dengbêj lawjeyan jî destanan jî distrên. Lê lawje li gorî çîrok û destanan kûrtir in. Binyada wan a melodîk xuya ye. Di navê de qalibekî melodyî, “dîsgotin” heye ku her tim digere. Lawje forma herî karakterîstîk a serbest a kurdan e û xwedî seyreke meqamî ya ku dadikeve ye. Lawjeyên ku şewaza xulxulandinê (vîbrasyon, lerizandina deng) tê de serdest e û wek pêlawazî têne gotin. Ji bilî beşên hawînî bi awayekî resîtatîf (bi awayê li ser hev gotinî) têne strîn. Li herêma Colemêrgê bi giştî di beşa ku jê re hawînî têne gotin de, tîpa dengdar a di dawîya hevokê de dikeve yan jî tîpên wekî ‘-e’, ‘-o’ lê têne zêdekirin û di vê beşa ku di pey beşa resîtatîf de tê, deng tê dirêjkirin. Hawînî bi giştî ew beşên bêhnvedanê ne, yên ku ji bo nefes stendî tên bikaranîn. Gotinên lawjeyan bi giştî li ser evînên ku pêk nehatine (neçûne serî) yan ji zêmarên ku li pey miriyekî tên gotin in.<sup>134</sup> Lê M. Celadet Bedirxan, her çiqas vê cureyê wekî muzîka olî ya ku hebûna wê di nav gel de gelek kêr e terîf kiribe jî, balê dikêşîne ser hin taybetî û navên lawijan û dibêje “Carna ji melodyyên xemgînî yên weke payîzokan re jî lavijok an laje têne gotin”.<sup>135</sup>

“... ”

Ay lê yardê...

Wey... lê yardê...

Dilê mi li yan e, lolo dilê mi li yan e.

Sed car dilê mi liyan e.

Serê dilê mi bi kul û derd û bi kovan e.

Gidî binê dilê mi bi dûman e”.

<sup>133</sup> Nureddin El-Salihi, “Kürdistan’da Müzik”, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, amd. Mehmet Bayrak, wer. Huri Tuşık Özkurt, c. I, weş. Özge, Ankara, 2002, r. 168

<sup>134</sup> Nezan Newzat Çelebi, Vedat Yıldırım, Aytekin G. Aktaş, “Geleneksel Kürt Müziğine Genel Bir Bakış” [http://www.bgst.org/muzik/yazilar/geleneksel\\_kurt\\_muzigi.asp](http://www.bgst.org/muzik/yazilar/geleneksel_kurt_muzigi.asp), 12 İlon 2012.

<sup>135</sup> Celadet Bedirxan, “Le Folklore Kurde”, *Hawar*, j. 3, amd. F. Ceweri, weş. Nûdem, Stockholm, r.11



#### 2.2.4.2. Lawikê Siwaran

Şer, koçberî û serpêhatiyên ku dî vê çerçoveyê de tîn vegotin, ev cure stran in. Ji ber ku di dîroka kurdan de şer her tim cihekî girîng girtiye, hejmara kilamên epîk(destanî) jî pir zêde ye. Di nav heremên deştî û çiyayî de ji aliyê muzîkê ve jî cudahi heye, mirov dikare vê cudahiyê di binavkirina kilaman de jî bibîne. Ev cureya kilama di nav gelê deştî de wekî “delal”, di nav gelê çiyayî de jî wekî “lawikê siwaran” tîn binavkirin.<sup>136</sup> Delal bi giştî bi tembûrê, carna jî bi pîpikê(duduk) tîn îcrakirin. Lawikê siwaran jî li gorî delal’an xwedî xeteye melodîk a bêpergal û rîtmêke zîndewartir e. Di destanên dirêj de binyada rîtmî û meqamî li gorî beşên çîrokê (beşên, dramatik, bi pevçûn hwd.) xwedî gelek cureyan e.<sup>137</sup> Di strandina kilamên epîk(destanî) de pêdivî bi berhêmdariyêke muzîkal û hafizayêke xurt heye. Ji xeynî viya guhdar dengê baş jî dixwazin. Divê deng zirav û zelal be. Ji ber vê yekê ye ku kilamên epîk (destanî, şer) ji aliyê kêr dengbêjan ve tîn strîn. Li hin herêman strîna kilamên dîlanê ji aliyê dengbêjên ku kilamên qehramaniyê dibêjin ve wek bêrumetî tîn pejrandin.<sup>138</sup>

Ji bo forma destanê “beyt” jî tîn gotin serpêhatiyên dirêj, menzûm û epîk in. Bi giştî li ser evînen mezin, şer, qehramaniyên eşîran ên li hemberî hêzên derveyî û bûyerên din in. Wek mînak em dikarin Keleha Dimdimê nîşan bidin..

Beşek ji keleha dimdimê

“... ”

Ha rabû, rabû rabû

Xan qralê kelê rabû

Derabê rawesta bû

Sîlah (li) bejnê ava bû

Xencer (li) bejnê duta bû

Çav (li) rênga bîrê mabû

Ha rabû, rabû rabû

Xan Mukîri(yê) kelê rabû

Derabê rawesta bû

Sîlah (li) bejnê duta bû

---

<sup>136</sup> H.g., r.11.

<sup>137</sup> Kendal Nezan, “Kürt Müziği”, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, amd. Mehmet Bayrak, wer. Necdet Hasgül, c. I, weş. Özge, Ankara, 2002, r. 54.

<sup>138</sup> Dieter Christensen, , “Kürtler’in Müziği”, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, amd. Mehmet Bayrak, wer. Huri Tuşık Özkurt, c. I, weş. Özge, Ankatra, 2002, r. 120.

Xencer (li) rênga bîrê mabû”<sup>139</sup>

Kilamên ku wek “berîte” tên binavkirin yên qehremaniyê û şer in. Naveroka van kilaman hemû pevçûnên navxweyî û yên derveyî ne. Melodiya wan heta ku bibêjî nerm û lîrîk in. Li gori Celadet Bedirxan berite, ji ali şagirtên medreseyan ve tên gotin u ji helbestên helbestanvên weke Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Melayê Batê, hwd. hatine afirandin. Şagirt dibin du komên ku ji du an sê kesan pêk tê û bi dorê disitirin.<sup>140</sup> Bo mînak:

“ ...

Hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo

Hey lo hey lo hey lo hey lo hey lo

Şemê dibê:

Filîto lawo dilê min dibê ye

Min ji te re nego neçe pêşiya karwanê Mamê Emê ye

Lawo vêga çavê jin û zarê wan li rê ne ew jî weka te mêrkuj in

Şawo karwanî şelê ne

Dibê dilê min dibê ye sed carî dilê min dibê ye

Filîte Quto bavê Hesên cewrê Şemê xwe daye ser taxê ye

Îro ji Mamê Emê Etmankî dixwaze qedar û baca rê ye”<sup>141</sup>

### 2.2.4.3. Heyranok

Stranên evînê ew in ku ji aliyê jin û mêran ve bi hev re ( di qorî) têne gotin. Gava ku di dema reqsê de têne gotin, ji aliyê jin û mêrekî ve, yan jî ji aliyê du komên ku dans dikin ve, li hemberî hev tên gotin. Komek gotinan dibêje, koma din jî dubare dike. Di gotin û melodiya van stranan de, cihekî mezin heye ji bo heycana giyanî. Ê her wisa di stranan de hestên bextewarî û hezkirinê pir xurt in. Stranên evînê gelek caran hunera teşbîh û pesnandinê bi kar tîne. Hezkirina ji bo însan û xwezayê mijarînen sereke ne. Melodiyên wan lîrîk in, ji ber ku strîna wan melodîk e; gotina wan hêsan e û xwedî rîtmeke guherbar in. Ligel hebûna awayên cihê, mirov dikare mînakên wan li hemû heremên ku kurd lê dijîn bibîne.

<sup>139</sup> Nûra Cewarî, “Ermenistan’da Kûrtler’in Halk Şarkıları Dalı ve Sistemi”, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, wer. A. Gernas, amd. Mehmet Bayrak, c. I, weş. Özge, Ankara, 2002, r. 325.

<sup>140</sup> Bedirxan, “Le Folklore Kurde”, r.11

<sup>141</sup> Salihê Kevîrbîrî, *Filîte Quto, 20 kilam&20Qewimîn*, weş. do, wer. Şerif Derince, Stenbol, 2009, r.66.

Li Pînyanîşiya Colemergê ku hevkarîya bi suryaniyan re heye, meqam cihê ne. Heyranok, cureyekî qewlêrk û naveroka wan bi giranî li ser evîna keç û xortan e. Eşîrên li heremê, havînan li zozanan zivistanan jî li gundan dijîn. Çûyina zozanan ji ber ku di heman demê de sedema şadbûnê ye, ev yek di stranan de tê honandin. Ev kêfxweşî û şadbûn zêdetir ji heyranokan re bûye mijar. Ji ber ku cihê xort û keç lê bigihîjin hev zozanên li çiyayên bêserûber in. Siya her zinarekî û binê her deviyekê cihê hevdîtîne bû. Gotinên heyranokan erotîk in û van gotinan tenê evîndar ji bo hev dibêjin, kesekî sêyem nikare lê guhdar bike û her wisa tomar bike. Mewamên heyranokan xwedî qarekerekî dengnizimbûnî ne qevastinên sêmend û çarmend di nav xwe de dihewînin.<sup>142</sup> Mînakek ji heyranokan li jêr e.

“... ”

Evînîkî ne çî kar e

Ne kirîn e ne frotin e.

Çî kesê derdê evîniyê mal xirap dîtî

Şevê nexweş e rojê birîndar e

Here kuro kurê bêjinê

Simbêl reşo bin difînê

Terka te nakim willah bilah

Ewê eşqê ji heta mirinê”<sup>143</sup>

#### 2.2.4.4. Pîrepayîzok

Payîzok, di guhdarkirina pêşîn de ji besteyên ku îlhama xwe ji pêjnên (hîsên) evîne girtinê pir cihêtir naxwiyên. Temayên ku têne bikaranîn; (evînen platonîk, veqetîn û hevdîtînen şevê) cureya ku ji axaftinên di navbera du evîndaren de derbas dibe ye. Di vê cureyê de tişta ku tonalîteya xwe dide xweza ye. Serê çiyar dûman girtiye, çemên ku bi barana pêşîn hilhatin har bûne. Çiyayên bilind berf girtine. Zivistan nêzik dibe; koçer konê xwe bar dikin û ji zozanan ber bi germiyanan ve diçin.<sup>144</sup> Vegeza ji zozanan bi xem e, ji ber ku him dema veqetîna evîndaran e him jî dema pêşwazîkirina payîzê û amadebûna ji bo zivistanê dirêj e. Ê payîzok jî vê rewşa giyanî li ber çavan radixe.

<sup>142</sup> Nezan Newzat Çelebi, Vedat Yıldırım, Aytekin G. Aktaş, “Geleneksel Kürt Müziğine Genel Bir Bakış” [http://www.bgst.org/muzik/yazilar/geleneksel\\_kurt\\_muzigi.asp](http://www.bgst.org/muzik/yazilar/geleneksel_kurt_muzigi.asp), 12 İlon 2012.

<sup>143</sup> Çavkanî Zelal Gökçe

<sup>144</sup> Thomas Bois, “Anonim Kürt Halk Edebiyatı”, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, amd. Mehmet Bayrak, c. I, wer. B. Peker, weş. Özge, Ankara, 2002 r. 495-496

Ango çawa ku heyranok coşa biharê ne, pîrepayîzok jî xemgîniya payîzê ne. Ji xwe payîz navê demsalê ye, payîzok jî navê stranên li ser payîzê ne. Li wan deran payîz demsala xemgîniyê ye, mirov ji vê demsalê hez nakin. Deriyê zivistanê dirêj e û peyambara asêmayina di gund de ya heft heşt mehan e. Meqamên pîrepayîzokan jî dişibe meqamê heyranokan, lê zêdetir lîrik û bi xem in. Her wisa heyranok bi halê xwe yê resen ê ku li zozanan tên gotin, ji aliyê du evîndaran ve li hemberî hev tê strîn, lê pîrepayîzok ji aliyê kesekî ve tê gotin. Beşek ji pîrepayîzokan li jêr e

“ ...

Dilikê Seydikê minê li ber felekê  
 Dilikê delalê minê evdalê Xwedê li ber felekê  
 Wele îro sê roje Seydikê min zava ye  
 Ey Xwedêyo wele hun ê bibin bajarê li bin xetê  
 Hey de rabe Seydiko seydvano  
 Dengbêjo, biçûko, tîfalo, bilûrvano  
 Şal û şepik wey bavo berf û zava birano. Hay hay haayî”<sup>145</sup>

#### 2.2.4.5. Dîlok (Stranên Dîlanê)

Ji stranên govendê re, yên ku di şahiyên cûr bi cûr de têne îcrakirin ‘dîlok’ tê gotin.<sup>146</sup> Melodiya wan li gorî figur û tevgerên lîstikê ne û him bi lîstikê him jî bi tenê tên gotin. Di dema şahiyê de kesek dibêje û kesekî din jî lê vedigerîne ango dubare dike. Gotinên wan bi giştî ji gelek bendan (qîte) pêk tên û di hemû bendan de gotin diguherin, lê melodî naguhere. Di dîlokan de behsa hemû cure bûyer û serpêhatiyan tê kirin. Melodiya stranekê di forma stranên dawetê de, ji benêde ku her tim tê dubarekirin pêk tê. Gotin, carinan heta 20-30 bendan dirêj dibe, lê muzîk naguhere. Çend kes gotina pêşîn dibêjin, çend kesên din ji kît/heceya dawîn a gotinê ji wan dewr digirin û heman gotinê dubare dikin. Piştî koma pêşîn dîsa jî wan dewr digire û gotina duyem dibêje û her wiha dewam dike. Di dema ku heman melkodî berdewam dike de, hin caran dikarin dest bi gotinên straneke din jî bikin. Melodiya tê strandin û rîtmê tê bikaranîn, girêdayî merhaleya reqşê ye. Di van lîstikan hemûyan de, gotinên stranan gelek girîng in. Ji ber ku gotin û rîtm, rasterast lîstikê diyar dikin.

<sup>145</sup> Çavkanî Zelal Gökçe

<sup>146</sup> Bedirxan, “Le Folklore Kurde”, r.11

“ ...

Hewşa me di hewşa we da  
Wey lûr, wey lûr, wey lûr  
Hewşa me di hewşa we da  
Her govendê, govendê

Derê hewşê di gulbê da  
Wey lûr, wey lûr, wey lûr  
Derê hewşê di gulbê da  
Her govendê, govendê”<sup>147</sup>

#### 2.2.4.6. Zêmar

Zêmar şêwazek hestî, zimanî, musikî û îfadekirina şêwazek civaki ye, di heman demê de piştgiriya lizêmtiyê ye û ji aliyê cîvakê jî ve hatiye dîktekirin. Zêmar ji feryeda jina ku nêzî yê mirî ye ve tê afirandin. Jin li pey ê ku miriye bi rojan digirîn û şînê dikin. Di şînan de xemgînî û pesindayina hêjahiya yê mirî bi rêya zêmaran tê bilêvkirin<sup>148</sup>. Piraniya zêmaran ji aliyê jinan ve hatine gotin. Mêrên kurd zêmar negotine yan pir kêma gotine. Dema ku dengbêj dibêjin jî bi navê jinekê, dayikekê dibêjin. Mêran zêmar negotine; ji ber ku di dema feodalîyê de diviyabû ku mêr negirîn. Zêmar ji ber vê yekê bûye barê ser milên jinan.<sup>149</sup>

Di salên 90î de li Mûşê qezayekê trafikê pêk hat û di encama vê bûyerê de 24 kes mirin. Cahîdê dengbêj diçe cihê bûyerê û di cih de kilamekê diavêje ser qezayê

“ ...

Lê lê dayê rebenê rabe ez bi kavlê  
Bûlanix û Mûşê diketime birawo li me hatiye payîz e  
Bira Xwedê neyne selqê dayê rebenê payîza rengîn e  
Keko welatê me Serhed e berfa welatê Serhedê bi ser me de dipûtine  
Mij û dûmana kavila Bûlanixê wisa bûye erd tije kiriye lawo  
Çavê mirov erdê nabîne ji mij û dûmanê  
Qebhetê şifêra tunîne ay”<sup>150</sup>

<sup>147</sup> Nûra Cewarî, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, r. 324.

<sup>148</sup> Zülfikar Kızıldemir, “Kürt Halk Şarkılarında Sosyal İletişim İşlevi”, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, amd. Mehmet Bayrak, c. I, weş. Özge, Ankara, 2002, r. 385

<sup>149</sup> Çiya Mazî, “Staranên Dengbêjan ên Zêmarî”, *Zend*, j. 6, Stenbol, 1999, r. 74

<sup>150</sup> Kevîrbîrî, *Fîlîte Quto*, 20 kilam&20 Qewimîn, r.66.

Xeynî van cureyan kilamên ku di dema xebatên rojane de tîn gotin hene û wek kilamên kar û xebatê tîne binavkirin. Li aliyê din ji bo ku zarokan di xew re bikin lorik tîn gotin. Lê van kilaman ji dengbêjan pirtir gel dibêje.

Dengbêjên kurd li himberî bûyerên ku li derveyî welat jî qewimîne bê deng nemane û li ser bûyerên li dervayî welat kilam gotine. Wek mînak di dema Padîşah Ebdulmecît de bajarê Selanîkê bi piştgiriya Rûsan dikeve destê Yewnanan, dengbêjan jî berteka gel, rewşa padîşah û paşayan weha bi lêv kirine:

“ ...

Îro bavo şerekê li me çêbû li selanîka

Şewitî bi rêyê, ca bi rê ye.

Keko qalekî li me qewimî

Li ser Selenika şewitî ha bi rê ye.

Ser bi Qeredax hûnan û Bulxara

Li alman û amerikan.

Eskerê Sirpê giran e”<sup>151</sup>

### 2.3. Dengbêjên Jin

Çand û saziya civakî ya pederşahî, hema bêje her carê bi mêran re ketiyee rojevê lê belê folklorê kurdan bi piranî li ser jinan e. Jin di avakirina gelek kilaman de rolên sereke leystine, wekî din jî bi xwe bûne vebêjerê gelek çirokan û kilam gotine.<sup>152</sup> Wekî mînak, Zîna di Memê Alan de, Xecê ya Siyabend û Xecê, Binevşa Narîn a di destana Binevşa Narin û Cembeliyê Kurê Mirê Hekariyan de jî bi qasi lehengên van destanan ên mêr çalak û bi bandor in. Ev rewş wekî serdestiya jinên kurd a di folklorê û jiyana civakî de hatiyê şîrovekirin.

Ji aliyê teorîkê ve tu sedemên pêkneanîna hunera jinê ya stranbejjiyê, dengbêjjiyê û çîrokbêjjiyê nîne. Lê di pratîkê de jinê, bi qasî mêran nebe jî, wek dengbêj di nav civakê de cihê xwe girtine û hunera xwe îcra kirine. Lê cihê jinan ê di nava çanda dengbêjjiyê de li gorî dem, dever û rewşa civakê diguhere. Civakê gelek caran derfeta dengbêjjiyê nedaye jinan. Wekî mînak hin qaîdeyên wekî, jin ji zilaman re kilaman nabêjin, ji bo gotinê divê ji mêrê xwe destûrê bistînin, pivanên sincî û olî;

<sup>151</sup> Şerê Duniyayê, <http://www.youtube.com/watch?v=wIhnPvZXGzw> 23.04.2012, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>152</sup> Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınlar, Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar*, wer. F. Adsay, S.Kılıç, E. Uşaklı weş. Avesta, İstanbul, 2005, r.260.

berpirsyariyên wekî dayikbûnê, kevaniya malê rê li ber pêkanîna hunera dengbêjiya jinê girtine. Lewma jî gelek jinan hunera xwe yan bi dizî pêk anîne, an jî dev ji hunera xwe berdane.<sup>153</sup> Li hêla din digel hemuû zehmetiyan hin dengbêjên jin hunera xwe îcra kirine. Dengbêj Gazin ku di vî wari de bi gelek pirsgirêkan re rû bi rû maye rewşa xwe wiha bi lêv dîke: “Dema ku em 12 salî bûn, min û qîza apê xwe kilam digot, wê demê dengê me biçûya bavê min an apê min, li me didan lê dema ku em biçûna çolê pincarê, me dengê xwe berdida û em serbest diqêriyan. Lê dema ku em li malê bûna me kilam bi dengekî nizm û bi dizî digot.”<sup>154</sup> Dîsa ji dengbêjên jin Dengbêj Saide ku li Wanê dijî pêvajoya dengbêjiya xwe wiha vedibêje: “Min di 15 saliya xwe de kilam digot, wê demê jî tenê di nav civata jinan de min kilam digot. Dema ku dengê min biçûya mêran malbata me, hişyar dikirin û digotin qîz û keçên we kilaman dibêjin. Li ser vê yekê me jî bi dizî kilam digot.”<sup>155</sup> Dengbêj Saide piştî ku dizewice mêrê wê nahêle ku kilaman bibêje heta 4 sal berê ku diçe mala dengbêjan a jinan a Wanê.

Dengbêjan, di nav kilaman de cih dane pirsgirêk û daxwazên jinan. Bandora zextên civakî ya li ser jinê, li gor dema xwe, bi kilamkî vegotine.<sup>156</sup> Wekî mînak di kilama Ahmedo Ronî de, em serhildana Besnayê, ku dixwazin bêyi dilê wê bidin yekî merivê wê, dibînin. Ew trajediya di kilama Lawikê Metînî de, ku keçik, berî ku bi keseki pîr û xerîb re, bê dilê wê bê zewicandin, dixwaze dengê xwe bigihîne evindarê xwe, ji diya xwe lava dîke, mirov gelekî hestiyar dîke.<sup>157</sup> Dîsa di destana Derwêş û Edûlê ku ji aliyê gelek dengbêjan ve hatiye gotin de, em serhildana jinê ya ku li dijî pergal û qaîdeyên olî û cudatîyên bawerî yê civakê li ber evîna wê dibe kelem, dibînin. Lewma ji hêmaya dengbêjiyê, bûye hêmayeke ku jinan hest û nêrinên xwe bi xurtî peşkêş kirine.

Di kevneşopiya dengbêjiyê de dengbêja jin a yekem, qasî ku di hişan de maye, Gulêya keça keşeyekî Îsewî ye. Gulê di serdema Osmaniyan de piştî nîveka sedsala XIXan dengbêjiya serokeşîr û rêveberê alayiyên Hamîdiye ku ji aliyê Sultan Ebdulhamîd ve hatine sazîkirin, Surmeli Mehmed Paşa kiriye.\* Dengbêjeke din a sedsala

<sup>153</sup> Katar, *Kürt Sözlü Kültüründe Kadın dengbêjler: Ayşe Şan ve Meryemxan*, Yakınođu Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, İletişim Anabilim Dalı, (Teza Lisansa Bilind ya Çapnebûyî), Kıbrıs, 2011, r.36

<sup>154</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Dengbêj Gazin”, 10.10.2012, Wan.

<sup>155</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Dengbêj Saide”, 11.10.2012, Wan.

<sup>156</sup> Nûra Cewarî, “Di folklorê de jin û jîyan”, *Tîroj*, j.20, 2006, r.15.

<sup>157</sup> Tekîn Çifçi, *Di Kilamên Evîni Yên Dengbêjan De Temaya Jinê*, (Teza Lisansa Bilind ya çapnebûyî) Zanîngeha Mardîn Artuklu, Enstituya Zimanê Zindî, 2013, r. 80.

\* Gelek çavkaniyan Gulê wekî dengbêja Sürmeli Mehmet Paşa daye nasandin lê Mehmet Gültekin di pirtûka xwe ya bi navê *Zargotina Kurdên Serhedê* de Gulê wekî dengbêja begê Xamûrê dide nasandin. Ji bo agahiyên berfirehtir, bnr. Mehmet Gültekin, *Zargotina Kurdên Serhedê*, r.56.

XIXan Pêro ye. Der barê Pêro de di çavkaniyan de kêr agahî hene lê qasî tê zanîn Pêro dengbêja Evla Begê Ebexê ye û çavên wê kor bûne ji ber vê yekê bi desmalê ruyê xwe girtiye.<sup>158</sup> Piştî belavbûna weşana Radyoyan, dengbêjên jin jî di Radyoyên Bexda û Rewanê de dest bi gotina kilaman kirine. Sûsîka Simo, Xana Zazê, Xuşkên Esmer û Nazar, Fatma Muhammed, Aslîka Qadir û Meryem Xan çend mînak in. Ji van jinan Sûsîka Simo (1910–1977) di 1948an de cara yekemîn derketiye ser dikê. Cara yekemîn jineke kurd li ser dikeke fermî, li Ermenistanê, kilam gotiye.<sup>159</sup> Dîsa Elmas Mihemed (1894-1974) Him dengbêjî kiriye û him jî di radyoya Bexdayê de bi kurdî bername pêşkêş kiriye.<sup>160</sup> Li vir em dê bi berfirehî qala jiyana du dengbêjên jin bikin ku bi deng û berhemên xwe di muzîka kurdî ya roja me de xwedî cihekî girîng in, yek ji vana Meryem Xan, a din jî Ayşe Şan e.

### 2.3.1. Meryem Xan (1904-1949)

Meryem Xan di sala 1904an de li gundê Dêrgûlê yê girêdayî Şîrnexê hatiyê dinyayê, di sala 1915an de mala xwe bar dikin diçin li Qamişloyê bi cih dibin û Meryem Xan li vir bi kureke mala Bedîrxaniyan re dizewice. Meryem Xana ku di 12 saliya xwe de li dawet û şahiyên dest bi dengbêjiyê dike, piştî zewacê ji dixwaze dengbêjiyê bike lê ew û malbata mêrê xwe li hev nakin. Piştî vê yekê Meryem Xan dibihîze ku şîrketên îngilîzan hatine Bexdayê li wir ji hunermendên kurd, ermenî û sûryani re kasetan (bandan, şîrdan) çêdikin. Ew jî biryar dide ku biçe Bexdayê û dengê xwe qeyd bike. Bi vê mebestê di sala 1921 de bi rê dikeve lê diçe li Zaxoyê bi salan li mala mamê xwe Mihemed (bavê Elmas Xan) dimîne û li vir qewraşîya Yusif Şemdin Axa dike. Di van salan de ji dengbêjiyê dûr dikeve. Paşê ji Zaxoyê diçe Mûsilê ji vir jî derbasî Bexdayê dibe û li mala dotmama xwe, Elmas Xanê (Elmas Mihemed) bi cih dibe. Li vê malê bi dengbêj û stranbêjên wekî Seîd Axayê Cizîrî, Hesenê Cizîrî, Resulê Gerdî hevnas dibe.<sup>161</sup> Di sala 1939an de beşdarî pêşbirka kilaman a Radyoya Bexdayê dibe û wekî yekemîn bi ser dikeve piştî vê serkeftinê dibe yek ji xebatkarên radyoyê yên bi kadro (daîmî). Meryem Xan dengbêja yekemîn e ku bi zaravayê kurmancî plak derxistiye. Meryem Xan di sala 1949an de li Bexdayê çûye ser dilovaniya xwe.<sup>162</sup>

<sup>158</sup> Gültekin, *Zargotina Kurdên Serhedê*, r.28.

<sup>159</sup> Elegez'ın Büyülü Kadın Dengbêjleri

[http://www.ozgurgundem.com/?haberID=15799&haberBaslik=Elegez%27in+b%C3%BCy%C3%BCl%C3%BC+kad%C4%B1n+dengb%C3%AAjleri&action=haber\\_detay&module=nuce](http://www.ozgurgundem.com/?haberID=15799&haberBaslik=Elegez%27in+b%C3%BCy%C3%BCl%C3%BC+kad%C4%B1n+dengb%C3%AAjleri&action=haber_detay&module=nuce) 17.09. 2012

<sup>160</sup> Öz, *Doğu ve Güneydoğu Anadolu Sözlü Kültüründe Hikâye Anlatıcılığı*, r.43.

<sup>161</sup> Antoljiya dengbêjan, Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, c.2, İstanbul, r.192.

<sup>162</sup> Katar, *Kürt Sözlü Kültüründe Kadın Dengbêjler: Ayşe Şan ve Meryemxan*, r.75



### 2.3.2. Ayşe Şan (1938-1996)

Di nav kevneşopiya çanda dengbêjiyê de navekî din ê girîng jî Ayşe Şan e. Ayşe Şan di sala 1938an de li Diyarbakirê (Amedê) hatiye dinyayê. Ayşe Şan heta 9 saliya xwe bi kilamên bavê xwe yê dengbêj mezin bûye, li Diyarbakirê, di civata jinan de bi gotina îlahî û mevlûdan dest bi dengbêjiyê kiriye. Paşê dengbêjî ji aliyê malbata wê ya oldar ve lê hatiya qedexekirin. Di encama vê qedexeyê de jiyana Ayşe Şanê hemû bi mişextiyê derbas bûye. Heta mirina wê ya di sala 1996an li îzmirê; li Entebê, Stenbolê, Almanya, Bexda û Hewlêrê jiyaye. Ayşe Şanê gava yekemîn a profesyonelîyê li Dîlok (Enteb) avêtiye. Paşê li Stenbolê nav û dengê xwe belav kiriye û bi hunermendê wekî Nazahat Bayran, Zekî Muren, Arif Sağ, Nuri Sesiguzel, Ali Ekber Çiçek û Orhan Gencebay re derketiye ser dikê. Albûma wê ya bi navê ‘Ez xezal im’ ku bi Tirkî-Kurdî derketiye, nav û dengê we di demeke kin de belav kiriye. Di vê serdemê de ji aliyê gelê kurd û tirk ve di beşa muzika gelerî ya tirk de wek ‘Hunermenda Salê’ hatiye hilibijartin lê belê ji ber ku bi kurdî straye xelata wê radestî wê nekirine<sup>163</sup>.

### 2.3.4. Di Muzîka Nûjen De Dengbêjî

Di cîhanê de her çand bi guherînê ve rû bi rû dimîne, ev yek ji bo çanda kurdan jî wisa ye. Piştî têkçûna begîtî û mîrîtiyên kurdan, qada îcrakirina dengbêjiyê teng bû û dengbêj bêweş man lê dîsa jî li dawet, malên serokê eşîran û rûspiyan gundan de bi gotina kilaman kevneşopiya dengbêjiyê di- domandin. Heta dawiya sedsala 20’an dengbêj di civaka kurdan de gelek li pêş bûn lê bi pêşketinên teknolojîk û koçberiya bi ber bajaran ve çanda dengbêjiyê jî guherandiye. Di serdema 1925-1960’an de rewşenbîr û hunermendên kurdên ku bi çanda metropolê ve hevnas dibin, ji ber astengiyên fermî nikarin bi zimanê zikmakî berhemana biafirînin, ji ber vê yekê jî hunermend û rewşenbîrên kurd neçar dimînin ku xwe bi berhemên tirki îfade bikin û bi wî awayî hêdî hêdî dev ji bikaranîna kurdî berdidin. Lê berevajî vê rewşê, kurdên ku derneketine derveyî erdnîgariya xwe di parastina ziman û folklorê kurdî de roleke girîng bi cih tînin.

Yek ji pêşketinên alavên ragihandinê yê teknolojîk jî radyo ye, lê radyoyên ku ji aliyê dewletê ve hatibûn avakirin tu pêdiviyên kurdan li ber çavan negirtibûn, ji ber vê yekê jî gelê Kurdîstanê bi gelemperî li radyoyên wek Rewan û Bexdayê guhdar dikir. Kilamên dengbêjiyê yê ku di Radyoya Rewanê de dihatin weşandin, ji aliyê dengbêjên

<sup>163</sup> Zeynep Yaş, Hilmi Akyol, *Ez Eyşe Şan im*, Enstîtuya Kelepûrê Kurdî, Duhok, 2009

heremên cuda ve dihatin guhdar kirin. Bi vî awayî dengbêjiya herêmên Serhed û Xerzan bandor li ser dengbêjên heremên dinê kirine. Ji ber vê yekê jî dengbêjan hewl dane ku dengê xwe bi rêya radyoyan bigihînin gel.

Makezagona 1960an ji bo demokrat û muzîkjenan qadeke ku bikaribin hêsan tevbigerin vedike. Di vê demê de li Radyoya Rewanê de kilamên dengbêjiyê tên aranjekirin. Ev yek bandorê li ser dengbêjên kurd dike û ew jî dikevin studyoyan, digel enstrumanan kilamên xwe dibêjin. Di sala 1965an de, li IMÇ ya ku navenda bazara muzîkê ya Stenbolê ye de cara yekem kilamên Eyşe Şan û Mehmud Qizil hatine weşandin.<sup>164</sup> Lê bi derbeya 80yî re rê li hewldanên çandî û hunerî tê girtin û kurdî bi awayekî fermî tê qedexekirin. Di salên 1980yan de gelek hunermendên kurd mecbûr man ku herin Ewropayê. Ev hunermend di bin bandora teknîkên muzîka Ewropayê de mane. Di nav van hunermendan de kesên wek Ciwan Haco, Şivan Perwer, Nîzametîn Ariç hebûn.

Di dawiya sedsala 20an de şerê ku li Kurdîstanê diqewimî bû sedema fikareyên ewlehiyê, bi valakirin û şewitandina gundan re gelê heremê neçar ma ku koçî metropolên mezin ên Ewropa, Tirkiye û Kurdistanê bibin. Ji ber vê yekê jî jiyan wan a kevneşopî bi çanda populer a metropolan ve rû bi rû dimîne û ev jî di jiyan wan de dibe sebebê serdemeke ku rewşa wî ne diyar e. Bi vî awayî şert û mercên ji nû ve afirandina folklor û jiyan civakî hêdî hêdî bi ber tunebûnê ve çûne. Wekî din êdî li gundan internet tê bikaranîn weşanên satelîtan tên temaşekirin. Ev yek jî qada jiyan dengbêjiyê ji holê radike. Li taxên bajarên mezin bi sedan kurd dicivin dîwanan datînin, kilaman dibêjin lê ev yek ji kevneşopiya dengbêjiyê dûr e.

Di salên 1990an de, di serdema Ozal de, astengiyên li ber zimanê kurdî hatin sistkirin bi vî awayî pêşiya pêvajoyeke nû hat vekirin û di vê pêvajoyê de gelek komele û saziyên çandî hatin avakirin. Di encama xebatên van saziyan de gelek berhem (kovar, pirtûk, albûm) derketin holê. Dîsa di bin banê saziyên çandî de komên muzîkê hatin avakirin. Lê van koman pirtirîn stranên nûjen û polîtîk digotin ango kevneşopiya dengbêjiyê hatibû piştguhkirin. Di vê navberê de bazara Unkapaniyê bi mebesta bazirganiyê dest avêtibû dengbêjiyê jî û dengbêj ji jiyan wan a mûtewazî diqetandin. Li cafe û qaşo di çalakiyên çandî de ew derdixistin ser dikê. Di nîveka salên 1990'î de hunermendên li Ewropayê dest bi lêkolînên muzîka kurdî ya kevneşopî kirin û hewl dan

---

<sup>164</sup> Vedat Yıldırım, "Metropolleşme ve Türkiye'deki Kürtlerin Müziği"  
<http://www.daplatform.com/news.php?nid=471>, 20.02.2012,

ku senteza muzika modern û kevneşopî bîafîrînî. Her wiha di vê pêvajoyê de girîngiya mîrasi dengbêjiyê derket holê.<sup>165</sup>

Dema em qala kurdên ku ketine pêvajoya bajarîbûnê dikin, muzîk li cihekî din disekine, dema ku em qala jiyanî kevneşopiyê dikin li cihekî din disekine. Wekî mînak, kilamên karan hene. Li nav erdan, li kolanê, li ber pez an jî li palehiyê tene gotî. Muzîk an jî bi giştî huner bi têkiliyêke şênber bi civakê ve girêdayî ye. Di ber kar de kilamgotin, bûye perçeyek ji wî karî. Muzîk û jiyan bi hev re di nava têkiliyêke çalak de ne. Dema ku mirov tê ser bajaran rewş diguhere. Pîsporî û takekesiyêke zêde, qutbûna têkiliyan ya ji civakê, qutbûna têkiliyên di navbera malbat û eşîran bi xwe re serxwebûnekê tîne. Ew guherîn di nav muzîka kurdî de jî xuya dibe.<sup>166</sup> Di serdema nûjen de gelek çand di nav hev de dijîn, şert û mercên jiyanê êdî cuda ne ango wek berê nîn in. Li metropolan mirov gelek cureyên muzîkê dibihîse û ev yek bi awayekî di bîra mirov de cih digire lewma jî tesîra xwe li ser hestên mirov dike û dema ku hunermend berhemên xwe diafirînin nikarin vê hîkariyê piştguh bikin.

Kilamên kurdî yê ku ber bi nîveka sedsala 20an berê xwe dane nûjeniyê, hîn baş li cihê xwe rûneniştine. Digel vê yekê jî hin xalên ku bi awayekî berbiçav derketine holê hene. Wekî mînak, cureyê muzîkê çî dibe bila bibe, bê amûr (enstrûman) nayê îcrakirin. Ji yekdengîbûnê ber bi pirdengîbûnê; ji yek amûrê ber bi pir amûrê ve guherînek pêk hatiye. Li şûna bêhna dirêj a terza klasik, bêhna kin û kilamên çalak cih girtine.

Wekî ku me berê jî gotibû êdî qada jiyanî dengbêjiyê nemaye ji ber ku dengbêj diçûn li gundan digeriyan û bûyerên ku diqewimîn bi rêya kilaman radigihandin deverên cuda. Lê bi pêşketina teknolojiyê ev yek jî têk çû. Di van salên dawî de gelek muzîkjenên kurd xebatên senteza modern û kevneşopiyê domandin. Kilamên dengbêjiyê ji nû ve şîrove kirin. Hin hunermendên wek Rojda û Delîl Dîlanar bi derfetên teknolojîk bi dengbêjên wek Şakiro û Huseyno re duet jî kirin. Lê dema ku kilamên dengbêjiyê ji nû ve tîrîvekirin divê li gor hin şeweyan ev yek pêk were. Hunermenda kurd Zelal Gokçe ya ku di repertuara xwe de cih dide kilamên dengbêjiyê li ser vê mijarê wiha dibêje:

---

<sup>165</sup> Nazan N. Çelebi, “Kürt Müziğinde Dengbêjlik”  
<http://www.daplatform.com/news.php?nid=12757&PHPSESSID=cb857d26a3d3003f09eb56001f5272b1>, 10.02. 2012.

<sup>166</sup> Mehmet Atli, “Daha Ne Kadar Geleneksel Birikimi Tuketecegiz”, *Tiroj*, j.4, İstanbul, 2004, r.22.

“Em nikarin wek dengbêjên berê bibêjin ji ber ku em ne dengbêj in, em tenê dikarin kilamên wan guhdar bikin şîroveya xwe lê zêde bikin. Lê dema ku mirov kilameke dengbêjî şîrove kir divê mirov rêçûna melodyê, ûslûb û nifşa qirikê biparêze ango dema ku bingeh bê parastin êdî hunermend dikare bi xwe hin tiştan li kilamê zêde bike. Ji bo vê jî divê kilama baş guhdarî bike da ku şîrove baş pêk were.”<sup>167</sup>

ji nû ve şîrovekîrîna kilaman û afirandina senteza muzîka nûjen û kevneşopî careke din dengbêjî anî rojevê her wiha dengbêjî bi nifşekî nû di nav gel de belav bû. Ji aliyê girseyên cuda ve hat guhdarkirin. Dîsa bi bandora vê yekê li gelek deveran malên dengbêjan hatin avakirin.

---

<sup>167</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Zelal Gökçe”, 15 Îlon 2012, Stenbol.

## BEŞA DUYEM

### 3. DENG BÊJ ŞAKIRO (1936-1996)

Her çiqas şert û mercên siyasî û zextên li ser zimanê kurdî li ber hin lêkolînan bûbe asteng jî, berhemên dengbêjan bi riya bîr û hin amûrên teknolojîk gihîştine roja me. Di vê serdema nû de ev berhemên dengbêjan ji bo muzîk, dîrok û berdewamiya dengbêjiya kurdî bûne çavkaniyên girîng. Şakiro jî yek ji wan dengbêjaye ku bi deng û kilamên xwe bûye barkêşekî girîng ê kevneşopiya dengbêjiyê. Şakiroyê ku nûnerê tradisyona dengbêjiya Serhedê ye, di nav kurdan de gelek bi nav û deng e. Di vê beşê de em dê hewl bidin ku li ser jiyana û kilamên wî hûr bibin.

#### 3.1. Jiyanê Şakiro

Şakiroyê kurê Bedîh ji eşîra Zîlan e. Di sala 1936an de li Eleşgirta Agiriyê hatiye dinyayê. Lê ji ber ku malbata wî gelek caran cih û warê xwe guherandiye piraniya dem û dewrana wî bi koçberiyê derbas bûye. Malbata Şakiro ji Eleşgirtê diçe gundê Cemalverdi yê Dûtaxê bi cih dibe û zaroktiya Şakiro li vî gundî derbas dibe. Di wan deman de li gundê Cemalverdiyê bi navê Bedîhê Kor (Bedîhê Hemîd) dengbêjekî bi nav û deng hebûye. Bedîh him şagirtê Evdalê Zeynikê, him jî dengbêjê Evdilmecît Begê (bavê Xalis Oztürk ê ku di serhildana Agiriyê de cih girtiye û serokê eşîra Sipkiya ye) bûye. Şakiro jî di temenekî biçûk de dibe şagirtê Bedîh û ji wî dengbêjiyê hîn dibe.<sup>168</sup>

Di salên 1950yî de malbat ji Cemalverdiyê koçî Qereyaziya Erzeromê dike û di wê demê de temenê Şakiro nêzikî 15-16 bûye. Piştî ku malbat li Qereyaziyê bi cih dibe Şakiro, di vê demê de dengbêjên Serhedê yê wek Reso û Ferzê yê bi nav û deng nas dike. Bi wana re di cimaetan de kilaman dibêje. Birayê Şakiro Saîd Denîz hevnasbûna Şakiro û Ferzê wiha tîne ziman: “Şakir di dawetekê de bi dengbêj Ferzê re kilaman dibêje. Lê Şakir nizane ku ew dengbêj Ferzê ye. Piştî Ferzê li Şakir guhdar dike jê re dibêje ez dengbêj Ferzê me heta niha tu kesî nikaribûye bi min re kilaman bibêje. Heger tu miqayetê xwe bî tu dê bibî dengbêjekî gelek baş”.<sup>169</sup>

Piştî ku Şakiro dengbêjên wek Ferzê û Reso nas dike di bin bandora wan de dimîne û ji xwe re terzekê ava dike. Bi vî awayî şakiro li Qereyaziyê dibe dengbêjekî bi nav û deng û êdî wî vedixwînin dawet û civatên giran. Ji ber vê yekê ye ku Şakiro wek

<sup>168</sup> Ahmet Aras, “Şahê Dengbêjan Şakiro Vefat Kir”, *Ronahi*, j. 58, 29 Hezîran-5 Tîrmeh 1996, r. 8.

<sup>169</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Said Deniz”, 9.08.2012, İzmir.

Şakirê Qereyaziyê tê naskirin. Xeynî vê wek “Şakirê Bedîh”, “Şahê dengbêjan” jî hatiye naskirin. Li hêla dinê ji ber xweşikbûna dengî wî û hostatiya wî ya di xulxulandinê de wek Kewê Rebat hatiye binavkirin. Kewê Rebat ew kew e ku nêr e û dema di nav refê xwe de qebeqebê dike, dengê wî bi ser ên dinê dikeve. Ew kewê ribat, weke ku ji bona rabirdû û dahatûya stran û kilamên kurdan de xwediyê dewlemendiyeke kûr û bihêz bû, di hunera kurdan a klasîk de jî berekî bingehîn ê nexşîn bû.<sup>170</sup>

Şakiro di jiyana xwe de neçûye xwendingehê lê di warê dengbêjiyê de perwedeyeke baş dîtiye. Weke ku me berê jî gotibû ji bo bikarnîna dengê rast û afirîneriyê, perwerde di dengbêjiyê de xaleke girîng e. Wek mînak kesên dengbêj ji bo ku nefesa xwe rast bi kar bînin, bi qamîşan (zilikan) pif kirine avê û ji bo ku peqok li ser avê qet neqedin bê navber pif kirine. Hewl dane ku fêrî pifkirina ji dev, stendina nefesê ya ji poz bibin.<sup>171</sup> Dema mirov li dengê Şakiro guhdar dike mirov dibîne ku dengê xwe gelek baş bi kar tîne. Mesela gava ku derdikeve dengê bilind (tîz) sewta serî bi kar tîne lewre dengên bilind heger bi qirikê bê derxistin dê ew deng şaş derkeve. Aranjor Alaaddin Aykoç ji bo perwerdeya dengê Şakiro wiha dibêje: “Weke ku Şakiro perwerdeya notayê dîtibe her tiştî bi awayekî rast datîne cih, dema mirov kilamekê bi note bike dê mirov weke ku Şakiro gotiye kilamê li notayê bike.”<sup>172</sup>

Şakiro li gorî derfetên dema xwe hewl daye ku xwe perwerde bike, bi vî awayî kilamên dengbêjên din bi şîrova xwe gotiye û bûye afirînerê gelek kilaman. Piraniya kilamên wî yên evîne ne, yek ji van kilaman ew e ku Şakiro li ser xwe û dildara xwe afirandiye. Di dema xortaniya xwe de, dilê wî dikeve keçeke cîranê wan. Navê qîzikê Esmêr bûye. Keçikê ji Şakiro re dixwazin; lê belê bavê keçikê wê nade, ji ber ku ew û bavê Şakiro neyarê hev in; keçikê didin yekî din. Şakiro jî dibe bengiyê vê keçikê<sup>173</sup> û hestên xwe di kilamê de wiha tîne ziman:

“... ”

Lê lê Esmêr heyra min ê te xêr nedî

Di kavlê gunda da ji te ji xwe ax lo ji wî dilî

Xwedê rebî bejna Esmêra Şukrî

Bînbaşiya qîzan û bûka

Fenanî rihanê di wargê Mala Ereba da

<sup>170</sup> Antoljiya dengbêjan, Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, c.1, İstanbul, r.28.

<sup>171</sup> Rahmi Batur, “Şakiro İlk Kez Stüdyoya Girdi”, *Özgür Yaşam*, j.4, 1995, r.56.

<sup>172</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Alaaddin Aykoç”, 20.09.2012, Stenbol

<sup>173</sup> Ahmet Aras, Ahmet Aras, “Şahê Dengbêjan Şakiro Vefat Kir”, *Ronahî*, r. 8.

Bi gulê û sosinê bi piltanê ra dew didît û lê dixemilî”

Piştî ku dildara Şakiro didin yekî dinê, ew diçe keçeke din re dizewice. Piştî vê zewacê çend sal bi şûn de li Kopa Mûşê bi jinekê re hevnas dibe û bi wê re jî dizewice. Di sala 1959an de bar dike diçe Edenêyê heft salan li vir dimîne.<sup>174</sup> Li Edenê carek din dizewice. Bi vî awayî Şakiro sê caran zewiciye û ji her jineke wî kurek hatiye dinê.

Şakiro piştî heft salan, di sala 1966an de, ji Edenê mala xwe bar dike diçe du salan li Muşê dimîne û ji wê derê jî diçe Qereyaziyê bicih dibe. Di ala 1988an de vê carê berê xwe dide bajarê Îzmîrê, êdî ev bajar ji bo dengbêjê me rawestgeha dawîn e, heta dawiya emrê xwe li vî bajarî jiyaye. Li îzmîrê, di dawet û civatên mezin de dengbêjiya xwe didomîne lê xweziya xwe bi rojên berê yê dengbêjiyê tîne. Ji ber ku civak zêde qîmet nadin dengbêjan Şakiro gazinên xwe dike ku çima kurd xwedî li dengbêjên xwe dernakevin. Gelek kesên wek rojnameger û lêkolîner xwestine ku bi Şakiro re hevpeyvînê bikin; lê wî ev yek qebûl nekiriye û sedema vê yekê jî, ji Rojnameger Rahmi Batur ê ku xwestiyê pê re hevpeyvînê bike re vegotiye. Salihê Kevirbirî vê diyalogê ji Batur wiha neqil dike: “Ez ji kurdan dilşikestî me. Kurd, li dengbêjên xwe xwedî dernakevin. Ka dêhn û bala xwe bide tirkan Aşiq Weyselekî wan hebû ew çawa xwedî li wî derketin lê Resoyekî me habû, hostayê me tevan, birçî mir. Ka bêje ez ê çawa bi te re mijûl bibim û dilê xwe ji te re vekim?”<sup>175</sup> Birayê wî Said Deniz jî di vî warî de gazinê xwe dike û dibaje: “Hunermendek dema derdikeve ser dikê bi milyaran pere distine lê gelê me li dengbêjên xwe xwedî dernakeve. Hin camêr dihatin teybê xwe vedikirin ji bo dengê Şakiro tomar bikin, ên din jî li ber penceran bi dizî dengê wî tomar dikirin.” Ji ber van gilî û gazinan Şakiro daxwaza hevpeyvînê ya lêkolîner û rojnamegeran qebûl nakiriye. Lewma jî der barê Şakiro de agahiyên nivîskî gelek kê m in.

Şakiro di 40 saliya xwe de ji gurcîkên xwe nexweş dikeve bi salan li Stenbol, Enqere, Almaniyayê li ser bijîşkî digere, lê her diçe rewşa tenduristîya wî xera dibe û mixabin di sala 1996’an de ji nexweşîna pençêşêrê li Îzmîrê jiyana xwe ji dest dide. Û li Goristana Îzmîrê ya “Çamli Kule”yê tê definkirin.

Li ser gora wî wiha hatiye nivîsandin:

Kurê Bedîh Axa

Şaîrê Rojhilat

<sup>174</sup> Antoljiya dengbêjan, Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, r.380.

<sup>175</sup> Salihê Kevirbirî, “Kewê Ribat û Şahê Dengbêjan: Şakiro”, *Gulistan*, j. 4, İstanbul, 2002, r.43.

Şakir Deniz

Ji ruhê wî re el-Fatîhe

Rojbûyîna wî: 1936

Wefata wî: 1996

Şakiro yê ku bi dengbêjên Serhedê yê wek Reso, Ferzê re kilam gotiye ji aliyê dengbêjên domdarên vê kevneşopiyê û yê din ve hatiye bibîranîn. Çawa ku piştî mirina Ferzê, Reso ji bo wî kilamek afirandiye, Şakiro jî piştî mirina Reso li ser wî kilamek afirandiye. Dengbêj Ebdurehîmê Mûşî jî yek ji wan dengbêjan e ku ji bo bîranîna Şakiro helbestek nivîsiye. Bi vî awayî qedrê hev girtine. Beşek ji helbestê ev e:

“Şakiro mîr e mîrê dengbêja  
Pispor û zanayê destanbêja  
Helandiye hemû stranbêja  
Bû sebr û arama hêstir rêja”<sup>176</sup>

### 3.1.1. Nav û Dengê Şakiro

Şakiro piştî ku bi nav û deng dibe, bi rêya dawet û civatan dever bi dever digere. Nav û dengê wî gund bi gund belav dibe. Li kîjan deverê dawetek hebe yan jî civatek hebe dişînin pey wî û vedixwînin dawet û civatan. Biraywê wî Seîd dibêje “carina hin kesan dema diçûn ji kurê xwe re qîz dixwest, bavê qîzîkê digot heger Şakiro neyê ez qîza xwe nadim.” Şakiro bi vî awayî di nav gel de navdar dibe. Dema ku teyb derdikevin kesên ku dixwazin bi rêya dengê Şakiro pere qezenç bikin, ji bajarên dûr dihatin li pey wî digeriyan da ku dengê wî tomar bikin. Lê ji ber ku Şakiro gelek digeriya, yê ku dixwestin dengê wî tomar bikin bi rojan li benda wî disekinîn. Birayê Şakiro, Tevfîk Deniz tomakirina dengê Şakiro yê care yekem ji Süleyman Öz re wiha vegotiye:

“Rojekê kurê Niyazî Agit ê dewlemend, Xiyasetin, li Edenê ez û birayê min Şakir vexwendin otelekê û got karê min bi we heye. Li otêlê ji cewdikê xwe tiştek derxist, dirûvê radyoyê didayê lê radiyo nebû. Paşê mîkrofên li vî tiştî xist û dirêjî kekê Şakir kir û jê xwest ku kilamekê bibêje. Kekê Şakir pirsî “evçi ye?” got teyb e û merîfetê wê gilî kir. Paşê band bi kekê Şakir da tijîkirin û bi perê wê demê 500 lîre da wî. Piştî ku hejmara teyban zêde bû dengê kekê Şakir wek zêrê reşat bi rûmet bû. Bi

<sup>176</sup> Dengbêj Ebdurehîmê Mûşî “Antolojî ya Dengbêj Şakiro”  
[http://www.ufkumuz.net/3685\\_ANTOLOJICirc-YA-DENGBECircJ-SAKIRO-.html](http://www.ufkumuz.net/3685_ANTOLOJICirc-YA-DENGBECircJ-SAKIRO-.html) 20.04. 2013



şevan bi dehan kesan li kekê Şakir dipirsî, di serî de bazirganên sewalan ên Rojhilat li otêlan, pasajan û li malan rûdiniştin û li kekê min Şakir guhdar dikirin. Di vê navberê de yên ku bi teybên xwe dihatin, dengê kekê min Şakir tomar dikirin. Êdî me serê kekê Şakir nedidît.”<sup>177</sup>

Ev dengbêjê me her çiqas weke dengbêjekî Serhedê navdar bûbe jî, li heremên din ên Kurdistanê jî gelek hatiye hezkirin. Bi taybetî li Amedê û derdora wê ya ku ji aliyê Serhediyên ve wek welatê jêrê tê binavkirin, rastî eleqeyeke mezin hatiye. Seid Denîz vê eleqeyê bi serpehatiyeye xwe û Şakiro ji me re wiha bilêv dike:

“Xelkê Diyarbekirê ji Şakiro gelek hez dikir. Rojekê ez bi kekê Şakir re çûm Diyarbekirê, di odeyeye mezin de cih tune bû ku millet rûnişt, heta sibê millet li ser piya ma. Weke serokwezirek hatibe wê derê, li dora wî civiyabûn, gelek erebe rêz bûbûn. Ez aciz bûm, min jê re got ez li ber xwe nadim, ez dê herim. Wî ji min re got: “Nere lê careke din bi min re neyê, em herin ku derê halê me ev e.”<sup>178</sup>

Şakiro çawa ku li Bakur tê nasîn, her wisa ew, li her sê parçayên din ên Kurdistanê û li hin welatên Qafqasyayê jî tê nasîn û li wan deran xweyê nav û deng e. Dengbêjiya wî di nav hemû kurdên stranperwer de tiryakîtiyek pêk aniye, û ji ber vê yekê ye ku ew di dilê hin dengbêjan de wekî Şairê dinyayê ye.<sup>179</sup> Rojnameger û nivîskar Salihê Kevirbirî ye ku di sala 2001’ê de li Macarîstanê, di fonda muzîkê ya restorantekê de dibe şahidê deng û awaza Şakiro, peywendiya kurdên Rojhilat a li hember Şakiro, ji rojnamegerê Rojhilatî, Îkram Balekanî wiha neqil dike:

“Li tevahiya bajar û gundên kurdên Îranê, kasetên Şakiro hene. Ez bixwe bi Şakiro re mezin bûm. Ew ji bo gelê me ye Rojhilatê Kewê Ribat” bû. Dengê wî wekî dengê “Kewê Nêr” bû. Her çiqas dengbêjê bi nav û deng “Xalê Birê” ango Birahîmê Newrozî li Urmiyeyê dijiya, dîsa jî wekî Şakirê rehmetî nedihat hezkirin. Bi kurtasî ew ji bo birîna keç û xortên evîndar derman; ji bo kal, pîr û navsereyan jî efsane bû”<sup>180</sup>

<sup>177</sup> Öz, *Doğu ve Güneydoğu Anadolu Sözlü Kültüründe Hikaye Anlatıcılığı*, r.37.

<sup>178</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Said Deniz”, 9.08.2012, İzmir.

<sup>179</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Dengbêj Silhedin”, 29.05.2012, Mûş

<sup>180</sup> Salihê Kevirbirî, “Kewê Ribat û Şahê Dengbêjan: Şakiro”, *Gulistan*, r.44

Şakiro bi kilamên wek “Gulê Dêran”, “Şerê Mala Nasir”, “Eliyê Purto”, “Nêçîrvano”, “Geliyê Zîlan”, “Esmer”, “Sebrê” û “Wey Dil” navdar e.<sup>181</sup> Lê ev nayê wê wateyê ku afirînerê tevahiya van kilaman ew e. Wek mînak Evdilkirim Guner dibêje ku kilama “Nêçîrvano” ya bavê wî Reso ye.

### 3.1.2. Şakiro Şagirtê Reso ye Yan Na?

Dengbêjiya Serhedê ya ku Evdalê Zeynikê nûnerê wê yê sereke ye, bandora xwe li dengbêjiya heremên din jî kiriye, gelek dengbêjên heremên din jî ji dengbêjiya Serhedê sûd wergirtine. Li hêla din domdarên vê kevneşopiyê ji kilam û tecrûbeyên dengbêjên beriya xwe sûd wergirtine û dengbêjiya xwe bi vî awayî domandine. Dengbêj Reso û Şakiro jî domdarên kevneşopiyê dengbêjiya Serhedê yên girîng in. Lê Reso ji ber ku bi temenê xwe ji Şakiro mezintir e û beriya wî dest bi dengbêjiyê kiriye, li gor Şakiro tecrûbe û zanîna wî ya dengbêjiyê zêdetir bûye. Şakiro jî ev yek qebûl kiriye û ji lêkolîner Ahmet Aras re wiha gotiye: “Piştî ku min Ferzê û Reso nas kir, min terzê xwe guhert, Reso ji min zêdetir e, min ji wî gelek îstîfade kiriye.”<sup>182</sup>

Dema mirov li ser kilamên Şakiro hûr dibe tesîra Reso ya li ser dengbêjiya Şakiro bi awayekî aşkere tê dîtin; lewre Şakiro gelek kilamên ku ji aliyê Reso ve hatine gotin an jî hatine afirandin bi terzê xwe gotiye. Hin ji wan kilaman ev in: “Têlî” “Nêçîrvano” “Reben im” “Lo Mîro” “Axao” “Nemînim” û hwd. Dengbêj Zahiro yê ku domdarê dengbêjiya Serhedê ye vê yekê wiha dinirxîne: “Ez dikarim bibêjim ku Şakiro şagirtê Reso bû, lewre gelek kilamên Reso gotiye. Li hêla dinê Şakiro bi xwe kilam afirandine ji ber vê yekê jî dengbêjekî serbixwe ye.”<sup>183</sup>

Her çiqas Şakiro li ba Reso wek şagirtê perwerde nedîtibe û bi mehan pê re negeriyabe jî, di gelek civatan de bi hev re kilam gotine. Lê di nav her du dengbêjan de, hurmeteke gelek zêde hebûye. Însanek li ew qas cih bigere û di diwanên mezinan de rabe û rûnê, dibe xwedanê perwedeyê taybet. Şakiro jî yek ji wan kesan e ku bê destûra Reso di cimaetan de kilam negotiye.<sup>184</sup> Ev yek jî di kevneşopiyê dengbêjiyê de (bi taybetî di têkiliya hosta û dengbêj de) xaleke girîng e.

Weke ku me berê jî anî ziman Şakiro li ba Reso perwerde nebûye lê Şakiro hostatiya Reso ya di warê dengbêjiyê de pejirandiye û her tim jê re rêz girtiye. Şakiro

<sup>181</sup> Antoljiya dengbêjan, Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, c.1, r.28.

<sup>182</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Ahmet Aras”, 10.08.2012, İzmir.

<sup>183</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Dengbêj Zahiro”, 5.05.2013, Amed.

<sup>184</sup> Mahmut Beğik “Şakiro (1936- 1996)” <http://www.kovarabir.com/tag/dengbej/> 13.11.2012

piştî ku Reso diçe ser dilovaniya xwe, ji bo bîranîna wî kilamekê diafirîne û hestên xwe wiha bi lêv dike:

“... ”

Hey lo bira way

Lo bira oy oy oy bira oy oy oy

Lolo bira qeder yazîke illahî ye

Herçiya Rebî li jor binivîse mirovê tim û tim caran li jêr bibîne

Felekê mala te xirab be, min ji te ra negot fena te nîn e

Bavê Evdilkêrîm, şahê dengbêjan, kewê gozel û gokerçîn e

Hela bala xwe bidê gelek dost ehbaba nedîne

Her kes dîxwaze tim û tim caran bi çavê serê xwe bibîne Rebiyo wayê wayê...”

“... ”

Minê dêhna xwe dayê ambulansakê dewletê jêla tê ye

Eze ê çûme pêşiyê min ê bala xwe berdayê Sadiq li pêşiyê rûniştiye

Min go berxo çi bû çi qewimî, go apo tu nizanî va cinyaza bexê Mala Welo ye.

Qasekî li pişt ambulansê bifetile derî veke dêhna xwe bidê,

Girêdana timtêla birayê xwe Reso ye way ax ay”..<sup>185</sup>

### 3.1.2.1. Dengbêj Reso (1902-1983)

Me berê jî gotibû Dengbêj Reso him bi hostatiya xwe him jî bi afirîneriya xwe, di jiyana Şakiro ya dengbêjiyê de xweyê roleke giring e. Ji ber vê yekê em dê hinek li ser jiyana Reso yê ku ji aliyê gelek kesan ve wek hostayê Şakiro tê ditîn rawestin.

Reso di sala 1902'yan de li Îdirê hatiye dinê.\* Malbata Reso ji Rewanê hatiyê Îdirê. Piştî Şerê Cihanê yê Yekemîn Reso û êla xwe bar kirine û hatine li gundê Gopala yê ku girêdayî navçeya Erzirom Qereyaziyê ye bicih bûne.<sup>186</sup> Lê beriya ku herin Gopala, çend salan, bi mebesta derketina zozanan diçin li gundê Celalê yê ku girêdayî navçeya Qersê Dîgorê dimînin. Dema ku dengbêj Reso tê Gopala temenê wî 17-18 sal bûye, ji ber ku demeke dûr û dirêj li gundê Gopala dijî û bi dengbêjiya xwe li vir navdar dibe, wek Resoyê Gopala jî tê naskirin.

Reso di zaroktiya xwe de dest bi kilambêjiyê kiriye, vê yekê bala apê wî Evdo kişandiye. Rojekê li Îdirê Gula File di civatê de runiştîye kilaman dibêje, ew roj

<sup>185</sup> Hey Lo Bira, Mp3, (Deşîfrekirin: Serdar Öztürk)

\* Der barê dîroka bûyina wî de gelek agahiyên cuda hene, ji ber vê yekê jî me, agahiya ku kurê Reso Evdilkêrîm Güner ê 66 salî da me esas girt.

<sup>186</sup> Ahmed Aras, Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê, Bîr, j. 7, 2007 İstanbul, r. 241

Dengbêj Reso jî diçe wê civatê, apê Reso ji Gulê re dibêje: “Hela li vî kurikî guhdar bike çawa dibêje.” Gulê, Reso dibe li kêleka xwe dide rûniştandin û Reso jê re kilamekê duduyan dibêje. Gulêya ku wê demê bi temenê xwe nêzikî 80 salî ye dibêje: “Bes be belqitiyo te perda guhe min qetand.” Paşê Gulê ji apê wî yê Evdo re dibêje li Reso miqate bin dê dengbêjekî baş ji wî derkeve.<sup>187</sup>

Reso her çiqas di piçûktiyê de dest bi strînê kiribe jî, navê wî piştî ku ji leşkeriyê vedigere di nav gel de belav dibe. Reso dema ku diçe leşkeriyê zewicandî û 32 salî bûye Di wan deman de nasnameya wî û du birayên wî tune bûye ango di nifûsê de nehatine tomarkirin. Ji ber vê yekê hin kes li wana gilî dikin û hêzên dewletê wan digirin dibin leşkeriyê û çar salan leşkeriyê dike. Reso di leşkeriyê de jî dengbêjiya xwe didomîne, carna di nobetan de carna jî di nav hevalên xwe de rûdinê û kilamên xwe dibêje lê ji ber vê kiriyara xwe bi hin zextina re rû bi rû dimîne. Lê digel van zextan Reso dest ji dengbêjiya xwe bernade û kilamên xwe dibêje. Der barê van zextan û evîna wî ya dengbêjiyê de kurê wî Evdilkerim serpêhatiyên bavê xwe wiha vedibêje:

“Dema Reso li leşkeriyê de kilaman dibêje lê dema fermandarê wî dibîne ku bavê min bi kurdî kilaman dibêje lêdixe. Û jê re dibêje gerek tu kilaman nebêjî. Ev yek gelek caran dubare dibe û fermandarê wî heman tiştî dike. Bavê min li hemberî vê yekê bêdeng dimîne lê dest ji gotina kilaman bernade. Dîsa rojekê bavê min û hevalên xwe li hev dicivin û bavê min ji wan re kilaman dibêje, heman fermandar tê wî dide ber sîleyan. Li ser vê yekê bavê min bertekê nîşan dide û dibêje “fermandarê min tu çi bikî jî ez nikarim dest ji gotina kilaman berdim, vê yekê di nav giyana min de cih girtiye ez çi jî bikim nikarim bibim asteng. Ancax tu çekê bera mîn bidî min bikujî wê demê tu dikarî ji min xelas bibî.” Li ser vê yekê fermandar êdî têkilî wî nabe. Piştî vê bûyerê roja yekşemê roja nobetgirtina heman fermandarî bûye. Fermandar bala xwe didê ku bavê min di nav hevalan de rûniştîye qîrîna wî ye kilaman dibêje. Fermandar tê cem bavê min û jê dipirse dibêje: “Tu zanî bi tirkî jî bibêjî “bavê min bersivê dide dibêje belê ez dizanim. Fermandar daxwaza kilameke tirkî ji bavê min dike û bavê min jê re kilama “Mehmed Çavûş” a ku bi “uzun havakî” tê gotin dibêje. Paşê fermandar daxwaza kilameke kurdî jê dike. Dema bavê min bi kurdî dibêje fermandar di bin bandora dengê wî de dimîne û dibêje: “Ez bi kurdî fem nakim lê dengê wî tesîreke mezin li min dike, dengê ecêb e.” Fermandar ji bavê min re dibêje ji îro pê ve tu serbest î.<sup>188</sup>

<sup>187</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Ahmet Aras”, 10.08.2012, İzmir.

<sup>188</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Abdulkemil Guner”, 17.03.2013, Mûş.

Dengbêj Reso piştî ku ji leşkeriyê tê di dawet û cîmaetan de kilaman dibêje di karê malê de naxebite ji ber vê yekê bavê wî lê hêrs dibe û wî cihê dike. Li ser vê yekê Reso bar dike diçe gundê Kopê Xêrgîsê û li wê derê dibe şivan lê ji ber ku gundî jê hez dikin nahêlên ku Reso her tim şivaniyê bike. Gundî ji berdêla wî ve pez dibin diçêrîn. Reso weke her dengbêjî li gelek cih û wara geriyaye. Ji xeynî gundê Xêrgîsê li gundên wek Piyong, Qereaxilê maye û salên dawîya emrê xwe li gundê Pagê ya ku girêdayî navenda Muşê ye derbas kiriye.<sup>189</sup>

Dengbêj Reso jî yek ji wan dengbêjên girîng ê kevneşopiya dengbêjiya Serhedê ye. Ji ber vê yekê jî, bi dengbêjên dinê yê wê kevneşopiyê re di nav têkiliyekê de bûye. Di bin bandora Dengbêj Ferzê yê ku yek ji nûnerê wê kevneşopiyê ye de maye. Motîfên jiyan, bawerî û lehengiyên kurdan ên di kilamên Ferzê de bala Reso dikişîne û dibe heyranê wî.<sup>190</sup> Reso jî heman motîfan bi hunera xwe di kilamên xwe de dinexşîne û her çiqas kilamên evîndariyê yê wê wek “Têlî” ( li ser evîna destbirayê xwe dibêje) afirandibe jî ew bi kilamên mîrxasiyê tê nasîn. Kilamên mîraniyê yê wê wek “Wey lo”, “Reben im”, “Lo mîro”, “Axao hey li min” “Nemînim” ên wî ne.<sup>191</sup>

Carinan dengbêjên kurd ji derdan re bûne derman û şifa belav kirine. Guhdarên ku derdê wan hebûne li dengbêjan geriyane û derdê xwe ji wan re gilî kirine.<sup>192</sup> Reso jî yek ji wan dengbêjan e ku derdê guhderên xwe guhdar kiriye û bi kilamên xwe teselî daye wana. Zavê Reso Zekî Badikanli serpêhatiyê xezûrê xwe ya di vî warê de wiha vedibêje:

“Şêx Badîn ji Gimgimê ye him axa ye him jî şêx e. Kurekî wî di xortaniya xwe de wefat dike, Şêx Badîn li pey kurê xwe bi şev û bi rojan digirî li ser vê yekê ji şêx re behsa dengbêj Reso dikin û dibêjin ku Reso pir xweş kilaman dibêje. Şêx Badîn dişîne pey Reso dibêje bila were ji min re kilaman bibêje belkî dilê min rihet bibe. Piştî wê vexwendinê Reso diçe mala Şêx dinêre ku Şêx digirî, Reso ji Şêx Badîn re dibêje” heger tu bigirî ez nikarim kilaman bibêjin û ez ê jî bigirîm.” Şêx Badîn, ji ber vê helwesta Reso egalekê davêje ser serê xwe ji bo ku Reso wî nebîne û bêdeng digirî. Bi vî awayî Reso dest bi kilaman dike dema kilam diqedin Şêx Badîn egala xwe radike dinêrên ku

<sup>189</sup> Dit, Dengbêj geleneğinin sonu ya da bu geleneğin son halkası: Reso”, Bîr, j. 6, r.179

<sup>190</sup> H. g., r.179

<sup>191</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Abdulkerim Guner”, 17.03.2013, Mûş.

<sup>192</sup> Chiristin Poshe, “Kurt Müziği”, *Kürt Müziği*, Edit. Abdullah Keskin, werg. Kerem Özdemir, weş. Avesta, İstanbul, 1996, r.68.

pêşa Şêx ji hêstrên çavan şil bûye. Şêx vedigere Reso û jê re dibêje: “Reso ew cîgera min a ku ew qas dişewitî rihet bû” û ji wê rojê bi şûn de êdî Şêx Badîn nagirî.<sup>193</sup>

Ev dengbêjê me yê ku bi dengê xwe ji derdan re bûye derman û di civatên giran de cihê xwe girtiye, di sala 1969an de ji ber bûyerekê dengê xwe yê berê winda dike û nikare weke berê kilaman bibêje. Kurê wî Evdilkerîm bûyêre wiha bi lêv dike:

“Bavê min ji bo dostekî xwe ziyaret bike, diçe Ruhayê û çend rojan li cem dostê xwe dimîne, paşê dostê bavê min wî bi xwe re dibe daweteke ku li gundê Pirsûsê ye. Li daweta vî gundî bavê min û heft dengbêjên dinê bi hev re kilaman dibêjin lê ew dengbêjên din li hemberî bavê min nikarin li berxwe bidin û têk diçin. Li ser vê yekê van dengbêjan hineyê dikin nava qehweyê û bi bavê min didin vexwarin. Bavê min piştî rojekê, du rojan nexweş dikeve, deng jê dernakeve û nikara biaxive.”<sup>194</sup>

Piştî vê bûyerê Dengbêj Reso nexweşxane bi nexweşxane digerrînin û paşê tê femkirin ku têleke dengê wî qetiyaye. Reso ji vê şûn de jiyana xwe ya dengbêjiyê bi dengê ku têleke xwe winda kiriye didomîne. Digel vê yekê kesên jê daxwaza kilaman kirine neşikandiye û ji wan re kilam gotiye. Reso di sala 1983yan de ji ber nexweşîna pençeşêrê jiyana xwe, ji dest dide û li gundê Pagê tê definkirin

### 3.1.3. Fonetika Şakiro

Şakiro yê ku di warê şîrovekirina kilaman de xwediyê qabilyeteke mezin e, dengê xwe yê tîz di kilaman de bi hostayî bi kar aniye. Wî kilamên xwe bi sewta serî gotiye, lewre heger dengbêj di xala tîzê de qirikê bi kar bîne dê nikaribe dengê rast derxe. Dema ku sewta serî bê bikaranîn wê demê him deng bi hêz derdikeve him jî guhderan aciz nake.<sup>195</sup> Lêkolîner Veysi Varlı li dijî vê yekê derdiekev û dibêje: “Ji ber ku dengê Şakiro tîz e, yê ku li wî guhdar dikin, divên qey ew dengê serî bi kar tîne. Lê kesê ku bi sewta serî kilamê bibêje nikare dengê xwe bixulxulîne û bi dengê xwe bileyize. Lewre sewta serî di valahiya dev û di poz de tê derxistin ango qirik nayê bikaranîn. Şakiro di sewta serî de dengê qirikê bi kar aniye”<sup>196</sup>

Weke ku me berê jî gotibû dengê Şakiro tîz e, dengê tîz ê mêran wek tenor tê binavkirin. Dengê wî qasî ku tîz e ew qas jî berfireh e. Her dengê tîz xwediyê qadeke

<sup>193</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Zeki Badıkanlı”, 12.08.2012, Manisa.

<sup>194</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Abdulkemim Güner”, 17.03.2013, Mûş.

<sup>195</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Zelal Gökçe”, 15.09.2012, Stenbol

<sup>196</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Veysi Varlı”, 20 Gulan 2013, Amed.

berfîreh nîn e lê ji ber ku dengê Şakiro zirav û dirêj e qada dengê wî berfîreh e. Bikaranîna wî ya dengê bilind a bêyî teknolojiya muzîkê ya nûjen serkeftinek e. Heger ku teknoljîya muzîkê ya vê serdemê bi kar bianiya dê bigihîştta tonê dengê ku kes nikare derxe.<sup>197</sup> Şakiro kilameke ku tona wî “Sol” be bibêje dê li ser tona “sol”a duduyan bibêje. “Sol”a duduyan jî dengê jinê yê soprano ye. Ji bo mêr di tona dengê jinê de gotina kilamê ne hêsan e lê Şakiro bi hêsanî dikare di tona jinê de bibêje. Şakiro dikare sewta jinê bi hêsanî bi kar bîne.<sup>198</sup> Ji ber vê taybetmendiya Şakiro, hin dengbêj bi dengê xwe bawer nebûne ku kilamên Şakiro bibêjin. Yek ji wan dengbêja, Nejmedin dibêje: “Em nikarin di terzê Şakiro de bibêjin ji ber ku qirik û dengê me têr nake”.<sup>199</sup>

Şakiro awaz û gotinan wisa xweş bi cih dike wekî hostayekî ku diwar çêke kevirê xwe bi cih datîne,<sup>200</sup> mirov dibê qey Şakiro bi salan perwerdeya muzîkê û notayê dîtiye. Ji dengên tîz bê detone dikare bi hêsanî dagere dengên pes. Hunermend Mizgîn Tahîr dibêje: “Dengê Şakiro tonalîte ye û wek tîrê dere li notayê dikeve. Bi vî awayî azadiyê dide qirika xwe û li gor kêfa xwe dibêje. Mirov çiqas azadiyê bide qirikê deng ew qas diherike. Dengê wî ew qas zelal e, weke tiştêk şênber mîrov dikare bi guhên xwe dengê wî bibîne.”<sup>201</sup>

Dengbêj Şakiro di kilamekê de carinan du sê meqaman bi kar tîne û ji meqamekê bi hêsanî derbasî meqamekî dinê dibe vê yekê bi awayekî rast pêk tîne. Wek mînak di kilama “Wey dil” de sê ton bi kar anîne. Li Ewropayê hunermendên profesyonel di hin stranên de vê yekê pêk tînin lê ji ber ku dengê wan têr nake tenê 2 tonan bi kar tînin. Lê ev yek di kilamên Şakiro de li gor çîrokê diguhere, destpêka çîrokê bi dengê pes e, hin diçe dengê xwe bilind dike û dema çîrokê tê asta herî tevgerdar tona dengê Şakiro dibe tona herî bilind û tîztir. Ew her kilamê cuda û li gor naverok û awayê çîrokê dibêje.<sup>202</sup> Li hêla din Şakiro bi çî rîtmê dest bi kilmê kiribê bi heman rîtmê kilamê didomîne wek mînak di destpêka kilama “Lo Mîro” de çend cara gotibe lo mîro di berdeamiya kilamê de jî ew qas car gotiye lo mîro. Ango Şakiro çî bibêje bi rîtm dibêje, tempoyek di hundirê wî de heye.<sup>203</sup> Her wiha Şakiro ji dil û can hestên xwe dike kilamê û bi vî awayî peyvan bi hestên xwe dixemilîne.<sup>204</sup> Mirov dikare

<sup>197</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Muzikolog Mustafa Demir”, 14.02.2013, Amed.

<sup>198</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Veysi Varlı”, 20.05.2013, Amed.

<sup>199</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Dengbêj Nejmedîn”, 29.05.2012, Mûş

<sup>200</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Dengbêj Kesê”, 29.05.2012, Mûş

<sup>201</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Mizgîn Tahîr”, 10.03.2013, Amed.

<sup>202</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Alaaddin Aykoç”, 20.09.2012, Stenbol

<sup>203</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Mizgîn Tahîr”, 10.03.2013, Amed.

<sup>204</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Dengbêj Elîcanê Pasûrî”, 12.03.2013, Amed

bibêje ku nefesa wî, qirika wî, dîaframa wî, pozîsyona wî û rîtma dilê wî bi ya hevdu dikan.

Şakiro bi kilamên xwe, bi sewta xwe û bi hunera xwe, di nav gelek dengbêjan de xwediyê bandoreke girîng e. Li gorî hin dengbêjên roja me yek ji taybetmendiyan Şakiro ew e ku gotinan dide ser hev wek stîla repê dibêje.<sup>205</sup> Ji ber ku bikaranîna ve stîlê ne hesan e, Dengbêj Enwer dibêje ku di teşeya danîna peyvên ya li ser hev û zûgotinê de kes nikare di meqamê Şakiro de kilaman bibêje.<sup>206</sup> Dengbêj Tehsînê Pasûrî jî balê dikşîne ser deng û meqamê Şakiro û dibêje: “Şakiro şahê dengbêjan bû, deng û meqamê Şakiro Xwedê nedaye tu însanî.”<sup>207</sup>

### 3.2. Berhemên Şakiro

Di nava gel de bi dehan bandê wî hene; ku li malan hatine dagirtin. Lê ji ber ku teyb dangan baş hîlnadin, lêkolîner Ahmet Aras, li ser daxwaza Ruhî Su hewl dide ku dengê Şakiro li studyoyê, tomar bike, û bandeke ku rûyekî wê ji kilamên Ruhî Su yê dinê jî ji kilamên Şakiro pêk tê amade bike. Aras vê daxwazê radigihîne Şakiro, lê ji ber ku ew ji gurçikên xwe nexweş e, ji Aras re dibêje: “Hela hinek sebir bike, ez baş bibim qirik û gewriya xwe temîz bikim wê çaxê em dê gotina te bînin cih.”<sup>208</sup> Mixabin her diçe nexweşîna wî giran dibe û ev yek pêk nayê. Heger ev yek pêk bihata dê bandeke ku aliyekî wê ji kilamên Ruhî Su; aliyê dinê jî ji kilamên Şakiro pêk tê bihata dagirtin. Ji aliyê “Çağdaş Muzîkê” ve 24 bandên Şakiro weki rêze arşiv hatine çap kirin, lê me tenê navê 20 bandên wî peyde kir. Ev bandên wî bi teyban hatine dagirtin lê ji aliyê vê şirketê ve hatine berhevkirin û ji nû ve li studiyo hatine tomarkirin. Navê bandên wî yê ku me navê wan peyda kirin ev in :

Şêst û şeş Avaz im, ji 10 kilaman pêk tê

Gulê Dêran, ji 12 kilaman pêk tê

Murat Heft Reng e, ji 13 kilaman pêk tê

Yar Yar Yar, ji 12 kilaman pêk tê

Ax Lo Delîl, ji 9 kilaman pêk tê ( digel tembûrê dibêje û kilameke bi rîtim jî gotiye)

Kewa Gozel, ji 12 kilaman pêk tê

Narîn, ji 11 kilaman pêk tê

<sup>205</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: M. Metîn Barlik”, 29.05.2012, Mûş

<sup>206</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Dengbêj Enwer”, 29.05.2012, Mûş

<sup>207</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Dengbêj Tehsînê Pasûrî”, 12.03.2013, Amed

<sup>208</sup> Ahmet Aras, Ahmet, “Şahê Dengbêjan Şakiro Vefat Kir”, *Ronahî*, r. 8.



Etegê Sîpanê, ji 13 kilaman pêk tê  
Mîrê Zirav, ji 10 kilaman pêk tê  
Şalûl û Bilbil, ji 13 kilaman pêk tê  
Berîvanê, ji 12 kilaman pêk tê  
Lê Lê Qazê, ji 11 kilaman pêk tê  
Xezala Nêçîrvan, ji 7 kilaman pêk tê  
Ez Guneme, ji 10 kilaman pêk tê  
Havar Delal, ji 12 pêk tê  
Kubar Canê, ji 11 kilaman pêk tê  
Şêxê Kubar, ji 10 kilaman pêk tê  
Kewê, ji 13 kilaman pêk tê  
Tayê Rihanê, ji 12 kilaman pêk tê  
Rebenim, ji 12 kilaman pêk tê

### 3.2.1. Mijarên Berhemên Şakiro

Weki ku me berê jî gotibû dengê Şakiro bi riya teyban gelek caran hatiye tomar kirin û bi vê riyê gelek kilamên ku wî gotiye di nav gel de belav bûne. Me jî ji bo vê xebata xwe hewl da ku em xwe bigihînin kilamên wî, di encama hewldanan de, me ji 100î zêdetir kilamên wî guhdar kir û em li ser 70 kilamên wî yên ku hatiye deşîfrekirin rawestiyân. Lê mixabin ji ber ku em nizanin kîjan kilam ya wî ye yan a wî nîn e, em jî bi gelemperî li ser kilamên ku wî gotine hûr bûn. Lewre Şakiro bi qirik, deng û lêzêdekirina peyvên xwe renekî cuda daye kilaman. Weke ku Mizgîn Tahîr jî dibêje: “Şakiro dema kilamekê dibêje ya kê dibe bila bibe, tu dibêjî qey ruhê kilamê stendiye, xwe kiriye nava kilamê tehma xwe daye kilamê.”<sup>209</sup> Ji bo kilamên ku Şakiro gotiye baştir bîn fêmkirin, em dê hewl bidin ku di bin hin sernavan de naveroka kilaman vebêjin.

#### 3.2.1.1. Nifir

Nifir ji bêçaretî, têkçûn, acizî û zeîftiyê pêk tê. Li gel vê yekê di warê hevîdariyê de roleke wan ê gelek girîng heye; ji ber ku nifir giş tiştên ku di pêşerojê de tîn xwestin in; ango hevî ne, ew jî cureyekî hevîyan in, lê cudahiya wan ji yên din; ev hevî ji bo xerakirin û xerabiyê tîn xwestin. Gava ku kes li hemberî rewş an jî bûyerekê; qels, kê, aciz û bêçare dimîne pêdiviyê bi nifiran dibîne.<sup>210</sup>

<sup>209</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Mizgîn Tahîr”, 10.03.2013, Amed.

<sup>210</sup> Rênas Jiyan, *Ji Şevê Re*, weş. Belkî, Stenbol, 2008, r.264-265.

Carina kesên ku meqsed û miradê wan neçe serî wek berpirsyarê vê yekê hin kesan dibînin, û li wan nifiran dikin. Nifir li gor mijarê diguhere herger mijar evîn be nifir li yê ku li ber evînê bûne asteng dihate kirin. Di kilamên Şakiro de nifir bi giştî ji devê jinê hatine kirin, keç û qîzên ku dixwestin bi heskiriyê xwe re bizewicin ev daxwaza wan carna ji aliyê dê û bavê wan ve dihate astengkirin û ev jî dibû sedema zewacên bêdil. Keçên ku bêdil dihatin zewicandin û miradê wan nedîçû serî tu xêr ji jiyana xwe nedidîtin ji ber ku sebebê jiyana bi xem û keser dê û bav bûn, nifir li wan dihat kirin.

“ ...

Êtîmo minê delalîkê dilê xwe ji heft salî de ji xwe ra xwedî kir.

Ez çî bikim, qedera Rebê jorîn bû, li jêr nekir.

Lawikê min hatibû gund, me dil tê da

Heft salî da ez dixwastim, min nedanê.

Xwedê bi dê û bavê min re qebûl neke, qe hilnede.

Ez dame kotî miskînî nemerdi heramî

Mêrê xirav vî miskînî vî heramî fenanî xwe kir.”<sup>211</sup>

Carna jî di evînen yek alî de yê ku bersiv nade heskiriyê/a xwe dibe hedefa nifiran. Di mînaka ku em dê li ser vê mijarê bidin de ya ku bersivê ji heskirina xwe re nabîne keçik e, keçik behsa bedewiya xwe dike lê dîsa jî heskiriyê xwe nikara îkna bike li ser vê yekê nifira li wî dike lê belê ji ber ku heskiriyê wî ter û can e nifira li malê wî dike ji bo ku dewlemendiya xwe winda bike û di nav şert û mercên xerab de jiyaneke şerpeze bidomîne.

“ ...

Ez ê tu nifirî li te nakim, tu ter û can î gencî li ber mala xwe be

Hêvî gumana min heye ji Xaliqê Alemê Rebê jorîn,

Mîrê ji mîra, ji şêxê melekan

Te tim û tim cara aniye serê pir û pir gelekan

Belkî vê sibengê Xaliqê Alemê Rebê jorîn bi dil bike

Gelo berfekê bibare salekî şeş mehan bimîne li erdê

Qir bikî hefsed miyê serê di çiyê, danzdeh kihêlê serê tewlê

Bi devê biharê ra bi hasilê dewê du çêlekan”<sup>212</sup>

<sup>211</sup> Sebra Dilan, Narîn, Çağdaş Muzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>212</sup> Nêçîrvano, Narîn, Çağdaş Muzik, İstanbul, bnr. r. 117, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

Nifir di şer û pevçûnan de li himber zilm û zorê, bêbextiyê bertek e, di encama şer de hin têk diçin, hin tên kuştin hin jî dikevin rewşeke xedar, ên ku ji ber vê yekê xemdar dibin nifira li yê ku bûye sebebê vê rewşê dikin ango nifira li zaliman dikin. Lê di vir de armanca nifiran ne tenê kesê zalim e di heman demê de malabat û sulala wî ye jî.

“... ”

De agirê kulê bikeve mala Emerê Mihê  
Lawê Perîxanê, Eşîra Xiya, gire girê Badika  
Derbekî dest berdane bedena bavê Salih  
Peyayê mala Usivê Seydo  
Seyr bike gelo vê sibengê eşîr neman malxerabo  
Di eşîran de mêr neman e  
Kesekî xwedê xêrê tune bi orta (nivek) çapliya xwe bigre li meydanê  
Ji peyayê mala bavê min re bibe balîv, bibe pal e”<sup>213</sup>

Bi taybetî di kilamên şeran ên ku Şakiro dibêje de nifira “agirê kulê bikeve mala...” li gelek ciyan derbas dibe.

### 3.2.1.2. Dua/Die

Dua lavelavên erênî yên ku ji hêzeke mezin tên xwestin in. Jixwe weke orjîna nifiran de, orjîna duayan de jî, ji hêz an jî heyîneke ji xwe mezintir û ji xwe xurtir daxwaza bicihanîna meqsedan tê kirin, lê cudahiya sereke û eşkere ya nifiran ji duayan; nifir xerakirinê, dua jî avakirinê dixwazin. Di her du têgehên de xala hevbeş dazwaz e lê şîdeta nifirê ji ya duayan xurtir e.<sup>214</sup> Di kilamên ku Şakiro dibêje de dua li gor nifira hindiktir in.

Di kilamên ku naveroka wan şer in de, yên ku amadekariyên şer dikin an jî bi ber qada şer ve diçin, ji bo ku di şer de serkeftî bin li wan dua tê kirin. Ji ber ku yên diçin şer bi piranî mêr in, dia ji aliyê jinan ve tên kirin. Di duayên demên şer de girîngiya hebûna mêran a di mal de derdikeve pêş û tê xwestin ku mêrê malê ne bi tenê be. Lewre hejmara mêrên malê çiqas zêde be hêza wan jî ew qas xurt e.

<sup>213</sup> Ez Rebenim, [https://www.youtube.com/watch?v=m37XCvNIK\\_o](https://www.youtube.com/watch?v=m37XCvNIK_o) 12.03.2013, (Deşîfrekirin: Serdar Öztürk)

<sup>214</sup> Rênas Jiyan, *Ji Şevê Re*, r.266.

“ ...

Ê siwaro lo siwaro lo siwaro lo siwaro,  
Ax tu mala dilê dayika xwe  
Nemînî peyayo ocax bi tenê.”<sup>215</sup>

Di kilamên dilan de evîndarên ku dixwazin bigihîjin heskiriyên xwe, ji bo ku ev daxwaza wan bicih were duayan dikin lê duayên xwe bi rêya şêx û ewliyayan bi lêv dikin. Ew di wê baweriyê de ne ku şêx û ewliya qûlê Xwedê yên baş in û heger ji bo meqsedê wan here serî ji Xwedê ricakar bin dê duayên wan qebûl bibin.

“ ...

Ez ê rabim destê delaliyê dilê xwe bigirim  
Ser şêx û ziyareta bigerînim  
Belkê ji ba Xwedê de ricacî (tika) bin  
Miradê miradxwazan biqedîne  
Bi tevahî miradê min û delaliyê dilê min hasil bike.”<sup>216</sup>

Dîsa di kilamên dilan de duayên ku ji devê mêran hatine kirin hene. Mêrê ku negihîştîye heskiriya xwe û heskiriya wî bêdil hatiye zewicandin, hin jî hêvî dike ku bigihîje dildara xwe ji ber ku dildara wî ne aram e. Mêr bi mebesta ku hêviyên wî pêk werin duayan dike. Lê dema ku duayan dikin ne tenê ji bo xwe, ji bo yên ku di heman rewşê de ne jî dua tê kirin ev yek jî encama empatiyê ye.

“ ...

Meriv eyba mêrê camêr bibîne  
Gerê ku tim û tim caran lê bike star e.  
Ez çî bikim felek xayîn e,  
Mêrê miskîn û heram e, mêrê qaza min nikare.  
Gelî gundî û cîarno gilî gazin û loma ji min nekin,  
Tu dêhna xwe bidê vê sibengê malxirabo,  
Xaliqê alemê miradê miradxazan hasil bike,  
Miradê min û miradê qaza min bi tevahî.”<sup>217</sup>

---

<sup>215</sup> Lo Siwaro, Mp3, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>216</sup> Lawiko, Şelûl û Bilbil, Çağdaş Muzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: serdar Öztürk)

<sup>217</sup> LêLê Qazê, <https://www.youtube.com/watch?v=DNKSyBrRwcE> 15.05.2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

### 3.2.1.3. Sondxwarin/Sond

Koka sondan “bawerî” ye, yan yek bi yekî “bawer” nabe û pê daye sondxwarin, an yek bi xwe bawer nabe sondê dixwe. Bawerî ji bo sondan rola sereke dide ser xwe. Tiştê ku sondên girîng dike û wê tîne li asta zagonê disekinîne bawerî bi xwe ye.<sup>218</sup> Her kesî li gorî pîroziyên xwe, bi serê kesên ku di jiyana wan de ciyekî girîng girtiye sond xwariye. Kurda jî bi gelimperî bi gor û serê bav, kur û birayê xwe sond xwarine. Lê sonda wan a herî girîng ew e ku mirov mista xwe tijî xwelî dike, ji bo belav bibe dide bayê û dibêje bila nixên min jî weha ber ba bibin. Kurd, zû bi zû vê sondê bi derewî naxwin, lewre ew di wê baweriyê de ne ku yê vê sondê bi derewî bixwe ê mala wî mîrat bibe.<sup>219</sup>

Wekî ku tê zanîn di nava civakê de hin pîvanên biryardariyê hene. Ji vana yek jê sondxwarin e. Sond ji bo kesan peyva dawîn e. Sond, li ser nixên girîng ên wekî bawerî, jin, ax, tiving û hwd. tê xwarin. Gelek sedemên sondxwarinê hene. Ji bo diyarkirina biryardariyê, ji bo îknakirinê, ji bo çavtirsandinê û hwd. piştî sondxwarinê êdî vege tune ye. Vê hêmayê di hunera kurdî de jî cih girtiye. Şakiro di gelek kilamên xwe de bi berfirehî cih daye sondan.

Di kilamên şeran de leheng, ji bo ku biryardarî û bixwebaweribûnê diyar bike sondan dixwe. Ev sond carna li ser jinberdanê ye. Heger sonda xwe bicih neyîne dê dev ji jina xwe berde. Lewre jinberdana bê sedem di civak de şermeke mezin e. Mêrê ku jina xwe berdaye di nava civakê de bêrûmet dibe. Ev yek jî ne bi dilê mêran e. Ji aliyê din ve leheng dixwaze neyarê xwe him ji aliyê fizîkî ve him jî ji aliyê derûnî ve têk bibe. Ji bo vê yekê jî dixwaze ku çeka destê neyarê xwe li ber çavên jin û zarokên wî jê bistîne.

“... ”

Helhela ez herim mala bavê Salih bexê Mala Ûsivê Seydo.

Peyayê xerib mêrê mêrxas kewê ribat ne ez birayê te me.

Mîn bi telaqê jin berdanê sond xwariye

Li devê Mûradê fişeng avêtiye devê çapiliyê

Gere îro Cemalvêrdê Sidîqê Hecî Mistefa Begê, Mûsa Begê tevî mamê begê

Komê xulaman bikujim.”<sup>220</sup>

<sup>218</sup> Rênas Jiyan, *Ji Şevê Re*, r.275-276

<sup>219</sup> Mela Mehmûdê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye*, amd. Jan Dost, Weş. Nûbihar, İstanbul, 2012, r. 87.

<sup>220</sup> Lo Axawo, Mîrê Zirav, *Çağdaş Müzik*, İstanbul, bnr. r.127, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

Mêr ji bo ku dilsozî û evîna xwe jê wê re ispat bike sondan dixwe. Rêya vê yekê ya sereke jî ol û bawerî ye lewma jî mêr dema ku sond dixwe ev sond li ser Quranê ye. Lewre piştî ku sond li ser Quranê tê xwarin mirov mecbûr dimîne ku bawer bike. Mêr jî ji bo ku dildara wî ji wî bawer bike li ser Quranê û bi navê pêxember sond dixwe.

“... ”

Vê sibengê gerdenzera min were,  
Merhema kewa birîna min were  
Xwînşirîna min were,  
Heta dinya xweş û ava be,  
Min sond xweriye bi serê Resûlê Ekrem pêxember e.  
Vê sibengê tu cara  
Di dêrisê gunda da nadim terka bejna zirav lo sîngê zer e”.<sup>221</sup>

Di kilamê Şakiro de heman dilsozî ji devê jinan ve jî tê gotin. Keçik ji bo ku dildarê xwe bi dilsoziya xwe bide bawerkirin “bi sonda qesemê” sond dixwe. Bi vî awayî hêviya hezkiriyê xwe xurt dike. Di vir de balê dikişîne ser fesadiyê jî heger bi rêya birin û anîna fesadan navê keçikê û hezkiriyê wê bi hev re derkeve ji xwe dê sonda ku xwariye jî betal bibe ji ber ku mebesta sondxwarinê bicîh hatiye.

“... ”

Lawiko dîno min sondxwarî sonda qesemê  
Sed wehed li bedena min ketibe  
Terka delaliyê dilê xwe jî nadim  
Heta fesad û şeytanên gundê me têr fesadiyê nekin  
Navê min û delaliyê dilê min bi hev re dernekeve  
Li bajarê xerîb lawiko dîno li Stenbolê”<sup>222</sup>

Ji xeynî Quran, qesem û pêxemberan li ser navê hin şêxên wê demê jî sond hatine xwarin. Lewre şêx di nav kurda de xwedi qedr û qiymet bûne, civak bi wan şêwiriye û li gor gotina wan tevgeriyaye. Lê hêla din kesên ku nexweş ketine an dîn bûne ji bo ku baş bibin xwe avêtine malên şêxa û eger roja mirina nexweş nehatibe, li ba

---

<sup>221</sup> LêLê Qazê, <https://www.youtube.com/watch?v=DNKSyBrRwcE> 15.05.2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>222</sup> Sebrê Dînê, Etege Sîpanê, Çağdaş Muzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: serdar Öztürk)

kijan şêxî baş bûbe êdî dibe murîdê wî şêxî.<sup>223</sup> Ji ber van sedeman şêx ji bo hin kesan bûne sembola sondê

“ ...

E Sidîqê Hecî Mistefa Begê digot wele nabe bîle nabe  
Min serê şêx Badînê erdê Dignugê sond xweriye tu car nabe  
Heya li dinyayê sax û silamet bim fîrarê Seyît û Berazan nayên  
Bi silametî di ser min ra derbas nabe”<sup>224</sup>

Carnan jî li ser alavên şer ên wekî xencerê jî sond dixwin lewre xencer di nav mêran de nirxeke girîng e, di rojên teng de bi wê êrîş dike yan jî xwe diparêze; di rojên şahî û xweşiyê de bi wê ser bilind dibe û pesnên xwe dide.

“ ...

Gidî kembera zêran û zîvan giran e.  
Ez xwe ji dilê rezîl qîmîş (Dest çûn) nakin  
Ax lo nadim piştê hewû rebeno gidiyê.  
Hewû zalimê gilî gazin û loma ji min neke  
Min sond xweriya li ser xencerê  
Li min ez ê ranabim ji kêlekê lo ji tenîştê.  
Bê xezal hayê hayê”<sup>225</sup>

Di hin kilaman de jî sond li pey hev hatine rêzkirin. Ev yek ji bo xurtkirina bîr û bawerî û dilsoziya xwe ye.

“ ...

Min sond xwariye bi sonda qesemê,  
Bi navê Quranê  
Bi dîn û îmanê  
Bi telaqê jinberdanê,  
Heya dinya xweş û ava be,  
Di dêrisê gunda da tu caran

---

<sup>223</sup> Mela Mehmûdê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye*, r. 103-104.

<sup>224</sup> Lo Axawo, Mîrê Zirav, *Çağdaş Müzik*, İstanbul, bnr. r.122, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>225</sup> Xezal, <https://www.youtube.com/watch?v=xWdXkVMME-o&list=PLFE1BEA0861AE5F44&index=10> 01.06. 2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

Nadim terka bejna zirav lo sîngê zer e.”<sup>226</sup>

#### 3.2.1.4. Gazin

Di kilaman de gazin cihekî girîng digire, bi pey daxwazên pêknehatî û têkçûyînan gazin hatine kirin. Ev gazin bûne berdevkê hestê jin û mêran. Di kilamên şakiro yên evînê de gazin ji devê mêran; di yên şer de jî ji devê jinan hatine kirin.

Di kilamên dilan de mêt, helwesta neyînî ya jinê fêm nake û gazinên xwe li ba der û dora xwe dike, ji wan alîkariyê dixwaze. Kirinên xwe bê guneh dibîne û dixwaze ku li himber berteka ku hezkiriyê wî nîşan daye xwe biparêze.

“ ...

Gelî hevalino hogirino çika werin.

Min çi ji vê terez û terzbavê ra gotiye

Bi ser min da xeyal û xem e, kîn û rik e wey dil.

Wey dil wey dil wey dil wey dil.”<sup>227</sup>

Jin bi taybetî di warê evînê de xwe bê sihûd dibînin lewre hest û ramanên xwe ji ber sedemên çandî û civakî nikarin aşkere bikin. Gelek caran bêyî dilê wan tîz zewicandin ji ber vê yekê evîna wan di dilê wan de dimîne. Ew jî gilî û gazinên xwe bi kilaman vedibêjin. Ew gazin caran li qederê, carinan li felekê tîz kirin.

“ ...

Malxirabo, tu sêyr bike, kewa gozel û gogerçîn.

Girtin dane, kotî miskîn û nemerdî heramî mêra.

Hela bala xwe bidê li şansê min keçikê,

Min kubarê, min şêrînê.

Gelî gundî û cînarno vê sibengê

Ji xwe min bêxêrê ay ay.

Were yeman de lo yeman.

Lo yeman de lo yeman ne ez evdal im gidî”<sup>228</sup>

<sup>226</sup> LêLê Qazê, <https://www.youtube.com/watch?v=DNKSyBrRwcE> 15.05.2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>227</sup> Wey Dil, <https://www.youtube.com/watch?v=3L8WxGcbZKU> 03.06.2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>228</sup> Esmerê <https://www.youtube.com/watch?v=gF8tOHXqCBI&list=PLFE1BEA0861AE5F44&index=8> 05.06.2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)



Keçik ji bo ku dildarê wê nayê wê naxweze û li ser soza xwe nasekine dikesire berpirsyarê vê yekê jî hezakirîya xwe dibîne û gazinê li wî dike. Dema ku gazina dike jî xwe wek xezale kovî ya ku kedî nebûye dibîne. Heger ku miradê wê biçê serî dê kedî bibe.

“ ...

Sala par vê çaxê te sozek min re dabû  
Hey bêbexto xelk û alem tev zewicî  
Ez li hêviya qewl û qerar, soz û bextê te mam  
Eman eman eman gidî ax ay  
Ro girtî bû gelo min têr nedî  
Te ez kirime xezale kûvî nebûm kedî.”<sup>229</sup>

Jin gazina xwe ji felekê dikan. Ji ber ku di şer de alîkariya bav, bira an jî heskiriyê wan nake. Di şer de şervanan bi tenê dihêle ji wan re xayintiyê dike. Ev yek jî dibe têkçûyîna şervanan. Jin ji der û dorên xwe gazinan dike çima ku kes li hewara şervanên wan naçe.

“ ...

Eşîra Xiya giregirê Badikan  
Derbekî dest berdane bedena egîdê mala bavê min gulîbira xwedê  
Kesekî xwedan xêr tune bû bi orta çapliya xwe bigirta  
Çend rojeka vê sibengê li welatê serhedê  
Gidî gelo li hewara egîdê mala bavê min here.”<sup>230</sup>

### 3.2.1.5. Evîn

Evîn di nava kilamên Şakiro de cihekî sereke digire. Li gor kilamên ku Şakiro dibêje dibe her kes evînê binase û bizanibe ku evîn tiştêkî xwezayî ye û ji bo mirovan jê neger e. Evîn qedr û rûmetê dide mirovan. Di nava civakê de kesê ku ji evînê û evîndara /ê bêpar mabe bê qedr û bê qîmet e

“ ...

Derdê xerab ji xwe ra ma di dil da.

<sup>229</sup> Eman, [https://www.youtube.com/watch?v=P\\_Sz4IoYTxS](https://www.youtube.com/watch?v=P_Sz4IoYTxS) 10.06. 2013, (Deşîfrekirin: Serdar Öztürk)

<sup>230</sup> Ez Rebenim, [https://www.youtube.com/watch?v=m37XCvNIK\\_o](https://www.youtube.com/watch?v=m37XCvNIK_o) 12.05. 2013, (Deşîfrekirin: Serdar Öztürk)

Ew her çî kesê ku di dêrisê gunda da,  
Mihûba dilê wî tune be,  
Ez ji te ra sond bixwim,  
Bê qedr e, bê rûmet e,  
Sebrê qedr û qîmeta wî tu nîn e.”<sup>231</sup>

Di kilamên Şakiro de kesê bê dil ji her aliyê ve kême, qels e, bê xeml e. Tu wateya hebûna wî tune ye şakiro vê yekê dişibîne rewşên cuda yên wekî dara ku bê çivîk be, baxçeyê bê gul û hwd. lê berevajî vê yekê kesê ku bi evîna xwe re lihevkerî be qayil e ku parsê bike li nav welatên dûr. Mirov her dem hewceyê pariyek nan be, bê mal be, bê nivîn be wekî ku li ser postê jûjî be her dem bê xew bimîne. Dîsa jî bextewariya wî têra wî dike.

“...

Lo rebiyo Xwedê xirab bike dilê bê dil, fenanî gakiê bê werisî bê cil  
Fenanî kirasê qolî (mil) bê mil, fena dara bê şalûl û bilbil, fenanî xasbexçekî rûtî bê gul  
Bila dilê rezîl bi dil be, tûrê parsê li mil be, parsa meriv ne li vir be,  
Nava dozdeh diwêlê ecnebî, ûrisan li mala Emerîkanê gawir be  
Parsa meriv birije, tûrê meriva ê qul be, meriv li ber dîwarê evda be,  
Meriv xwedî kerî nanê garis û cê di gilgil be  
Ber seriyê meriv kevir be, malxirabo serraxa meriv gunî be, binraxa meriv postê jûjî be,  
Ber seriya meriv bi kevir be...  
Tek (tenê) bila di dêrisê gundan de, dilê rezîl bi dil be ax dilo hey dil”<sup>232</sup>

Ji bo kesên evîndar kar û barên dinyayê, mal milk, pere û hwd. ne girîng e. Ya girîng evîn e. Evîn jî jixwe li tiştên wekî nijad, ol, esalet eşîr û hwd. nanêr e.

“...

Dilê minê bi kulê bi meraq ra,  
Vê sibengê ji kedera dilê rezîl ra dibêje,  
Gelî gundî û cînarno ji xwe ra wa digirî.  
Gelî gundî û cînarno!  
Xelq bû aşiqê mal û halê temel û dinyalikê,

<sup>231</sup> Sebrê, <https://www.youtube.com/watch?v=md5fUedI5UE> bnr. r.136, 12.06.2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>232</sup> Wey Dil, <https://www.youtube.com/watch?v=3L8WxGCbZKU> 03.06.2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

Ez evdalê Xwedê bûm aşiqê  
Girêdana qolê bafilê gelo vê sibengê,<sup>233</sup>

Çavên kesê evîndar bar nabe ku dilketiya wî bi keskî din re bizewice. Heger bizewice jî cardin hêviya wî naşikê, hêvî dike ku rojekê dilketiya wî dê bê ba wî ew dîsa wekî rojên berê bi hev re biaxivin. Lê ev hêviya wan heta çêbûna zorekekî kurîn didomîne di vir de mirov dikare bandor û girîngiya zarokê kurîn jî bibîne.

“...  
Kotiyê mêra girtiye konê xwe yê peritî daniye dewsa çadira min a kubarî  
Min sondxwariye ser te kewa xwe ya gozel û gogerçîn (kevok) nadim  
Ez ê bi xulama dev û lêvê şekirî gul jê dibarî  
Malxerabê ser te kewa xwe ya gozel û gogerçîn nadim  
Heta ji kotiyê mêra re destê xwe nede ser bêşikê lawikê kurîn  
Wey Xwedê rebiyo bêşikê darîn hey darîn”<sup>234</sup>

Carna jin bi darê zorê bèn zewicandin û zaroka wan çêbibe jî dev ji evîna xwe bernadîn. Soz didin ku heta dawiya emrê xwe dê bi evîna xwe re girêdayî bimînin. Ji ber vê yekê jî şert û merc çî dibin bila bibin, jin dayika dozdeh qîz an dozdeh lawan be jî hêvî dike ku rojekê bi her awayî nesîbê hezkiriyê xwe be.

“...  
De lo lo lawiko, mi ji te ra negot,  
Dîn nebe, dîn dîn nebe.  
Tu caran yanîş (xelet) nebe, poşmaniya te tê da hebe,  
Ji te ra sond bixwim, bi sonda qesemê, bi navê Quranê.  
Dayika diwazdeh lawa bim sibengê diwazdeh qîzan bim,  
Heya dinya xweş û ava be vê sibengê,  
Hes û nîzam li me ranebe, ez ji te ra sond bixwim,  
Heya soniya dinya derevîn li me bê,  
Dîsa ji me rojek ji rojê Xaliqê Alemê Rebê jorê  
Taxima sing û bera min nesîbê nefsa te be”<sup>235</sup>

<sup>233</sup> Xanê, Mp3, bnr. r.133, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>234</sup> Narîn, Narîn, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Serdar Öztürk)

<sup>235</sup> Serhedê, *Mîrê Zirav*, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

Beravaî vê yekê carinan hebûna zarokan ji bo jina evîndar pirsgirêkeke mezin e ev yek dibe sebebê şikestina hêviyan û êdî neçar dimîne ku bi qedera xwe razî be.

“ ...

Ez ê çî bikim gelo vê sibengê malxirabo  
Dayika donzde dergûşa me  
Ez ê çî bikim ji te, ji xwe, ji vî dilî ax ay.”<sup>236</sup>

Keçên ku dil dane hezkiriyên xwe vê yekê bi awayekî aşkere nikaribûne bilêv bikin ji ber ku li gorî civakê ev yek eyb e. Heger navê keçekê bi xortekî re derkeve ev dibe sebebê pirsgirêkên giran. Mirov dikare bibêje ku veşartina hestan rê li fesadiyê digire. Keça ku şerm dike hestên xwe aşkere bike, li hêviya hezkiriyê xwe dimîne ku were wê bixwaze yan jî dilê xwe jê re veke. Heta wê demê gelek sal jî derbas bibin evîna xwe di dilê xwe de xwedî dike û vedişêre.

“ ...

Heft salî de dil tê de hebû  
Bexê vê sibengê ruyê min nagire, ez ji te re bibêjim  
Ez ji eşqa dilê rezîl, derîsê gundan de ker û gêj im  
Ez ji te re sond bixwim, heft saliya xwe de  
Her çî gotinê ji derdê dilan re min gotiye  
Yeşîn bizanibe, tamamî ji eşqê dilê xwe û te re tev dibêjim.”<sup>237</sup>

Kesê evîndar ji bo ku evîna xwe diyar bike xweziyên xwe ji evîndara xwe re dibêje. Ji bo ku bigihîje evîna xwe dixwaze ku him mêrê wê him jî jina wî bixwe bimirin da ku her du evîndar tenê bimînin û biçin welatekî xerîb bi dilê xwe bijîn.

“ ...

Xwezila mîskîn û heramê mêrê te bimira kevna jina min bi ser da  
Em ê biçûna welatê xerîb û xerîbistanê bira kesekî em nasnekira”<sup>238</sup>

<sup>236</sup> 66 Awaz im, *66Awaz im*, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Serdar Öztürk)

<sup>237</sup> Mehmet Bayrak, *Mûzik, Dans û Şarqiyên Kurdî*, , c.2, r.818

<sup>238</sup> Kewê, [https://www.youtube.com/watch?v=Y\\_Qgmjqt-qg](https://www.youtube.com/watch?v=Y_Qgmjqt-qg) 15.03.2013, Deşîfrekirin: (Zeki Gürür)

Evîn ji bo evîndaran serbilindiyek e. Xortê evîndar dixwaze ku bi destê dilketiya xwe bigire li nav gundan, li ser kaniyan, li qadan û civatan bigerîne û bi vî awayî bextewariya xwe ji her kesî re diyar bike.

“... ”

Ez ê rabim destê kubara dilê xwe bigirim,  
Di kêfê ra bimeşim dêrisê gundan.  
Qasekî rûnim li nava dêreçîtan,  
Nezerhêşînan, laçikspîhan,  
Kofîkêlan, çepildirêjan,  
Gerdenzeran, bejnbilindan”<sup>239</sup>

Li gor kilamên Şakiro keçîka ku jê tê heskirin hêjayî pesindanê ye ji ber vê yekê jî di kilamên evîniyê de taswîra jinê (yarê) cihekî girîng digire. Ji serî heta lîngan wekî ku ji destê wênesazekî derketibe hatiye taswîrkirin. Her beşeke bedana wê şibandîye tiştêkî. Wekî mînak levên yarê tenik in wekî pelên cixarê ne, sûretê wê sor e, rengê wê sosinî ye.

“... ”

Esmer yek e  
Bejn zirav e,  
Çav bi kil e,  
Bisk bi tîl e,  
Çepil dirêj e,  
Por kej e,  
Nav qendîl e.  
Xwîn şêrîn e,  
Reben ez im  
Gerdan zer e,  
Reng esmer e,”<sup>240</sup>

Dengbêj dirêjiya bejna yarê wekî qamişê devê golan û nazikiya wê jî wekî tayê rihanê bilêv kiriye.

---

<sup>239</sup> Sebrê, <https://www.youtube.com/watch?v=md5fUedI5UE> bnr. r.135, 12.06.2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>240</sup> Esmera Şukri, Kewa Gozel, Çağdaş Müzik, İstanbul, bnr., r.115-116. (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

“ ...

Ê lê zerî domamê,  
Sibe ye, bejna te zirav e ji tayê rihanê,  
Gelo vê sibengê ji qamûşê devgolê da”<sup>241</sup>

Jin bê xeml nabe ev yek di kilamên Şakiro de jî berbiçav e. Jin xwediyê gerdena zer in qolê zêran li dora gerdenê ne. Li piştta yarê kembereke zîvîn heye. Li ser kofîya yarê şara şamaqî heye ew şarbi zêrê mehmudî hatiye xemlandin.

“ ...

Mihuba dilê min ji avê tê.  
Hela bala xwe bidê gerdena zer, qolê zêran,  
Bejna zirav, kembera zîvîn çiqas lê tê.”<sup>242</sup>

Jin jî dema ku dilê wan bi evîne dikele ji bo ku evîna xwe diyar bikin kilaman davêjen ser evîndarê xwe û pesnê wî didin. Ev pesindan bêhtir pesindana bejin û balê ye lê carinan jî behsa ezîzbûn û şîrîntiyê jî tê kirin.

“ ...

Ax de yo yo yo lawiko  
Wî de bejin ziravo  
Ne kino, ne dirêjo  
Orteo, bi nîçeo  
Lo bejn kiniko yo yo  
Xortekî şîrîngê  
Pir ezîzê pir naziko”<sup>243</sup>

Ji bo keçikê xort hêvî ye, hêz e, paşeroj e ji ber vê yekê heskiriye xwe wek ronahî dibîne û bi mûm, çira û meşalê sembolîze dike

“ ...

Malxirabo gelo li ber çavê min keçikê  
Tu mûm î, tu meşal î,

---

<sup>241</sup> Zerî Domamê, Şalul û Bilbil, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>242</sup> Dewrê, Mp3, bnr., r.126, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>243</sup> Mehmet Bayrak, *Mûzik, Dans û Şarqiyên Kurdî*, c.2, 2002, r.772.

Wey la li min nemayê,  
Dîsa lo çira danî,  
Wî bêbexto gelo vê sibengê  
Rabe bi qayidê xortê xerzanî  
Xwe girê bide vê sibengê,  
Dîsa tim û tim caran  
Li ber çavê min,  
Tu gula kon î”<sup>244</sup>

Carnan jî keçik ji bo ku bala xort bikşîne ser xwe, pesnê xwe dide xwe dişibîne xezaleke ku gerdena wê zer e çepilê wê dirêj, porê wê kej e. Dengvedana xweşikiya xwe bi şerên ku ji bo wê hatine kirin tîne ziman.

“ ...

Gerdena min zer e, çepilê min dirêj e, porê min kej e  
Nava min qendîl e, zenda min bazin e, tilya min bi gustîl e  
Lêva min tenik e, pozê min qerenfîl e  
Sî û sê gulî ser bejna min de tenik û zirav bicite.  
Lo sekvano tu nizanî seva xatirê çav û biriyê min ê reş û belek  
Ketine dawê, ocax koro bîst û çar serî”<sup>245</sup>

### 3.2.1.6. Erotîzm

Di kilamên kurdî de temaya evînê temayeke herî xurt e. Di nav vê temaya evînê de jî motîfa memikên jinan cihekî taybet digire. Tu beşeke bedena jinê wek memikan motifeke xurt û rengîn nîn e. Hejmara kilamên ku li ser memikan hatine gotin, di zargotina kurdî de digihîje dereceyeke bilind. Kêm zêde her kilameke kurdî ya ku li ser evînê hatiye gotin, tê de behsa memikan tê kirin. Ev kilam di nav zargotina kurdî de bingehên edebiyateke erotîk pêk tînin.<sup>246</sup>

Di kilamên evînî yên Şakiro de jiyanêke fantezî ya ku bi hêmayên erotîk dagirtî heye. Sembola jinbûnê sing û ber in. Şakiro jî ev têgeha di nava kilamên xwe de gelekî bi kar aniyê. Sing û ber ji bo keçikê gencîneya herî dewlemend e lê belê deriyê wê gencîneyê tenê ji dilketiyê wê re vekirî ye. Heta dinya hebe jî naqede. Dilketî dikare bi vê gencîneyê şa bibe. Ev yek nîşana dilsoziya keçikê ye.

<sup>244</sup> Delal Ronî, Mp3, bnr.129, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>245</sup> Nêçîrvano, Narîn, Çağdaş Muzik, İstanbul, bnr. r.116, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>246</sup> Rohat, *Di Folklorê Kurdî de Serdestiyê Jinan*, weş. Nûdem, 1994, r. 98-99

“ ...

Hey bêbexto tu nizanî  
Heya dinya xweş û ava be,  
Taxima sing û berê min keçikê,  
Li meydana lo xezina te ye.  
Heylo li min heylo li min delîlo.”<sup>247</sup>

Memikên dilketiyê dema ku nuh dertên piçûk in, hişk in û xav in. Dengbêj vê yekê wek hêjîrên bejî simbolîze dike bi vî awayî dixwaze diyar bike ku heta niha tu kes nêz nebûyê. Bi destûra keçikê tenê hezkiriyê wê dikare nêz bibe.

“ ...

Ez ji we ra sond bixwim,  
Bi sonda qesemê,  
Gava destê xwe diavêjime nava zer memika,  
Teze hêşîn bûne di cihê xwe da  
Fenanî hêjîra, hejîrê bejî.”<sup>248</sup>

Sing û ber taxim in, mêr gazinan ji dilketiya xwe dike. Digel ku dilketî bi mêrekî din re zewiciye jî hevî dike ku evîndara wî rojekê bi dizî, şev nîvê şevê, piştî ku kotiyê mêrê wê ye heram raket gazî wî bike da ku dilketî kulmek ava sar a wekî ava çemên Serhedê ji memikên wê vexwe.

“ ...

Taxima sing û berê min keçikê,  
Fenanî avê li Çûryê li Maçûriyê,  
Li Axuriyê li sînê bi Sînekê.  
Qazgol û Bîngol,  
Şûşal û Tekmanê,  
Welatê me serhedê  
Avê çeman û kaniyan  
Tasa spî ava zelal.  
Min kulmek jê nexwar”<sup>249</sup>

<sup>247</sup> Asê, mp3 bnr. r.123. (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>248</sup> Sebrê Dînê, *Şalul û Bilbil*, Çağdaş Muzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)



Şakiro, sing û berê keçikê ji aliyê çêj û teşeyê ve şibandine fêkiyan. Ew fêkiyên ku di heremên xwe de bi nav û deng in. Wekî sêvên navçeya Wanê Artemêtê, xurmeyên Bexdayê, mewijê Besnî û hwd.

“ ...

Ez ji te ra sond bixwînim, fenanî sêvekî sêvê Waltemetê Edremî)  
Fenanî xurmekî xurmeyê li Bexdayê  
Na wele vê sibengê malxirabo  
Fenanî mehujê ji mehujê Besnî  
Gelo vê sibengê kejo bê dendiko”<sup>250</sup>

Devera sing û beran li ba dengbêjan cih û warê kêf û şahiyê ne. Ev der jî zozanên Serhedê ne. Dengbêj sing û berê yara xwe wekî li zozanan be, di nava taxima sing û berên yara xwe de konekî dayne, çend roja li wir bibe mêvan û lezetekê ji bedena xwe bibîne.

“ ...

Zozanê me Serhedê.  
Meriv konê xwe dayne,  
Çadira xwe biçikîne  
Çend rojeka mêvanê nava taxima sing û berê qazê da bisekine.  
Lezetê ji bedena xwe bibîne”<sup>251</sup>

Di hin kilamên şer de jî sing û ber ji bo ku xortan bişînin şer wekî diyariya herî giranbuha tên pêşkêşkirin. Beriya ku sing û beran pêşkêş bike ji mal û milkê dinyayê wekî kihêlan, keriyên pezan û hwd. pêşkêş dike lê belê heger şervan bi van tiştan qayil nebe wê deme jin amade ye ku gencîneya xwe ya herî giranbuha ji şervan re pêşkêş bike. Di vê mijarê de mirov dikare bibêje ku çend sedemên pêşkêşkirina sing û beran hene. Yek jê motivasyona şervanan a li qada şer e. Ya din derfeta ispatkirina evîna leheng e. Jin dixwaze ku kesê ku ji dil û can ji wê hez dike divê çûyina şer û mirinê jî bide ber çavên xwe.

---

<sup>249</sup> Delal, *66Awaz im*, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>250</sup> Mehmet Bayrak, *Müzik, Dans û Şarqiyên Kurdî*, c.2, r.772.

<sup>251</sup> LêLê Qazê, <https://www.youtube.com/watch?v=DNKSyBrRwcE> 15.05.2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

“..

Her çî kesê ku here bi lawikê min ê cindî ra  
Vê sibengê pêşiya tewş û talanê  
Mala bavê min rebena Xwedê vegevine.  
Ez ê pêşkeş bikimê cotek kihêlê mala bavê xwe gulîbirê  
Pêsrê bi rext e serî wa bi rişm e.  
Eger qayil be jixwe qayil bû  
Gava qayil nebû, pêşkêş bikim cotê zer memikê”<sup>252</sup>

Di hin kilamên Şakiro de pêşkêşkirina sing û beran li aliyekî, ramûsan jî wek guneh hatiye pejirandin. Ev yek jî nîşan dide ku kesên evîndar li gor baweriyên xwe yên olî tevgeriyane.

“...  
...

Sebra dilê min tirsim ramûsenekî li te bixim, mal xerabê kerem bikim  
Tu nizanî em misilmanin bona dînê Mihemmed ji me re heram e.”<sup>253</sup>

### 3.2.1.7. Şer

Di dîroka kurdan de şer bûye parçeyek ji jiyana wan. Vê yekê bandor li hunera dengbêjiyê jî kiriye. Şerên ku pêk hatine bûne mijara kilaman. Dengbêjan bi hunera xwe ev bûyerên ku qewimîne honandine û di nava gel de mayinde kirine. Bi taybetî li herêmên ku şer û pevçûn zêde bûne kilamên ku qala şeran dikin jî zêde ne. Ji ber ku xwendin û nivîsandin heta demê nêzik di nav kurdan de bi rêk û pêk belav nebûye, dengbêjan wekî peywirekê ev bûyerên dîrokî neqil kirine. Ji vî aliyê ve her kilameke şer wek belgeyeke ne nivîsandî ye. Li ser vê mijarê em dê li jêre du mînakên bidin.

Wek mînak kilama Şakiro ya bi navê Bavê Behcet behsa şerê di nav hêzên dewletê û Şêx Fexriyê Bokarikî de dike. Piştî Serhildana Şêx Saîd Efendî daleqandina wan şêx û alimên pê re, apê Şêx Fexrî Şêx Şemsedîn li Diyarbekirê bi Şêx Saîd û wan re, apê wî şêx Nûredîn jî li Xarpêtê dan binê sêpiyê. Biraziyê wan Şêx Fexrî bi hevalên xwe re dadikeve binxetê. Di sala 1927an de beşdarî rêxistina Xoybûnê dibe. Di sala 1928an dewlet efûyekê îlan dike û li ser vê yekê Şêx Fexrî dizivire Serxetê, deşta Silîvan, Qamişloyê, gundê xwe. Dema ku vedigere gunde xwe dibîne ku gundê wî

<sup>252</sup> Lawikê Cindî, *Mîrê Zirav*, Çağdaş Muzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>253</sup> Keçkê Dînê, *Narin*, Çağdaş Muzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Serdar Öztürk)

hatiya talankirin û ew fêm dike ku ev yek dafik e. Ji ber vê yekê car din diçe binxetê. Bi navenda Xoybûnê re diaxife, çekan tedarik dike û tê li herêma piştta deşta Xezaliyê bi hêzên xwe re bicih dibe wê demê dewlet bi Îhsan Nurî re mijûl bû, Şêx Fexrî jî dixwest ku barê Îhsan Nûrî sivik bike lê piştî ku dewletê Îhsan Nûrî paşa têk bir vedigere ser Şêx Fexrî û hêzên wî. Di sala 1933yan de li herêma Hezro-Farqîn-Pasûrê, li Geliyê Godernê, Newela Hesika, Şikefta Ganika di nav hêzên Şêx Fexrî û dewletê de şer diqewime, di vî şerî de dewlet bi piştgiriya Eşîra Xiya, Badika û Mîrên Hezroyê Şêx Fexrî têk dibe û Şêx Fexrî û 17 hevalên xwe jiyana xwe ji dest didin<sup>254</sup>

Ew eşîrên ku beşdarî şer bûne û piştgirî dane hêzên dewletê û bi vî awayî bûne sebebê têkçûyina Şêx Fexrî di kilamê de hatine bilêvkin.

“ ...

Agirê kulê bikeve mala cendirmeyê Sînanîyê,  
Mefriza Bismilê eşîra Badika, giregirê di Xiya”<sup>255</sup>

Di kilamê de herêma ku şer lê qewimiye bi awayekê zelal hatiye diyarkirin. Navê gelî û newalên qada şer yek bi yek hatiye rêzkin.

“ ...

Agirê kulê bikeve mala qumandanê Bismilê,  
Mefriza xwe hilanî ketibû geliyê Godernê,  
Newala Hesikê li hafê reza.”<sup>256</sup>

Şerê ku bi têkçûyina Şêx Fexrî bi encam dibe ji devê jina wî Dilşayê hatiye taswîrkirin. Dilşayê, piştî kuştina Bavê Behçet xemgînî, neçarî û tenêmayînê bi şînê tîne ziman.

“ ...

Derbekî bi destberdanê bavê Behçet şêxê kubar,  
Cinyazê bavê Behçet avêtine makineya,  
Berê wî dane şewitiya Hezro,  
Dema li derê hikumeta Hezro da datanî,

---

<sup>254</sup> Orhan Zuaxpayic “ Şêx Said Hareketinden Bir Portre: Farqînli Şêx Faxri Bokarkî'nin Yaşam Öyküsü”, <http://www.kovarabir.com/tag/sex-fexri/> 01.04.2013.

<sup>255</sup> Bavê Behçet, <http://www.youtube.com/watch?v=5tWkMqPgjfs> bnr. r.119, 17.06.2013. ((Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>256</sup> Bavê Behçet, <http://www.youtube.com/watch?v=5tWkMqPgjfs> bnr. r.119, 17.06.2013. (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

Dilşê li çokê xwe dixist,  
Digot lo lo Behçet berxê,  
Hînga min dizanibû,  
Urt û ocaxê mala bavê Behçetê min qeliya.”<sup>257</sup>

Şêx Fexrî sê caran zewiciye û ji zewaca wî ya dawîn kurê wî Behçet tê dinê ji ber vê yekê jî kilam bi navê Bavê Behçet hatiye gotin.

Mînaka duduyan jî kilama Ferzende Beg e. Ferzende Beg ê kurê Silêmanê Ehmed ji Melazgirê ye û ji eşîra Hesenan e. Ferzende Beg piştî serhildana Şêx Seîd derbasî Îranê dibe û di sala 1927an de ji bo ku beşdarî Serhildana Agiriyê bibe dizivire, bi awayekî aktîf beşdarî şerê Agiriyê dibe. Bi têkçûna serhildana Agiriyê re derbasî Îranê dibe lê hêzên Îranî daxwaza teslîmkirina çekan dikin. Ferzende Beg vê yekê qebûl nake û bi hêzên Îranî re dikeve şer. Di şer de digel gelek hevalên wî û kurê wî yê heft salî jî tê kuştin. Ew jî bi du guleyan birîndar dibe û bi birîna xwe ya xedar sê rojan şer dike ta ku ji hêz û qewetê dikeve. Bi vî awayî dikeve destê leşkerê Îranê.<sup>258</sup>

Di kilama Ferzende Beg de bi taybetî atmosfera şer hatiya vegotin. Di kilamê de diyar e ku li himber Ferzende Beg û hevalên wî çekên giran tîrîk bikaranîn ev yek di kilamê de wiha hatiye vegotin:

“...  
Îro ji êvara Xwedê de tê gurmîna tometîka vî zalimî  
Nemînim sewta vê boriyê”<sup>259</sup>

Jina Ferzende Beg Besra ji wî gazina dike ku çima bi ser nakeve lewre wekî ku di kilamê de jî hatiye bilêvkirin Ferzende Beg berê pesnê Mêraniya xwe daye.

“..  
Besrayê bi sê dangan bang dikir  
Digot Ferzende mala te xirab e  
Te digot ez Ferzende me Ferzende me  
Ez bavê Elfezya Siwarê Eznawir im

<sup>257</sup> Bavê Behçet, <http://www.youtube.com/watch?v=5tWkMqPgifs> bnr. r.120, 17.06.2013. (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>258</sup> Arama Gernas, “Fertzende Beg” <http://www.kovarabir.com/arama-gernas-ferzende-beg/> 7.04.2013

<sup>259</sup> Ferzende Beg <http://www.youtube.com/watch?v=aIQmQaP1Q2A> 10.04.2013 (Deşîfrekirin: Serdar Öztürk)

Xwedanê kuçik çapliyê li welatê dordincî ordiyê (Artêşa Çaremîn)  
Mêr ser min de qe tune ne.”<sup>260</sup>

Di kilamê de Ferzende Beg him bersivê dide Besrayê û him jî dixwaze diyar bike ku dijiminê wan ecem in ango dewletek e. Ji ber vê yekê jî têkoşîna li himber dewletekê ne wek şerên nav eşîran e hêsan e. Ferzende beg bi vî awayî sebebê têkçûyîna xwe tîne ziman û mînakan ji şerên eşîran dide.

“...  
Go Besrayê agirê kulê li qapiyê (derî) te ketê  
Ez ê bi cotê gulê tometîka vî zalimî birîndar im.  
Eva ne şerê Hesenan e  
Ne şerê Heyderan e  
Ne şerê du biran e  
Ne şerê diwazdeh bavê eşîran e”<sup>261</sup>

Dema ku ecem tîne pênasekirin, mezhebê wan ê olî derdikeve pêş û girêdayî vê yekê helwesta ecaman a şer tê şîrovekirin.

“...  
Hewşa kafirê Emir Tûmanê(qomandarê Îranê) ecem e  
Bêşincî (Pêncem) mezheb e  
Bê dîn e bê îman e  
Li ser serê hirmînê topan e  
Giregirê tometîkan makîneliyan e”<sup>262</sup>

Asiya ya diya Ferzende Beg jî di vî şerî de li ba kurê xwe bûye. Ji bûka xwe Besrayê dixwaze ku bi destê kurê xwe Elfeziya bigire ji nav şer derîne lê Besra vê yekê qebûl nake.

“...  
Asiyayê digote Besrayê de dayê dergûşa milê te lawîn e

---

<sup>260</sup> Ferzende Beg <http://www.youtube.com/watch?v=aIQmQaP1Q2A> 10.04.2013 (Deşîfrekirin: Serdar Öztürk)

<sup>261</sup> Ferzende Beg <http://www.youtube.com/watch?v=aIQmQaP1Q2A> 10.04.2013 (Deşîfrekirin: Serdar Öztürk)

<sup>262</sup> Ferzende Beg <http://www.youtube.com/watch?v=aIQmQaP1Q2A> 10.04.2013 (Deşîfrekirin: Serdar Öztürk)

Tu bi destê Elfezya bigire ji navê derkev here  
Go lê dayê rebenê ji te re ne eyb e tu ji min re dibêjî gotinê were  
Bila dergûşa milê min li dora lingê Eşîra mala Emer  
Her du peyayê mala Mistefa Axa tev bigere”<sup>263</sup>

Weke ku li jor di kilamê de jî hatiye diyarkirin dema Ferzende Beg dikeve şer Jina wî Besra, kurê wî yê 7 salî Elfezya û diya wî Asiya jî li cem wî bûne.

Digel ku me li jor qala təkiliya di navbera kilaman û şeran kir jî, ji aliyê din ve di kilamên Şakiro de şer bi awayekî hunerî hatiye pêşkêşkirin. Beriya ku şer dest pê bike hin amadekarî tên kirin. Yek ji van amadekariyan xemlandina hesp û derxistina alavên şer e. Her şervanekî hespekî wî yê çê heye ev hesp bi taybetî ji bo şeran tê xwedîkirin. Rişm, zîn û gema hespê ji aliyê şervan ve bi taybetî ji deverên cuda hatine kirîn. Rima wî jî bi taybetî ji dara gurgînê ye. Giraniya rimê bihêzbûna şervan diyar dike lewma jî giraniya rimê hatiye diyar kirin.

“...  
Vê sibengê zînê seklavî ji qilif dertîne.  
Tu sêyr bike vê sibê seklavî ji tewlê dikişînin.  
Zînê şamê navmîlê datînin,  
Gema Diyarbekirê li dêv dixîne.  
Rima nevzerê zingê rastê da diçikîne  
Serê rimê movik e  
Topa rimê diwazdeh kîlo ji darê gurgîn e.”<sup>264</sup>

Di hin kilaman de qada şer jî hatiye taswîrkirin. Dema ku şer dest pê dike, qada şer di nava toz û dûmanê de dimîne wisa dibe ku kes kesî nabîne, dê ewladê milê xwe davêje. Helbet halan û qîrîn tevlihev dibin. Şervan bi sonda qesemê, bi Quranê û bi jinberadanê sond dixwe ku heta mêran nekuje ew dê ji qada şer neqete.

“...  
Gelo vê sibengê gerek îro Cemalverdiyê mêran bikujim.  
Fenanî miya ku berxa xwe winda bike dê ewladê milê xwe biavêje  
Hela danê hela danê egîtê mala bavê min nemayê hela danê”<sup>265</sup>

<sup>263</sup> Ferzende Beg <http://www.youtube.com/watch?v=aIQmQaP1Q2A> 10.04.2013 (Deşîfrekirin: Serdar Öztürk)

<sup>264</sup> Hemdo û Gelhê, Mp3, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

Şervan bi xwe bawer e ku ew ê koka neyaran biqelîne, li qada şer revê bi yên mayîn bixe. Hêviya malbat û eşîrên wan bişikîne. Heta ku keç û bûkên wan bê mêr bimînin û bi ser mala bavên xwe de vegerin.

“ ...

Gere em elqa şewêşiya biqelînin,  
Bûkê ser bi xêlî ser malê bavan da vegeînin.  
Her kes bi xwe ra bi destê qîzê xwe bigire bide mêr e.  
Ax dêran dêran dêran dêran dêran <sup>“266</sup>

Her carê sihûda şervan ne li aliyê wî ye. Carinan sihûda wî xerab tê û hinek astengî derdikevin pêşiya wî, şervan ji neçarî tîk diçe. Wek mînak hespê wî di şer de dikeve qadeke xirab, her du lingên wî di heriyê de diçikin. Şervan ji hesp dikeve xwarê, neyar li ser serê şervan digihîjin hev û derbên giran lédixin.

“ ...

Tu sêyr bike bêxwediye  
Seklavî tê çavê wê li avê dimîne,  
Xwe ber bi avê dikişîne.  
Herîkek dikeve pêşiyê,  
Her du qîçê paşîn di heriyê da dimîne  
Nikare qîçê xwe ji heriyê û çamûrê derîne.  
Her sê lawê Şêx Elî fenanî sê gurê xwe dayîn e.”<sup>267</sup>

### 3.2.1.8. Şîn

Her ferdî di jiyana xwe de teqez hin kes winda kirine yan dê bike. Mirov her çiqas vê yekê bizanibe û xwe jê re amade bike jî, dema ku yekî nêzikî xwe winda dike mêtîna hestan ser û bin dibe û mirov nikare bi vê rewşê re derkeve serî. Şîn, pêvajoyeke asayî ya ku di encama mirina kesê/a jê te heskirin an jî qedandina tîkiliyeke girîng pêk tê. Kesên ku vê pêvajoya şînê bi awayekî xwezayî bijîn dikarin ji derûniya xerab a ku di encama mirin û veqetandinê de pêk hatiye xelas bibin. Ev yek nayê wê wateyê ku kesê/a

---

<sup>265</sup> Saliho Pismam, *Mîrê Zirav*, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>266</sup> Gulê Dêran, *Gulê Dêran*, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>267</sup> Hemdo û Gelhê, *Mp3*, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

miriye dê bê jibîrkin, mîrov tenê hînî tunebûna wî/ê dibe û vê yekê qebûl dike. Pêvajoya şînê her çiqas normal û xwezayî be jî gelek zehmet e. Ji ber vê yekê pêdivî bi dem û piştgiriye heye.

Bi taybetî di kilamên Şakiro yên şeran de motîfên şînê berbiçav in. Di gazinên li dost û hevalan hatine kirin an jî nifirên ku li nayeran hatine kirin de mirov dikare rastî van motîfan were. Pêvajoya şînê bi rêya zêmaran ji devê jinê hatiye vegotin. Jina ku şînê datîne û zêmaran dibêje xwe wek “gulîbir” “porkur” û “reben” pênase dike. Lewre di çanda kurdan de jin di bûyerên mezin ên bi êş û keser de guliyên xwe dibirin. Ango birandina guliyên nîşana êş û keserên mezin e.

Di kilmên Şakiro yên ku mijara wan ji şer pêk tên de, kesên di encama şer û pevçûnan de têk çûne yan jî mirine, di atmosfera şînê de hatine vegotin. Di şînê de pêvajoya şer û mirina kesên bi awaz û şêweya zêmaran hatiye strîn. weke li jêr di mînakê de jî diyar e, sebebê kuştina yê têkçûyî ji devê xwişka wî hatiye bilêvkirin, ev sebeb jî xelabûna gule û barûdê ne, ne qelsbûn e. Ji ber vê yekê bira bang li xwişkê xwe da ku jê re fişenga bişînin. Ev yek di nav diyalogeke ku xwişk birayê xwe dide axaftin de pêk tê.

“ ...

Bi sê denga ban dikir,

Stî û Sîsin û Fedîlayê.

Go xwêngê, guliyê we kurkirî be,

Li dinyayê, tunebûna dinyayê,

Ji mêrê camêr ra tu cara qelsî nîn e lê dayê.

De rabe ca bike bilezîne,

Gule barût û fişeng û fişenglixê

Ji birayê xwe ra bişîne”<sup>268</sup>

Jin, dema ku agahiyên şer û pevçûnan an yên mirinê dibihîsin bi qîrîn û hawaran bertekê nîşan didin. Ji ber ku jin li himberî şer nikarin bibin asteng, neçariya xwe bi kurkirina porê xwe tînin ziman.

“ ...

Hedê digot Gulê rebenê tu rabe em ê serê xwe kur kin.

---

<sup>268</sup> Salihê Axê, Mp3, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)



Heft duzan û dozdeh kêran  
Şeva cewabekî neb'xêr hatiye dibêje li kozika wêran.  
Mala Emer Mala Şewêş  
Li hev anîne qira şêran û mêran bê heywayê.<sup>»269</sup>

Jina ku bêdil hatiye zewicandin û bi hesreta hezkiriyê xwe dijî. Ji ber bêşansi û qedera xwe ya reş şîne datîne. Di tunetiya hezkiriyê jinê de, der dor çiqas şên dibe bila bibe, ji bo wê xir û xalî ye. Li vir jî berteka jinê ya li himberî bêsihûdiyê bi birandina guliyan hatiye nîşandan.

“...  
Malxirabo tu delal î.  
Serê Çiyayê Omeriyê Kozikê Ehmediyê,  
Her çar gundê li dorê.  
Îro ji êvar da bi serê min gulîbira Xwedê da  
Hiştiye xik û xalî.”<sup>»270</sup>

Carinan kesên navdar ên ku di civakê de xwedî bandoreke girîng in, heger ji aliye hêzên desthilatdar ve bîr cezakirin an bîr girtin, ev yek di civakê de dibe sedema hin reaksiyonan. Ev reaksiyon di kilaman de bi motîfên şîne hatine hûnandin. Wek mînak dema ku Şêx Seîd tê girtin civak li himberî vê yekê nerazîbûna xwe nîşan dide û berpirsyarê vê yekê jî Mistefa Kemal dibîne. Ji ber ku qanûna girtina teke û zewiyeyan derxistiye.

“...  
Le bira tu gula şêxan î bira  
Piçûkê biran î bira  
Xuliyê di şewqan î bira  
Hêsîr û dilê destê Misto Kemal qanûna terse giranî bira  
Welatê xeribiyê derdekî pûç û bêderman î lo bira  
Hela bala xwe bidê heya dinya xweş û ava be  
Keder û keser û mereqa me hemûyan î loo bê hoyhoyy.”<sup>»271</sup>

<sup>269</sup> Gulê Dêran, *Gulê Dêran*, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>270</sup> Ha Wer Delal, <https://www.youtube.com/watch?v=DAMOqnk2WQk> 20.06.2013 (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

### 3.2.1.9. Xweza /Sirûşt

Şakiro, bi her awayê xwe dengbêjekî herêma Serhedê ye. Bi rîtm, awaz û mijarên xwe mînakên herî baş ên vê herêmê dihewîne di kilamên xwe de. Di warê mijaran de jî xweza ciyekî sereke digire.

Serheda ku xwediyê Çemê Muradê, Gola Wanê, çiyayên bilind, zozanên dewlemend, kaniyên pir û xwezaya hişk, sir û seqemî û nivê salê dibin berfê de, tim bûye kaniyeke gotinan ji bo dengbêjên me. Helbet çaxê tu behsa herêma Serhedê û dengbêjan jî dikî, Şakiro yek ji girîngtirîn navên ku tên bîra me ye. Di kilamên xwe de, tim behsa dewlemendiya xwezaya herêmê dike.

Di kilaman de zivistan, tim sembola rewşên neyînî ye. Ji bo mirinê, veqetandinê û nehezkirinê tê bikaranîn. Bihar jî berevajiyê zivistanê ji bo rewşên erênî tê bikaranîn. Wekî din, dar, kulîlk û şînahî jî bi piranî sembola evîn û evîndariyê ne.

weke ku li jêr jî hatiye diyarkirin, serdema biharê ye û berf bi ser gul û sosinan de dibare. Li vir gul û sosin hêviyan temsîl dikin, berf jî metaforeke di wateya şikestin û mirina hêviyên gihîştina evîndarê ye. Di wateya bêqederî û bêşensiyê de hatiye bikaranîn.

“... ”

Li welatê me hatiye pelê gulê û sosin

Rihan û leymûnê li me vebû.

Qedera min bi reş bû şansê min tune bû.

Berfekî li me barî.

Pelê gulê û sosinê ma di bin da.”<sup>272</sup>

Berf li ciyê bilind dereng dihele û ev yek di kilamên Şakiro de wek pêknehatina hêviyan hatiye simbolîzekirin lê berevajî vê yekê hêşînbûna gênim, destpêka biharê ye û bihar jî semboleke erênî ye û destpêka hêviyan e.

“... ”

Gelo li deştê genim hêşîn dibû

Li zozanên bilind ji bextê min û dîlbera min re

<sup>271</sup> Kekê Xiyasedin, <https://www.youtube.com/watch?v=r2els8-Eow4> 21.06.2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>272</sup> Sebrê, <https://www.youtube.com/watch?v=md5fUedI5UE> bnr. r.135, 12.06.2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

Teze belekê berfê heliya <sup>«273</sup>

Dîsa di hin kilaman de bêsihûdî û bêşansî bi mij û dûmana çiya, bi barana deştê hatiye taswîrkirin. Kesên ku ji jiyana xwe xêr nedîtîbin bi van rengên xwezayê derûniya xwe anîne ziman.

“ ...

Gelî gundî û cînarno, serê min serê xêrnediya bû.

Ez derketim çiyê, serê min xalî nabe.

Gelo vê sibengê ji mij û ji dûmanê.

Ê daketim deştê çavê xwe venakim,

Ji reşêşê ji baranê.”<sup>274</sup>

Gul, sosin, dar, qerenfil tev teşbîha evîndarê ne. Xweşîkbûna dildarê bi rêya van çîçek û nebatan hatiye taswîrkirin.

“ ...

Di mêrg û çîmenê mala bavê min da vê sibengê

Li ber gulê û sosinê

Rihan û leymûn

Dar û darçîn

Kok bi qerenfilê <sup>«275</sup>

Carina keç û qîz bi xwe, taswîra bejin, bal, bedewî û narîniya xwe dikan. van taybetmendiyên xwe dişibînin tayê rihanê ya ku li geliya de şax davêje.

“ ...

Elê bexê sibe ye, gelo vê sibengê

Ez ê ji rihana ne kin im, ne dirêj im

Fenanî tayê rihana ber zinara

Di dêrisê dev geliya de şax davêjim”<sup>276</sup>

<sup>273</sup> Dîlbera Min, Mp3, (Deşîfrekirin: Serdar Öztürk)

<sup>274</sup> Zerî Domamê, *Şalul û Bilbil*, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>275</sup> Esmera Şukri, *Kewa Gozel*, Çağdaş Müzik, İstanbul, bnr. r.114. (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>276</sup> Mehmet Bayrak, *Müzik, Dans û Şarqiyên Kurdî*, c.2, r.818

Di kilamên şeran de jinê ku şînê datînin, dixwazin têkçûyin û rewşa xedar bi hin sembolan li ber çavan raxin. Jin ji bo ku vê mebesta xwe bînin cih ji xwezayê sûdê digirin.

“ ...

Etekê Sîpanê tu dêhna xwe bidê vê sibengê

Mal xirabo lêmêja sibê bû

Min rebenê bala xwe berdayê

Lo konê mala bavê min de jor de hatiye xwar e”<sup>277</sup>

Ji bilî van mijaran zozan jî bi awayekî xwezayî, di kilaman de dibine qada seyranê, kêf û kêfxweşiyê, carinan jî dibine bedena jinê di kilamên Şakiro de.

“ ...

Tu nere nêçîrê pir gune ye

Hey bêbexto were bikeve nava taxima sing û berê min keçikê

Ê ji te re fenanî Mêrga Mamo, Kaniya Xanimê xweş yayle (zozan) ye”<sup>278</sup>

### 3.2.1.10. Rola Axa û Began / Civak

Axa, beg, şêx û rûspiyê kurdan di çareserkirina pirsgirêken cîvakî û takekesî de xweyê roleke girîng in. Kes an jî eşîretên ku ji ber mijarên pircure, di navbera wan de pirsgirêk dertên û nikarain van pirsgirêkan di nav xwe de çareser bikin, diçin xwe davêjên bextê axa û began da ku ji derdê wan re bibin çare. Axayê gundekî ji ber ku gundê xwe li himberî cîhana derve temsîl dike, helwesta wî ya li himberî biyaniya wek şerefa gund tê nirxandin. Ji ber vê yekê jî divê axa comerd be. Ji bilî vê di rojên penî de zilamên gund tên mêvanxaneya axa û li vir meseleyên rojane tên gotûbêjkin. Pirsgirêkên gund li ber axa tên nîqaşkirin û cîwan li vir fêrî tore û kevneşopiyan dibin.<sup>279</sup>

Di kilamên Şakiro de axa û beg wek stargeh hatine dîtin. Keça evîndar a ku dixwaze bigihîje dildarê xwe, ji ber neçariyê ji dildarê xwe dixwaze ku wê birevîne. Lê revandine keçekê di civaka kurdan de ew qas hêsan nîn e. Ev yek carina dibe sedema

<sup>277</sup> Min Rebenê, Mp3, (Deşîfrekirin: Serdar Öztürk)

<sup>278</sup> Hêlîna Quling, Mp3, (Deşîfrekirin: Serdar Öztürk)

<sup>279</sup> Martin Van Bruinessen, *Ağa Şeyh, Devlet*, weş. İletişim. Wer. Banu Yalkut, Stenbol, 2013, r.133-134.

şer û pevçûnên giran, ji bo ku ev yek pêk neyê û evîndar bigihîjin miradê xwe keçik ji dildarê xwe daxwaz dike ku bi destê wê bigire birevîne bavê bextê axayan.

“ ...

Hela were destê mîn bigire, birevîne  
Bavê ber bextê ax û axalerên Kurdistanê, berxo van begleran  
Eger gava ku bûye xwe bûye  
Lê gava ku nebûye  
Tu yê min bavê nava çiyayê Bingolê  
Nav êl-eşîra van koçera”<sup>280</sup>

Di kilameke din de dîsa keçik ji dildarê xwe dixwaze ku wê birevîne û bavê bextê Eliyê Feremez lê dildarê wê li dijî vê yekê dertê û Eliyê Feremez bi bêbextiyê tawanbar dike. Ji ber vê yekê dildarê keçikê dixwaze ku herin xwe bispêrin Ehsanê Mihemed Begê û heger ew jî nebe dê herin xwe bavêjên bextê her du lawê Hecî Hemzo. Lewre ew di wê baweriyêde ye ku çiqas mal û serweta her du lawê Hecî Hemzo hebe dê di oxira wan de be. Her du dildar vê yekê di nav hev de nîqaş dikin.

“ ...

Min got kuro delaliyo, tu rabe destê min bigire  
Min birevîne biavêja Şimplaka Jorîn.  
Şimplaka Jêrîn ber bextê Mala Eliyê Feremez,  
Gelo şewitiye ax li bexçe ye.  
Mîn got qîza bêbavan tu nizanî  
Mala Eliyê Feremez rabiye, ranebiye.  
Ji heft bavê xwe da bêbext e,  
Bextê Eliyê Tayê lo wan tune ye.  
Ez ê destê te bigirim, te biavêjime şewitiya Erzabê,  
Ber bextê Ehsanê Mehemed Begê rabûye ranebûye.  
Çi zava ye, xortekî ji xortê gede ye.  
Heke bûye jixwe bûye gava ku nebûye ez ê te biavêjime  
Ber bextê her du lawê Hecî Hemzo.  
Li şewitiya sikakê Goma Kevir gelo vê sibengê,  
Çiqas mal û serweta wan hebe, li oxira min û te ye.”<sup>281</sup>

<sup>280</sup> Mehmet Bayrak, Mehmet Bayrak, *Mûzîk, Dans û Şarqiyên Kurdî*, c.2, r.968

Carîna xeynî axa û began peyvirdarên dewletê yên wek walî û qeymeqam jî ji diladaran re bûne hêvî û ev yek di kilameke Şakiro de berbiçav e. Di vê kilamê de zilam dixwaze yara xwe birevîne û pêşiyê xwe bavêje bextê qeymeqamê Gergewşê, heger ku ew ji derdê wan re nebe çare, ew dê here derdê xwe ji waliyê Merdînê re vebêje û xwe bavêje bextê wî.

“ ...

Hela rabe vê sibengê ez ê destê te bigirim  
Birevînim bavê bextê Qaymeqamê Gergewşê  
Eger ku bûye bû, gava ku nebûye  
Bavê ber bextê Waliyê Mêrdînê  
Malxirabê ew ê bibê te Gewrê bi çi karî aniye?  
Ez ê bêjim waliyo mala te xirab be  
Malxirabo aqûbeta min û Gewrê bû aqûbeta  
Ûsif û Zelîxayê, Hesên û Belqîsayê  
Sebrê lo Mem û Zînê way ax ay”<sup>282</sup>

### 3.2.1.11. Lavakirin

Di kilamên Şakiro yên şerî de bergerîn ji hêla jinê ve hatiye kirin. Ji ber ku lavakirin an bergerîn, di civakê de ji bo pîvanên mêranyê şerm û qelsî ye. Ji ber vê yekê, bi gelemperî jinê lava kiriye da ku dijminê mala bavê jinê tu zirarê û kuştinê nede mala wê û mêrên mala bavê xwe biparêze. Jin xwe diavêje ber piyê dijminê xwe.

“ ...

Ez ê rabim xwe berdime pêşiya Bişarê Çeto,  
Bavê Şemo Cemîlê bira.  
Ez ê destê xwe bidim destan,  
Devê xwe bikim saqa vê gîzmeyê.  
Di bextê gora Çeto axa ketime,  
Tu yê derbekî li dest bermede,  
Bedena egîdê mala bavê min rebenê.”<sup>283</sup>

---

<sup>281</sup> Lê Lê Dîlber, [https://www.youtube.com/watch?v=qKk2fkiu\\_xs](https://www.youtube.com/watch?v=qKk2fkiu_xs) 21.06.2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>282</sup> Mehmet Bayrak, Mehmet Bayrak, *Mûzîk, Dans û Şarqiyên Kurdî*, c.2, r.115-1116.

<sup>283</sup> Bişarê Çeto, <https://www.youtube.com/watch?v=bwSdsEnHxeQ> 23.06.2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

Weke me di jor de behs kir ku jin di kilamên şerî de bergerîne dikin lê di kilamên evîne de ev dibe berevajî jî. Mêr jî ji bo evîna xwe lava dike. Ji Xwedê yan ji kesayetên olî lavaya gihîştina yarê dikin. Di vê kilama jêr de jî, li ber haciyên ku diçine Mekê û Medîneyê digere da duayan ji bo miradê dilê wî bikin ji bo bigihê yara xwe.

“ ...

Ez evdalê Xwedê gelo vê sibengê ketime li serê rê û dirban  
Minê xwe avête gelo heciyê ku berê xwe bidine Meke û Medîne  
Min got hûn ê vê rica û dileka miradê lo me her duya <sup>284</sup>

Di vê kilamê de, jina bi navê Nûrê, ji bo yar û pismamê xwe yî girtî xwe diavêjê ber piyê serokê dadgehê ku wî berde.

“ ...

Min qolê zêrê serê xwe qetandiye avêtiye pêşiyê lê domamê.  
Gidî min destê xwe dabû destan  
Devê xwe kiribû saqa vê gîzmêyo ser bi zêrê  
Digot lê lê Nûrê tu hatî çî rica lê lê çî dilekê (xwestek) domamê  
Got ceza reîso ez hatime Salihê pismam bidî xatirê  
Xwedê û pêxemberan xatirê li nikewnê (Mekke) lo pismamo. <sup>285</sup>

### 3.2.1.12. Şîret

Di çanda devkî û bi giştî jî di civaka kurdan de, şîret ji hêla mezinê malê ve tê kirin. Ev jî, bav, dê, serekeşîr, axa, mela, şêx... yekî bi emr û tecrûbe û zanîne li pêş wî/wê kesê yan wê komê be, mafê şîretdayîne jî bi xwe re dibîne. Ev yek di kilamên Şakiro de jî gelekî cîh girtiye ku çend mînakên wê li jêr in.

Di vê kilamê de kesê ku di şer de dijminê xwe dîl digire lê dema wî azad dike şîretan lê dike. Şîret jî ku li ser kevneşopiyên civaka xwe bimîne û bêbextiyan li kesî neke ye.

“ ...

Lawo vê sibengê, tu seyr bike malxirabo

<sup>284</sup> Delîl Yar, *Mp3*, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>285</sup> Saliho Pismam, *Mîrê Zirav*, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

Ji birayê piçûk ra dibêje  
Tu here min ê tu azad kirî,  
Tu ser urt û ocaxê mala bavê xwe bimîne,  
Tembîh û weyseta min li te be,  
Kesî ra neke şixula bêbextî ne.”<sup>286</sup>

Hin kesên ku di nav civakê de xwedî bandor in û tîen heskirin dibe ku di rojên teng da an jî di mirinê de neyên jibîrkirin û xwedî li wan derkevin. Ev yek di kilama jêr de wek şîret hatiye bilêvkirin.

“...  
Lawo bavê Behçet şêxê kubar,  
Emekdare, çi bû îro ketiye erdê temiya min li we be.  
Şîrheramiyê nankoriyê mekin,  
Terka cinyazê Bavê Behçet, siwarê felek  
Hey wax li min vî xweşmêrî medin”<sup>287</sup>

Kesên ku di rabirdûyê de bi kirinên xwe yên wek zilm û mêrkujiyê tîen nasîn, ji ber ku text û bextê wan ne yek e û divê mirov ji wana xwe dûr bigire. Dengbêjê me jî ev yek di kilamê de wek şîret bilêv kiriye.

“...  
Tembîh û weyseta min li te be  
Xwe bernede pêşiya wî deq û wî qewazî  
Wa zalima mêrekî kefirê bi deman e  
Şûrê xwe şandiye  
Bilîsê gîrê dayê bi diwazdeh kîsan e.  
Li ser şûrê wî dinivîse  
qesasê serê bîst û çar mêrê misilman”<sup>288</sup>

Di vê kilama evîndariyê de jî, di serî de lawik şîretan li yara xwe dike ku ew gotinên dibe ku li ser evîne ne, ji kesekî re nebêje da tu musîbet neyên serê wan. Lê di

---

<sup>286</sup> Hemdo û Gelhê, *Mp3*, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>287</sup> Bavê Behçet, <http://www.youtube.com/watch?v=5tWkMqPgifs> bnr. r.121, 17.06.2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>288</sup> Eliyê Pûrto, <https://www.youtube.com/watch?v=qxv-NXB4yDE> 21.06.2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)



dawiya kilamê de jî êdî keçik şîretan li mêr dike. Dibêje ku di hemberî konê me re derbas nebe yan nesekine da tu kes bi hestên me nizanibe.

“ ...

Dîlber gelo vê sibengê malxiravê tu serê xwe bişo  
Bê temaniya min li te be tu avê bê gidiyê tu car merêj  
Sebrê gelo ji gavê din da em tu mijûl bûne  
Ew xebera min ji te re gotiye tu carî tu ji kesekî re bê zalimê dîsa mebêj.”<sup>289</sup>

“ ...

Tembîh û weyseta min li te be.  
Lawiko li qarşî konê me nere  
Neyê berxo lo nesekine.”<sup>290</sup>

Dengbêjê me di kilmake din de şîreta têkilîdanînê bi kesên rind û qenc re dike û hişyariyê dide ku bi kesên pîs û miskîn re neyê xebardan. Lewre kesên rind û qenc mirov di civakê de serbilind dikin.

“ ...

Temiya min li te be, ji kêleka rinda ranebe.  
Li kêleka pîsan û miskînan  
Rûmenê tu caran qise meke, xeber nede”<sup>291</sup>

Kihêla ciwan, ter û bihêz, tu caran nabe weke bergîreke pîr û qels. Ev yek bi rêya biwêjeke wek şîret di kilameke de hatiye bilêvkirin.

“ ...

Kuro ocaxkoro temiya min li te be.  
Tu cara vê sibengê, bergîra li dewsa kihêla girê mede lo  
Ax welato tu xerab bî, xerab bî.”<sup>292</sup>

---

<sup>289</sup> Dilber, *Gulê Dêran*, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>290</sup> Asê, mp3 bnr. r.125. (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>291</sup> Serhedê, *Mîrê Zirav*, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>292</sup> Serhedê, *Mîrê Zirav*, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

### 3.2.1.13. Hêvî û Daxwaz

Mirov dikare hêvî û bêhêvîbûnê wek baweriya hestî ya derbarê îhtîmala ku dê di jiyana û rewşa yekî/ yekê ya takekesî de encamên erênî derkevin holê, pênase bike. Hêvî bi piranî sebrekê di nav xwe de dihevine her çiqas palpiştên dijber hebin jî baweriya xwe bi îhtimala bûyîna tîne.

Dengbêjê xweza û evîna Şakiro di vê kilamê de derdê girtiyan û hêvî û daxwaza serbestbûn û efûkirina girtiyekî bi navê Bavê Behcet dike mijara kilamê ku hikûmet wî serbest berde û were têkevê nav civakê. Kilameke civakî û polîtîk e. Kilameke şerî ye.

“ ...

Xwezil ji xêrê xweziyê di Xwedê ra,  
Xwedanxêrekî mizgîniyekî ji xêrê baniya,  
Bigota, efûya Bavê Behcet ji qapiyê hikûmatê derketiye.  
Bi çavê serê xwe bidîtiya fenaî cara  
Li qarşî xort û bendê di xerza”<sup>293</sup>

Di vê kilamê de jî berevajî kilama borî, seranser kilameke evîna ye û dengbêj daxwaz û hêvî ji Xwedê dike ku yara wî jê re bibe bermaliya wî û ew jî bibe malxweyê wê.

“ ...

Xwezî ji xêra Xwedê di Xwedê da,  
Tu ji min ra bibûyayî bermaliya mala giran.  
Ez ê ji te ra bibûma malxweyê li ber mala teze ye.”<sup>294</sup>

Di civakê de carna spehîbûna jinê ji bo mêrê wê dibe serbilindî. Di vê kilamê de heman tişt heye. Dengbêj jî hêviya hebûna jineke weke Seraya Mamed dike da di nav civakê de pê serbilind bibe û her kes pesnê wî bi wê jina xweşik bide.

“ ...

Yeke fenaî Seraya Mamed ax dosta mirov be  
Civatê mirov rûnê vê sibengê  
Nav civata mîran û hakimana de

<sup>293</sup> Bavê Behcet, <http://www.youtube.com/watch?v=5tWkMqPgifs> bnr. r.120, 17.06.2013. (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>294</sup> Lê Lê Dîlber, [https://www.youtube.com/watch?v=qKk2fkiu\\_xs](https://www.youtube.com/watch?v=qKk2fkiu_xs) 21.06.2013, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

Her kes meth û senaya dosta xwe bide vê sibengê  
Mirov ji xwe re metha Seraya Mamed Axa bide  
Nav heval û hogiran de qanatê (bask) mirov vebe mirov ji xwe re pê bifire.”<sup>295</sup>

Di vê kilamê de jî jina evîndar daxwaza bicîbûna miradê wê û dildarê wê ji şêx, ziyaret û ewliyayan dike.

“...  
Destê delîlê dilê xwe bigirim  
Qasekî bimeşim ser şêxan û ziyaretan  
Van şêxan, van meşhûran, reben ez im van evliyan.  
Ez ê destê xwe bavêm etekê şêxekî mezin  
Ziyareta giran, belkî ji ba Xwedê ricacî be  
Hewar Xwedê belkî biqedîne miradê miradxwazan  
Bi tevayê hasil bikin, miradê me her duyan.”<sup>296</sup>

### 3.2.2. Hunerên Vegotinê di Berhemên Şakiro de

Dema mirov li ser kilamên ku Şakiro gotine hûr dibe, bi hêsanî dikare bibêje ku pirtir kilamên evînê gotiye. Di van kilamên xwe de zewacên bêdil, evîndarên ku negihîştîne miradên xwe, hesreta dildaran, delaliya keçan û hwd. bi zimanekî wêjeyî, bi motîfên xwezayî xemilandiye û bi vî rengî pêşkêşî guhdaran kiriye. Di gelek kilaman de lehangan dide axaftin û mijarê di nav diyologekê de vedibêje. Heger mijar evîn be her du dildaran an jî kesên sêyemîn a/ê ku di mijarê de xwedî bandor e daye axaftin.

“...  
Devê xwe kiribû saqa vê gîzmê yo ser bi zêrê  
Digot lê lê nurê tu hatî çî rica lêlê çî dilekê domamê  
Got ceza reîso ez hatime salihê pismam bidî xatirê  
Xwedê û pêxemberan xatirê li nikewnê (Mekke) lo pismamo.”<sup>297</sup>

Xeynî kilamên evînîyê Şakiro gelek kilamên şer û mêraniyê jî gotine. Di van kilaman de dîsa heman rêbaz bi kar aniye û leheng dane axaftin. Ev leheng carinan du

<sup>295</sup> Serayê, <http://www.youtube.com/watch?v=CuNbavIvouc> 23.06.2013. (Deşîfrekirin: Serdar Öztürk)

<sup>296</sup> Mehmet Bayrak, Mehmet Bayrak, *Mûzîk, Dans û Şarqiyên Kurdî*, c.2, r.94

<sup>297</sup> Saliho Pismam, *Mîrê Zirav*, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

neyar in, carinan kesên ku di şerê nava her du neyaran de xwedî rol in, carinan jî keç û jinên ku di şer de li hewara mala bavê xwe diçin û şînê datînin in.

“ ...

Sibe ye Seyîdxan derketiye banê bi sê denga bang dikir sidiqê hecî mistefa begê  
Ez bextê gora bavê te ketime, pêşiya firarê me berde  
Gidî firar gunehne bira derbas be here.  
Ey malmîrat, tu nizanî çend salê me tamam bû  
Hikumeta cimhuriyetê li sirgun kirina çolix û çocixê birîna serê me digere  
E sidiqê hecî mistefa begê digot welle nabe billa nabe  
Min serê şêx bahdînê erdê dignugê sond xweriya tu car nabe  
Bi silametî di ser min ra derbas nabe.”<sup>298</sup>

Şakiro carinan di hin kilaman de peyvên kilamê dubare dike carinan jî hin qalibên jiber di kilamên cuda de bi kar tîne. Wek mînak; ji bo şaheseya dev û lêvên yarê, ev rêzên ku li jêrê ne, di şeş kilamên evîniyê yên Şakiro de, ku me jî raçav kiriye, hatine bikaranîn.

“ ...

Ramûsenî li dev û lêvê şekirîn yanaxê ehmedî  
Terzê di hakimî şemlê di erebî (diarivî) lê kerem kin”

Her wiha di pênc kilamên din de jî pesindayîn û taswîra bejn û bala yarê bi heman hevokan wiha hatiye bilêvkirin.

“ ...

Bejn zirave  
Çepil dirêje,  
Por kej e,  
Nav qendîl e.”

Şakiro weke ku mora xwe li kilamê bixe hema hema di her kilama ku ew dibêje de gotina “ vê sibengê” bi lêv dike. Dengbêj Zahiro vê yekê wiha dinirxîne û dibêje: “Şakiro dema kilamekê bibêje û di wê kilamê de peyvekê ji bîr bike, di şûna wê peyvê

---

<sup>298</sup> Lo Axawo, Mîrê Zirav, Çağdaş Müzik, İstanbul, bnr. r.127, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

de “vê sibengê” dişuxlîne.”<sup>299</sup> Xeynî “vê sibengê”, gotinên wek: “tu seyr bike”, “dilê rezîl”, “kotiyê mêran” jî gelek caran di kilamên cuda de hatine bikaranîn. Dema mirov li kilameke Şakiro ya ku di demên cuda de hatiye tomarkirin guhdarî dike mirov dikare bibêje ku heman kilam bi heman awayî negotiye, carîna peyv guherîne, carina jî ciyê hevokan guherîne, lê naveroka mijarê naguhere.

### 3.2.2.1. Analojî

Di hunera vegotinê de berî her tiştî analojî heye ku bingeha wê pêk tîne. Analojî, pênasirina çalakiyên mirovan a bi xwezayê ye.<sup>300</sup> Ango çaxê di vegotinê de hevok bi “mîna, fenanî, nola, weke” dest pê dikin û wê tevgera mirovan bi awayekî sembolîk an bi tevgerên xwezayê yan tevgerên bi lawiran bê şîrovekirin e.

Gurê har, mehîna tolaz, bejna weke spîndarekî, tayê rihanê... gelek şibandinê analojîk in ku di vegotina kurdî de ciyê xwe girtine.

Şakiro ku em dikarin wî wekî dengbêjê xwezayê bi nav bikin. Di kilamên xwe de tim van analojîyan bi kar tîne. Ji ber ku herêma Serhedê bi xwezaya xwe derdikeve pêş. Di kilaman de Şakiro ji hêla şibandinan ve dewlemend e. Ji hêla analojîyan ve em dikarin kilamên Şakiro bikin du beş; yek jê şibandin e ya dinê jî hêma ne.

Di şibandinê de, liv û lebatên mirovan bi guherînên xwezayê ango rewşên lawiran hatine binavkirin. “Di civakên kevnare de ev wekhevîkirin an muqayesekirin, bi baweriyê ve girêdayî ye. Xweza bi heyînên di nav xwe de, bi awayekî ku ji hev neyê veqetandin dihat dîtin.”<sup>301</sup> Lê bi demê re ev şibandin ji baweriyê veqetiya û ket nav çanda civakê. Di kurdî de jî ciyekî mezin girtiye ev şêwe şibandin. Heta em dikarin vê bi gelek daçekan nîşan bidin. Weke, fena, nola, wiha, wilo, werê, qasî, qey...

Di qada şer de, şerî ew qasî dijwar e ku tu kes nikare li hev bipirse û li hev xwedî derkeve. Her kes ketiye derdê xwe. Şakiro vê yekê di kilama jêr de mîna, mî û berxê ango dê û ewlad ku di civakê de du sembolên mezin in ji bo li hev xwedî derketinê, dide nîşandan.

“... ”

Gelo vê sibengê gerek îro Cemalverdiyê mêran bikujim.

Fenanî miya ku berxa xwe winda bike dê ewladê milê xwe biavêje

<sup>299</sup> Serdar Öztürk, “Hevpeyvîn: Dengbêj Zahiro”, 05.05.2013, Amed.

<sup>300</sup> Remezan Alan, “Kürt Şarkıları İçin Küçük Bir Poetika”, *War*, j. 2, Payız, Stenbol, 1997, r.19

<sup>301</sup> H.g. r.20

Hela danê hela danê egîtê mala bavê min nemayê hela danê”<sup>302</sup>

Di civaka kurdan de gur, sembola hovîtiyê, xwînrijandinê, kujeriyê ye ku di kilamên Şakiro de jî cî digire. Gotineke neyînî ye û tim ji bo dijmin tê bikaranîn.

“ ...

Her şeş kurê mala Ferê rabûn dajon fena guran  
Derbekê berdane ber pêşîra Ehmedê kinik biçûkê biran”<sup>303</sup>

Evîndar yarê dişibîne rihanê ku ne kin û ne dirêj e lê li ber zinaran şax davêje. Di serî de xwîner dibê qey ev rewşeke neyînî ye lê hevoka “ber zinara şax davêjê” ku ji bo şînahiyên ku zor peyde dibin tê gotin û yara wî jî yeke ku zû bi zû peyde nabe ye.

“ ...

Muhibê bejna te ne kin e ne dirêj e.  
Fena rihana dev geliya,  
Ber zinara şax davêje”<sup>304</sup>

Zilamê evîndar, ji bo yara xwe ya ku xwe nagihîne, yan yar wî naxwaze, şewata dilê xwe dişibîne “gurzê giyayê agir pêketî” yan “agirê darê palûtê” ku ev her du mînak jî, ji êşa ku pir zû gûr dibe û êşê belavdike, tê.

“ ...

Te dilê min kiriye vê sibengê malxirebê  
Gurzekî giyayê kode agir ji (siwêdê) bigire were,  
Binihêre tu dêhna xwe bidê,  
Ez ji te ra sond bixwim.  
Fenanî agirê darê palûtê,  
Kesek ji ber dilê rezîl nasekine.”<sup>305</sup>

Li jêr çawa evîndara xwe şibandibû yara ne kin û ne dirêj lê li zinaran peyde dibû, li vir jî dişibîne mehîna kihêl ku bi bejna xwe ya dirêj û zirav navdar e.

<sup>302</sup> Lo Axawo, Mîrê Zirav, Çağdaş Müzik, İstanbul, bnr. r.121-122. (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>303</sup> Mehmet Bayrak, *Müzik, Dans û Şarqiyên Kurdî*, weş, özge, c.3, Ankara, 2002, r.1747.

<sup>304</sup> Mehmet Bayrak, *Müzik, Dans û Şarqiyên Kurdî*, c.2, , r.965.

<sup>305</sup> Asê, mp3, Bnr., r.124, Deşîfrekirin: Zeki Gürür

“ ...

Kewa mine kubar e nazik û nazenîn  
Fenanî kihêlê, ji kihêlê ca bejn da”<sup>306</sup>

Berfa qûntaran, piranî ji bo berfa ku heta biharê li serê zinaran nahele re û tim belekî dixwiyê re tê gotin. Di vê hevokê de jî, dengbêj yara xwe dişibîne çîçeka ku di biharê de mîna berfinan di nav berfa serê zinaran de dixwiyê re dibêjê. Di heman çaxê de, ev çîçek zehmet peyde dibe ku yarê dişibîne.

“ ...

Gelo fenanî belekiya berfa qûntara çiyayî  
Na wele vê sibengê malxirabê  
Tu çîçega rexê vê belekiyê yî”<sup>307</sup>

### 3.2.2.1.1. Paraleliya Hêmayî

Paraleliya hêmayî, di pêvajoyên xwezayê de dîzaynkirina tevger û hestên mirovan e. Di vî warî de dişibe analojîyê lê ji bêpariya hevokên “fenanî, nola, wisa” cudatiyekê çêdike. Di kilamên Şakiro de jî mînakên di vî warî de hene<sup>308</sup>. Wek mînak:

Di vê kilama evînê de, dilê evîndêr dişibe hêlîna sîmir, ku teyrekî nedîtî ye û hêlîna wî li ser çiyayê Qaf e ku qûntara wî di nav ewrande ye. Teyrekî bêhempa ye. Evîneke kûr e. Ji bo zîlam e ev hêma. Lê di rêza çaremîn de jî vê carê mêr ji bo evîndara xwe hêmaya berxê bi kar tîne. Ger em bala xwe bidinê, gotinên “nola, fenanî...” nehatine bikaranîn.

“ ...

Ê de dewrê dewrê dewrê  
Ê de dewrê sibe ye, dilê min  
Hêlîna teyrê di sîmir e.  
Beroxê gidî bira lê nexista  
Sira sibê bayekî gur e”<sup>309</sup>

<sup>306</sup> Lê Delalîyê, Şalûl û Bilbil, Çağdaş Müzik, İstanbul, Deşîfrekirin: Zeki Gürür

<sup>307</sup> Mehmet Bayrak, *Mûzik, Dans û Şarqiyên Kurdî*, c.2, , r.772.

<sup>308</sup> Remezan “Alan, Kürt Şarkıları İçin Küçük Bir Poetika”, *War*, r.22

<sup>309</sup> Dewrê, Mp3, bnr., r.125. (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

Di vê hevokê de jî, zilam hêmaya kewê bi kar tîne ku yara wî bi kubarî û nazikiyê dişibe kewê.

“ ...

Di ser kewa xwe ya kubar ra

Li tu qîz û bûkê xelkê nakim”<sup>310</sup>

### 3.2.2.1.1.1. Pîvanên Dewlemendiye

Di civakên eşîrî û kevneşopî de aborî li ser du hîman disekine. Yek çandinî ye û ya din jî xwedîkirina heywanan e. Yek ji herêmên Kurdistanê yên ku herî zêde li vê pênaseyê tê jî Serhed e. Serhed bi erdnîgariya xwe herêmeke çiyayî ye. Çandinî ne pêşketî ye. Nexwe em dikarin bi rihetî bibêjin ku aboriya herêma Serhedê jî li ser xwedîkirina pez û dewaran e. Dewlemendî jî nexwe bi hejmara pez û dewaran tê zanîn. Ger pez û dewarên te pir bin tu dewlemend î, nexwe di civakê de tu dewlemendiya te nîn e. Şakiro jî dengbêjê herêma Serhedê ye û berdevkê civaka xwe ye. Herî baş jî ev rewş di kilamên wî de tê hîskirin.

Weke mînak di vê klama li jêr de jî kesê bi navê Şemo xwe bi hejmara mî û hespên xwe dipesînîne. Dayîna hejmara miyan ku heftsed in û hespên kihêlî ku donzdeh in, qîmetdana aboriya li ser heywanan e. Di vê kilamê de, di eslê xwe de Şemo, ji keçîka ku bi bedewiya xwe pesinê xwe dide û dilê wê ketiyê de dibêje ku ez xwediyê ev qas pez im û dewlemend im, bi vî awayî dixwaze li hember bedewiya keçîkê xwe bi dewlemendiya xwe biparêze.

“ ...

Hey malmîrat tu bala xwe bidê vê sibengê ez Şemo me

Xwedanê heftsed mîyê serê di çîyê, danzdeh keêlê serê tewlê me.”<sup>311</sup>

Di vê mînakê de jî, kesê dildar bi biryar e ku ew dê yara xwe nede tu kesî, û bi hin mînakan vê biryardariya xwe li ber çavan radixe. Berawirdkirina dewlemendiya Mistefayê Kin û Ehmed Begê Rihalî dike. Pesnê Mistefayê Kin bi hejmara pezê wî dide. Ji yara xwe re dibêje ku her çiqas Ehmed Begê Rihalî xwediyê dozdeh eşîran be

<sup>310</sup> Emro, Mîrê Zirav., Çağdaş Muzik, İstanbul, bnr. r.118. (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>311</sup> Nêçîrvano, Narîn, Çağdaş Muzik, İstanbul, bnr. r.117, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)



ku dîsa sembola dewlemendiyê ye, ez destûra çûyîna te an zewaca te bi wî re nadim. Li vir jî xwedîbûna ev qas eşîran jî ne pîrsgirêk e li pêşiya dilketiyan.

“ ...

Fena Mistefayê Kin xelkê beriya jêr,  
Siwarê diwazdeh berx û xwedanê diwazdeh pezî nêr e.  
Ezê te nadim ehmed begê rihalî,  
Mêrikê bavê diwazdeh eşîran e”<sup>312</sup>

### 3.2.2.1.1.2. Hesp

Di beşa pîvanên dewlemendiyê de me nîşan da ku, hebûna pez û dewaran weke nîşaneyê dewlemendiyê û hebûna hespê jî nîşaneyê mêraniyê û şerî ne. Di vê klama li jêr de jî, dengbêj ji dîtina hespê re sê wateyan dibîne. Xêr, şer an jî mizgînî. Nexwe di civaka me kurdan de hespek an agahiya xêrê tîne ku weke mînak ji şer sax vegeerê, an tîne talanê ku şer bi xwe re tîne an jî xebereke xweş ku weke mizgîniyekê ye bi xwe re tîne.

“ ...

Ez nizanim ew siwaran siwarê xêrê ne,  
Nizanim ew siwar siwarê şerê ne.  
Nizanim siwarê mizgînê ne”<sup>313</sup>.

Di vê klamê de jî, bi nîşandana hespê, zînê vala û zenga bi xwîn, qala şer û encama wê tê kirin, di vegeerê ji şer de heger zînê hespê vala be an jî bi xwîn be, ev jî tê wê watê ku siwarê hespê hatiye kuştin an jî birîndar bûye. Navên kuştîyan jî balkêş in. Hesên, Huseyîn, Elî û Muhammed. Cenabê pêxemberê me, pismam û zavayê wî û her du neviyên wî.

“ ...

Tu bala xwe bidê herçî hespê li meydana tînê nava malan  
Ez ji te ra sond bixwim zînê vala  
Zengo bixwîne hey wayê.  
Peyayê mala bavê min gulîbirê

<sup>312</sup> Delal, *66Awaz im*, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>313</sup> Hemdo û Gelhê, *Mp3*, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

Xencî xulama kuştine peyayê bi nav û nîşan.  
Hesen û huseyin elî û mehemed  
Her du zavayê teze dîl girtine<sup>314</sup>

Di kilameke din de pozbilindî û jixwehezkirina siwar bi rewşa hespê tê şîrovekirin ku dibêjê gelo ev hesp ji ber nala xwe an ji ber giraniya siwêr dikulê. Helbet di vir de giranî ne giraniyeke fizîkî lê giraniyeke navî û nasnameyî ye.

“...  
Mîn dî bêxwediya hespê di binê delîl da dikule,  
Ezê nizamim ji nalê nizamim ji bismêr e.  
Yeçîn nizamim ji giraniya siwarê.”<sup>315</sup>

Rewanî, bedewaî û bihêzbûna hespê ji bo xweyê wî şanaz, û serbilindî ye. Lewma jî di hin kilaman de pesn û pênaseya hespê hatiye kirin.

“...  
Binê wan da hespê seklavî ne,  
Navê wana navtajîn e,  
Simê wana simkodîn e,  
Dêlê wana dêlqamçîn e,  
Gerdenê wana zirav û êlîn e.  
Guhê wan kêvrîşkîn e,  
Hevrazan dibezînin  
Berjêran dixarînin.”<sup>316</sup>

---

<sup>314</sup> Gulê Dêran, *Gulê Dêran*, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>315</sup> Delal, *66Awaz im*, Çağdaş Müzik, İstanbul, (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

<sup>316</sup> Gulê, <http://www.youtube.com/watch?v=S1ZHOF3AR9A> 27.06.2013 (Deşîfrekirin: Zeki Gürür)

## ENCAM

Dengbêjên kurd bi sedsalan bi hebûna xwe, bi deng û zanîna xwe bûne “bîr”a civaka kurd. Bi hunera xwe di nava civaka xwe de cihekî taybet ava kirine. Car caran bi kilamên xwe pesnê mîr û begên kurdan dane, serê wan birine ber asîmanan. Car caran jî bi kilamên xwe ew rexne kirine û wisa kirine ku serê wan ji erdê ranebûye. Di dema şer de bi kilamên xwe wêrekî dane şervanan. Piştî şeran jî dîsa bi kilamên xwe dîroka şer nivîsandine ji nivîşên nû re ragihandine. Li pey kes û qewîmînen girîng kilam afirandine û bi vî rengî dîroka gelê xwe ya devkî ava kirine. Wan baş dizanibû ku lehengê mezin her gel e. Lewma jî dengbêj her di nava gel de bûne û jiyana rojane jî di kilamên xwe de hûnandine. Dema ku şer tune bûye jî dîsa jî hunera xwe pêşkêş kirine û bi vî awayî bûne berdevkê çand û wêjeya kurdan.

Ji ber ku çanda dengbêjiyê çandeke devkî ye, em der heqê dengbêjên kurd ên demên kevn de ne xwediyê agahiyên zêde ne, lewma jî dîroka dengbêjên ku em dizanin ji du sedsalan zêdetir nîn e. Her çiqas kevneşopîya dengbêjiyê li her çar perçeyên Kürdistanê belav bûbe jî, lê belê herêma Serhedê wekî kana dengbêjiyê ye. Heya îro li vê herême gelek dengbêj ghiştfîne. Di nav van dengbêjan de navê Evdalê Zeynikê, Gula File, Resoyê Gopala, Ferzê, Mistefayê Xelê Heyran û Pêroya Pêxûtê derdikeve pêş. Vê kevneşopiyê bi dengbêjên wek Huseyno, Şakiro, Zahiro, Mihemedê Beyro, Sidîqê Kanîreşê, Gazin û Saîde berdewam kiriye. Di nava van dengbêjên ku dengê wan heta roja îro hatiye de cihekî taybet yê Şakiro heye. Şakiro bi tona dengê xwe yê bilind, bi rêzkirina peyvan a li pey hev, bi hûnandina kilaman a jixweveberi û bikarnîna qaliban bala dengbêj û guhdaran kişandiye. Îro jî li vê heremê bi dehan dengbêj hunera xwe digel hemû zehmetiyên didomînin.

Sedsala 20an ji bo kurdên bakurê Kurdistanê bi êş, azar û qedexeyên li ser ziman, çand û nasnameya kurdî dest pê kiriye. Piştî salên 1990î qedexeyên li ser zimanê kurdî sist dibin û ji bo kurdan jî derfetên bikaranîna teknolojiyê ava dibin. Kurdan jî li Tirkiyeyê dest bi weşandina kovar, rojname û pirtûkan kir. Vê yekê rê li ber lêkolînan vekir. Ji aliyê din ve hunermendên kurd bi awayekî fermî dest bi amadekirin û weşandina kasetên kurdî kirin. Bi vê yekê derfeta mayindebûn û belavbûna dengê dengbêjên kurdan zêdetir bû. Bi vekirina hin saziyên kurdî ji dengbêjiyê û dengbêjan re qadeke nû vebû. Helbet ev yek azadiyeke bi sînor bû.

Ev xebat jî li ser yek ji dengbêjên navdar yê sedsala bîstan Şakiro hatiye amadekirin. Di destpêka xebatê de ji bo ku mijar baştir bê fem kirin li ser çanda devkî û dengbêjiyê hate rawestîn. Ji xebatên ku di vî warî de hatine kirin sûd hate wergirtin. Me

dît ku di nava kurdan de xebatên ku li ser çanda devkî hatine kirin kê in. Yên ku hatine kirin jî mirov dikare di çarçoveya berhevokan de binirxîne. Di vî warî de pêdivî bi xebatên kûr û akademîk heye. Ji bo vê yekê jî divê li zanîngehan beşên bi mijarê re têkildar bêne vekirin û di bin van banan de xebatên akademîk bi rêk û pêk bên kirin.

Bi taybetî piştî hilweşîna beg û mîrekiyên kurdan dengbêjên kurdan jî bê stare mane. Pirsgirêkên aboriyê rê li ber dengbêjan girtine. Gelek dengbêj neçar mane ku ji bo debara xwe bi kar û barên din re mijûl bibin. Dengbêjî êdî ji dîwanan derketiye û daketiye şevbûhêrkan û dawetan. Vê yekê rûmeta dengbêjan û dengbêjiyê hinekî kê in. Dengbêj Şakiro ji ber lê xwedîderneketina kurdan a li dengbêjan gazinan dike. Daxwaza hevpeyvînê ya rojnameger û lêkolîneran napejirîne. Lewma jî agahiyên nivîskî yên der barê Şakiro de gelek kê in. Agahiyên der barê jiyana wî de me ji hin gotar û pirtûkan wergirtin lê bêhtir agahiyên devkî ne. Me ji bo vê xebatê di serî de bi birayê wî Said Deniz û lêkolîner Ahmed Aras re hevpeyvîn çêkirin. Şakiro di demên cuda de li Agirî, Erzirom, Mûş, Edene û Îzmîrê jiyaye. Nav û dengê wî li her çar perçeyên Kurdistanê û li welatên din ên ku kurd lê dijîn belav bûye.

Şakiro tenê kilamên xwe negotiye lê belê kilam a kê dibe bila bibe dema ku Şakiro kilam gotiye, wî bi dengê xwe ew kilam xemilandiye û tama xwe daye kilamê. Carinan jî bi awayekî xwezayî peyv û qalibên xwe li kilamê zêde kiriye. Wek mînak gotina “Vê sibengê” weke mora wî di her kilamê de derbas dibe. Qalibên ku Şakiro bi kar anîne jî hêjayê lêkolînên taybet in.

Şakiro ji xeynî kilamên şeran bêhtir kilamên evînî gotiye. Di van kilaman de li aliyekî xweşikiya jinê, hezkirin û dilşadî; li aliyê din gazin, nifir, lava, şîn û êşa dilan bi awayekî herikbar, bi awaz û bi hestiyarî aniye ziman. Şakiro ji aliyê şeweyê ve rêbazên cuda bi kar aniye. Wekî mînak dema ku behsa çîrok an jî bûyerekê dike lehengan dide axaftin. Ev leheng carinan du dildar in, carinan du neyar in, carinan jî kesên sêyemîn in. Her wiha mirov dikare di kilamên Şakiro de erdnîgariya Serhedê, lawir û nebatên cuda jî bibîne. Taybetiyên herêman binase. Navên gundan û bajaran bibihîse. Bi vî rengî di kilamên Şakiro de erdnîgarî jî hêjayî xebatên akademîk e.

Şakiro her çiqas neçûbe xwendîgehê jî di warê dengbêjiyê de perwerdehiyê baş dîtiye. Lewma jî dema ku şakiro kilamekê dibêje weke ku perwerdehiya muzîkê û notayê dîtibe dibêje. Dengê xwe rast bi kar tîne. Qada dengê wî yê tenor berfireh e, ji ber vê yekê jî dikare derkeve dengên herî bilind. Dema vê yekê dike jî detone nabe û kilaman rast dixwîne. Li hêla din Şakiro di kilamekê de carinan sê meqam bi kar anîne. Dema ku ew meqaman diguherîne detone nabe. Ji aliyê muzîkê ve ev yek ne hêsan e.

Em ne pisporên muzîkê ne lê em hêvî dikin ku di demên pêş de ji aliyê muzîkê ve xebatên berfirehtir li ser Şakiro bîn kirin.

Di vê xebatê de muzîka kurdî ya gelêrî di çarçoveya kilamên dengbêjan de, bi kurtî be jî, hat nasandin û dabeşkirin. Ji bo her cureyê kilaman mînakên kurt hatin dayîn.

## ÇAVKANÎ

### ÇAVKANİYÊN PIRTÛKAN Û GOTARAN

Adak, Adurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2013

Aksan, Doğan, *Her Yöniyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim*, weş. Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 2000

Alan, Ramazan, *Bendname*, weş. Avesta, İstanbul, 2009.

-----, “Kürt Şarkıları İçin Küçük Bir Poetika”, *War*, j. 2, payiz, İstanbul, 1997

Altay, Derya, “Küresel Koyün Medyatik Mimari Marshall McLuhan”, *Kadife Karanlık*, amd. Nurdoğan Rigel û hwd. Weş. Su, İstanbul, 2005

Altusser, Louis, *İdeoloji ve Devletin İdeolojik Aygıtları*, wer. Yusuf Al, Mahmut Özışık, weş. İletişim, İstanbul, 1989

*Antoljiya dengbêjan*, Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, c.1, Stenbol, 2007

Aras, Ahmet, “Şahê Dengbêjan Şakiro Vefat Kir”, *Ronahî*, j. 58, 29 Hezîran-5 Tîrmeh 1996

-----, “Evdalê Zeyniikê Lirîzma Kurdî Gihandiye Dereceya Herî Bilind”, *Nûdem*, hevpeyvîn, Mustafa Aladağ, j. 23, Stockholm, 1997

-----, *Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê*, Bîr, j.7, 2007 Stenbol,

-----, *Evdalê Zeynikê*, Weş, Deng, Stenbol, 1996

Asman, Jan, *Kültürel Bellek*, wer. Ayşe Tekin, weş. Ayrıntı, İstanbul, 2001

Atli, Mehmet, “Daha Ne Kadar Geleneksel Birikimi Tuketecegiz”, *Tîroj*, j.4, İstanbul, 2004

Azîzan, Herekol, “Klasîkên Me”, *Hawar*, j. 33, weş. Nûdem, Stockholm, 1998

Jwaideh Wadie, *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi*, wer. İsmail Çekem, Alper Duman, weş. İletişim, İstanbul, 2009

Bakhtin, Mikhail, *Karnavaldan Romana*, wer. Cem Soydemir, weş. Ayrıntı, İstanbul, 2001

Batur, Rahmi, “Şakiro İlk Kez Stüdyoya Girdi”, *Özgür Yaşam*, j.4, İstanbul, 1995

Batuş, Gul, “Neil Postman, İnsan Aklinin Kendi yarattığı Teknoloji ile Dostluk Arayışı”, *Kadife Karanlık*, amd. Nurdoğan Rigel û hwd. Weş. Su, İstanbul, 2005

Bayrak, Mehmet, *Mûzîk, Dans û Şarqiyên Kurdî*, weş, özge, c.2, Ankara, 2002

-----, *Mûzîk, Dans û Şarqiyên Kurdî*, weş, özge, c.3, Ankara, 2002

Bazîdî, Mela Mehmûdê, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye*, amd. Jan Dost, Weş. Nûbihar, İstanbul, 2012

Bedirxan, M.Celadet, “Le Folklore Kurde ”, *Hawar*, j. 3, amd. F. Ceweri, weş. Nûdem, Stockholm,

Benjamin, Walter, “Hikâye Anlatıcısı”, *Son Bakışta Aşk*, amd. Nurdan Gürbilek, wer. Nurdan Gürbilek, weş. Metis Yayınları, İstanbul, 1995

Bingöl, Osman Doğu, *Günümüz Kent Yaşamında Sözlü Kültürün Yeni Sanatsal İfade Aracı Olarak Kullanımı*, Yıldız Teknik Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Sanat ve Tasarım Anasanat Dalı (Teza Lisansa Bilind ya Çapbûyî), İstanbul, 2006

Bois, Thomas, “Anonim Kürt Halk Edebiyatı”, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, amd. Mehmet Bayrak, c. I, wer. B. Peker, weş. Özge, Ankara, 2002

Bozkurt, Güvenç, *İnsan ve Kültür*, weş. Remzi Kitapevi, İstanbul, 1984

-----, *Kültürün ABC'si*, weş. YKY, İstanbul, 2011

Bruinessen, Martin Van, *Ağa Şeyh, Devlet*, weş. İletişim. Wer. Banu Yalkut, İstanbul, 2013

Burkay, Kemal, *Geçmişten Bugüne Kürtler ve Kürdistan*, weş. Deng, İstanbul, 1992

Celîl, Oedîxanê, Celîl, Celîlê, *Zargotina Kurda*, c. II, weş. Naûka, Moskova, 1978

Cewarî, Nûra, “Di folklorê de jin û jiyan”, *Tîroj*, j.20, İstanbul, 2006

-----, “Ermenistan’daki Kürtler’in Halk Şarkıları Dalı ve Sistemi”, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, wer. A. Gernas, amd. Mehmet Bayrak, c. I, weş. Özge, Ankara, 2002

Christensen, Dieter, “Kürtler’in Müziği”, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, amd. Mehmet Bayrak, wer. Huri Tuşık Özkurt, c. I, weş. Özge, Ankatra, 2002

Cindî, Hecîyê, *Kılamên Cimeta Kurda*, weş. Lîmûş. Yerêvan, 2008

Cizîrî, Şerefyan, *Kultur û Edebiyata Devkî*, weş. Nûdem, Stockholm, 1999

Claude Levi-Strauss, *Irk, Tarih ve Kültür*, wer. Arzu Oyacıoğlu, Reha Erdem û nd., weş. Metis İstanbul, 2007

Connerton, Paul, *Toplumlar Nasıl Anımsar*, wer. Alaeddin Şenel, weş. Ayrıntı, İstanbul, 1999

Çamlıbel, Ehmed Cengîz, *Evdalê Zeynikê*, weş. Deng, İstanbul, 2005



Çîfçî, Tekîn, *Di Kilamên evînî Yên Dengbêjan De Temaya Jinê*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artuklu, Enstituya Zimanên Zindî, Teza Lîsansa Bilind ya Çapnebûyî, Mardin, 2013

Çoban, Barış, “Aynalar Şovalyesi Ya Da Bilinç Dışının Kaşifi Lacan”, *Kadife Karanlık*, amd. Nurdoğan Rigel û hwd. Weş. Su, İstanbul, 2005

Dit, Nedim, “Dengbêj Geleneğinin Sonu Ya Da Bu Geleneğin Son Halkası: Reso”, *Bîr*, j.6, Zivistan, İstanbul, 2007

Ellul, Jacques, *Sözün Düşüşü*, wer. Hüsamettin Arslan, weş. Paradigma, İstanbul, 2004

El-Salihi Nureddin, “Kürdistan’da Müzik”, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, amd. Mehmet Bayrak, wer. Huri Tuşık Özkurt, c. I, weş. Özge, Ankatra, 2002, r. 168

Erhat, Azra, *Sevgi Yönetimi*, weş. Can, İstanbul, 2003

Farqînî, Zana, “Navê Stranan”, *Jiyana Rewşen*, j.3, Berfanbar, 1996, Stenbol

Görkem, İsmail, *Halk Hikayeleri Araştırmaları*, weş. Akçağ, 2008, Ankara

Gülsoy, Derya, “Medyanın Altyapısına Muhalif Bir Yolculuk, Noam Chomsky”, *Kadife Karanlık*, amd. Nurdoğan Rigel û hwd. Weş. Su, Stenbol, 2005

Gültekin, Mehmet, *Zargotina Kurdên Serhedê*, weş. Avesta, İstanbul, 2013

Haymes, Edward R, *Sözlü Destan Sözlü Şiir Araştırmasına Bir Giriş*, wer. Ali Çelik, weş. Türk Dil Kurumu, Ankara, 2010

Hikmet, Bedran, “Dengbêj Geleneği”, *İnatçı Bir Bahar Kürtçe ve Türkçe Edebiyat*, amd. Vecdi Erbay, weş. Ayrıntı, İstanbul, 2012

Izady, Mehrdad R., “Kürtler ve Müzik”, *Kürt Müziği*, Edîr. Abdullah Keskin, wer. Mutlu Öztürk, weş. Avesta, İstanbul, 1996

İnce, Özdemir, “Yaşar Kemal ile Soyleşi”, *Radikal*, 17-18 Gulan, 2002

Jiyan, Rênas, *Ji Şevê Re*, weş. Belkî, Stenbol, 2008

Katar, Dicle Yıldız, *Kürt sözlü Kültüründe Kadın Dengbêjler: Ayşe Şan ve Meryem Xan*, Yakınođu Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, İletişim Anabilim Dalı, (Teza Lisansa Bilind ya Çapnebûyî), Kıbrıs, 2011

Kayran, M. Zahir, “Kürt Folkloründe Dengbêjlik Geleneği”, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, amd. Mehmet Bayrak, weş. Özge, Ankara, 2002

Kevırbırî, Salihê, *Filîtê Quto, 20 kilam&20Qewimîn*, weş. do, wer. Şerif Derince, Stenbol, 2009

-----, “Kewê Ribat û Şahê Dengbêjan: Şakiro”, *Gulistan*, j. 4, 2002

-----, *Sedsala Qêrînekê Karapetê Xaço*, wer. Şerif Derince, weş. Do, 2009

Kıran, Zeynel, *Saussure'den Günümüze Dilbilim Akımları*, weş. Yabancı Diller Kitap ve Yayın Merkezi, Ankara, 1986

Kızıldemir, Zülfikar, “Kürt Halk Şarkılarında Sosyal İletişim İşlevi”, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, amd. Mehmet Bayrak, c. I, weş. Özge, Ankara, 2002

Kızılkaya, Muhsin, *Kayıp Divan*, weş. İletişim, ç.3, İstanbul, 2001

Köker, Eser, *Kitapta Kurutulmuş Çiçekler*, weş. Dipnot, Ankara, 2010

Lluhan, Marshall Mc, *Gutenberg Galaksisi*, wer. Gül Çağlı Güven, weş. YKY, İstanbul, 2007

Manguel, Alberto, *Okumanın Tarihi*, wer. Füsün Elioğlu, weş. YKY, İstanbul, 2010

Mazî, Çiya, “Staranên Dengbêjan Ên Zêmarî”, *Zend*, j. 6, Stenbol, 1999

Mojab, Shahrzd, *Devletsiz Ulusun Kadınlar, Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar*, wer. F. Adsay, S.Kılıç, E. Uşaklı weş. Avesta, İstanbul, 2005

Mutlu, Erol, “Kürt Müziği Üzerine”, *Kürt Müziği*, Edîr. Abdullah Keskin, eş. Avesta, İstanbul, 1996

Nezan, Kendal, “Kürt Müziği”, *Kürt Müziği*, Edîr. Abdullah Keskin, wer. Necdet Hasgöl, weş. Avesta, İstanbul, 1996

-----, “Kürt Müziği”, *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları*, amd. Mehmet Bayrak, wer. Necdet Hasgöl, c. I, weş. Özge, Ankara, 2002

Nikitin, Bazil, *Kürtler*, weş. Deng, İstanbul, 1991

Ong, Walter J., *Sözlü ve Yazılı Kültür*, wer. Sema Postacıoğlu Banon, weş. Metis, İstanbul, 2010

Öz, Süleyman, *Doğu ve Güneydoğu Anadolu Sözlü Kültüründe Hikaye Anlatıcılığı*, Mimarsinan Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü (Teza Lisansa Bilind ya Çapnebûyî), İstanbul, 2003

Parılı, Abidin, *Dengbêjler, Sözüin Yazgısı*, weş. İthaki, İstanbul, 2006

-----, “Cih û Girîngiya Dengbêjiyê Di Muzika Kurdî De”, wer. Samî Berbang. *Zend*, zivistan, 2007

Poshe, Chiristin, “Kürt Müziği”, *Kürt Müziği*, Edit. Abdullah Keskin, werg. Kerem Özdemir, weş. Avesta, İstanbul, 1996

Alakom, Rohat, *Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan*, weş. Nûdem, Stockholm, 1994

Ronî, Miraz, “Dengbêjlik ve Edebiyat”, *Înatçı Bir Bahar Kürtçe ve Türkçe Edebiyat*, amd. Vecdî Erbay, weş. Ayrinti, İstanbul, 2012

Ruth Benedict, *Kültür Örüntüleri*, wer. Mustafa Topal, weş. Öteki Yayınları, Ankara, 1999

Sancar, Mîthat, *Geçmişle Hesaplaşma*, weş. İletişim, İstanbul, 2010

Sanders, Barry, *Oküzün A'si*, wer. Şehnaz Tahir, weş. Ayrinti, İstanbul, 2010

Saussure, Ferdinand De, *Genel Dilbilim Dersleri*, wer. Berke Vardar, weş. Multilingual, İstanbul, 1998

Sokolov, Yuri M., *Folklor, Tarih ve Kuram*, wer. Yerke Özer, weş. Geleneksel, Ankara, 2009

Sontag, Susan, “Susmanin Estetiği”, *Sanatçı Örnek Bir Çilekeş*, amd. Yurdanur Salman û Müge Gürsoy Sökmen, weş. Metis, İstanbul, 2008

Uygar, Yusuf, *Kültürel Belek ve Dengbejlik: Doğu Anadolu'daki “Dengbejlik” Geleneğinde Bellek Üretimi*, Mimar Sinan Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Sodayoloji Ana Bilim Dalı (Teza Lisansa Bilind ya Çapnebûyî), İstanbul, 2009

Uygun, Nermin, *Dilin Gücü*, weş. YKY, İstanbul, 2011

Uzun, Mehmed, *Dengbêjlerim*, weş. Gendaş, İstanbul, 2005,

-----, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, weş., İthaki, İstanbul, 2010

Yağcı, Murat, *Sözlü Kültürden Yazılı Kültüre ve Elektronik Kültüre Geçiş Süreçlerinde Düşünsel ve Toplumsal Değişimler*, Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Halkbilim (Etnoloji) Anabilim Dalı (Teza Lisansa Bilind ya Çapnebûyî), Ankara, 2005

Yaş, Zeynep- Akyol, Hilmi, *Ez Eyşe Şanım*, Enstituya Kelepûre Kurdî, Duhok, 2009

Yıldırım, Kadri, Pertev, Ramazan, Aslan, Mustafa, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weş. Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü, İstanbul, 2013

Zinar, Z., “Sitrana Kurdî û Pêvajoya Wê ya Dîrokî”, *Nûdem*, j. 21, Stockholm, 1997

## ÇAVKANİYÊN ÎNTERNETÊ

Çelebi, Nezan Newzat, Yıldırım, Vedat: Aktaş, Aytakin G.: “Geleneksel Kürt Müziğine Genel Bir Bakış” [http://www.bgst.org/muzik/yazilar/geleneksel\\_kurt\\_muzigi.asp](http://www.bgst.org/muzik/yazilar/geleneksel_kurt_muzigi.asp), 12.09.2012.

Elegez’in Büyülü Kadın Dengbêjleri

[http://www.ozgurgundem.com/?haberID=15799&haberBaslik=Elegez%27in+b%C3%BCy%C3%BCl%C3%BC+kad%C4%B1n+dengb%C3%AAjleri&action=haber\\_detay&module=nuce](http://www.ozgurgundem.com/?haberID=15799&haberBaslik=Elegez%27in+b%C3%BCy%C3%BCl%C3%BC+kad%C4%B1n+dengb%C3%AAjleri&action=haber_detay&module=nuce) 17.09. 2012

Yıldırım, Vedat: “Metropolleşme ve Türkiye’deki Kürtlerin Müziği”

<http://www.daplatform.com/news.php?nid=471>, 20.02. 2012,

Çelebi, Nazan N.: “Kürt Müziğinde Dengbêjlik”

<http://www.daplatform.com/news.php?nid=12757&PHPSESSID=cb857d26a3d3003f09eb56001f5272b1>, 10.02. 2012.

Beğik, Mahmut: “Şakiro (1936- 1996)” <http://www.kovarabir.com/tag/dengbej/>

13.11.2012

Dengbêj Ebdurehîmê Mûşî “Antolojî Ya Dengbêj Şakiro”

[http://www.ufkumuz.net/3685\\_ANTOLOJICirc- YA-DENGBECircJ-SAKIRO-.html](http://www.ufkumuz.net/3685_ANTOLOJICirc- YA-DENGBECircJ-SAKIRO-.html)

20.04. 2013

Zuaxpayic, Orhan, “Şêx Said Hareketinden Bir Portre: FarqÎnli Şêx Faxri Bokarkî’nin Yaşam Öyküsü”, <http://www.kovarabir.com/tag/sex-fexri/> 1 Avrêl 2013.

Gernas, Arama: “Ferzende Beg” <http://www.kovarabir.com/arama-gernas-ferzende-beg/>  
7.04.2013

## **RÖPORTAJ**

Öztürk, Serdar, “Hevpeyvîn: Dengbêj Silhedin”, 29.05.2012, Mûş

-----, “Hevpeyvîn: Dengbêj Yaqûp”, 29.05.2012, Mûş

-----, “Hevpeyvîn: Dengbêj Seîd”, 29.05.2012, Mûş

-----, “Hevpeyvîn: Dengbêj Necmeddîn”, 29.05.2012, Mûş

-----, “Hevpeyvîn: Dengbêj Kesê”, 29.05.2012, Mûş

-----, “Hevpeyvîn: Zeki Badıkanlı”, 12.08.2012, Manisa

-----, “Hevpeyvîn: Abdulkerim Guner”, 17.03.2013, Mûş

-----, “Hevpeyvîn: Ahmet Aras”, 10.08.2012, İzmir

-----, “Hevpeyvîn: Dengbêj Zahiro”, 05.05.2013, Amed

-----, “Hevpeyvîn: Sadık Kandil”, 29.03.2012, Mûş

-----, “Hevpeyvîn: Said Deniz”, 09.08.2012, İzmir

-----, “Alaaddin Aykoç”, 20.09.2012, Stenbol

-----, “Hevpeyvîn: Zelal Gökçe”, 15.09.2012, Stenbol

Öztürk, Serdar, “Hevpeyvîn: Musataf Demir”, 14.02. Amed

-----, “Hevpeyvîn: Veysi Varlı”, 20.05.2013 Amed

-----, “Hevpeyvîn: Mizgîn Tahir”, 10.03. 2013 Amed

-----, “Hevpeyvîn: Alaaddin Aykoç”, 20.03. 2012, Stenbol

-----, “Hevpeyvîn: Dengbêj Gazin”, 10.10.2012, Wan

-----, “Hevpeyvîn: Dengbêj Saide”, 11.10.2012, Wan

-----, “Hevpeyvîn: M.Metîn Barlik”, 29.05.2012, Mûş

-----, “ Hevpeyvîn: Dengbêj Elîcanê Pasurî” 12.03.2013, Amed

-----, “Hevpeyvîn, Dengbêj Tehsînê Pasurî”, 12.03.2013, Amed

## PÊVEK

Deşîfrea hin kilamên Şakiro yên ku me jê sud wergirtiye û hin beşan jê girtiye li jêr hatine dayin lê dibe ku hin peyv xelet hatibin femkirin û nivîsandin. Ji ber vê yekê em ji niha ve lêborîna xwe ji dengbêj û lêkolîvanan dixwazin.

### **ESMERA ŞUKRÎ**

*Lê lê esmer di kavlê gunda da minê tu xêr nedît ji vî dilî*

*Esmer heyran gelo minê tu xêr nedît, ji te ji xwe ji vî dilî.*

*Gidîno bejna esmera Şukrî bînbaşîya qîzan û bûkan fenanî tayê rihanê malxirabo*

*Di mêrg û çîmenê mala bavê min da vê sibengê*

*Li ber gulê û sosinê*

*Rihan û neymûn*

*Dar û darçîn*

*Kok bi qerenfilê*

*Bi pelê sihê û pêcekî ra da ditîdo argê mala Ereb Axa*

*Li ber bêxwedîya piltanê bi heftu du terza dixemilî*

*Esmer temam derd û kulên te ne li min, li vî dilî*

*Sala par vî çaxî va tuyê derdekî puşiyê bêderman li bedena min peyda kir*

*Ezê li bajaran geriyam*

*Li bajara diyarbekir, li ser doxtor û hekîman*

*Ser tebîbên di dewletê...*

*Min got doxtoro bi tekim tuyê bi Xwedê kî*

*Tuyê dermanekî li min li vê birînê kî*

*Got mala te xerab be,*

*Herçî kesê ku tîra eşqê li serê dilê wî bixîne*

*Dermanê birîna wî li ba min nîn e, tîra eşqê di serê dilê te da dermanê birîna te tunî ne.*

*Minê xwe berdabû welatek ji welatê me serhedê.*

*Orta her çar malê, malbatê rastî bejna zirav dihatim*

*Min dît serê şuştî, porê şilî*

*Tev zalimê kuzê destan, jêrî milî*

*Ber bi kaniya biniya mala Ereb Axa berjêr dimeşîya gundo lê dimilmilî*



Minê destê xwe dabû destan, pêçiyê xwe avête nava dêmê gulê  
 Ramûsenek li dêmî gulê yanaxê ehmedî  
 Terzê di hakimî şemlê di erebî (diarivî)  
 Xal û xetê di gerdenê xebxebkê ber guhara nîşanê nava zivistanan lê kerem kir.  
 Gelî gundî û cînarno ezê dihatim ser kêvir da qet tu kemla xortanî  
 Emrê çardeh salîkî taqeta di ewilî dilo dilo dilo  
 Bê rebeno dilo hêsîro, dilo tengezar û stûxwaro  
 Dilo bi roj û bi kêf e eşq û şevê nivê di şevê  
 Serê xwe diavêje xewa şêrîne  
 Malî xerab, dilê rezilê min dil tê da dikeve bîrê vê sibengê  
 Serê xwe ji xewa şêrîn bilind dike.  
 Alîkî bi derd û şeş ba bi kulê  
 Fenanî mîşê bidlîs kela mêrsînê fenanî purteqalê Dortyolê  
 Fena tiriyê şewitî tersusê fenanî henarê Bênacukê  
 Fenanî sêvek ji sevê welatê me serhedê di Xelatê  
 Fena guzek ji guzê şewitiya Cewazê kaçik û teniko reben ezim bi kakilo  
 Bê esmer esmer were  
 Tev zalimê vê sibengê çavên min rêka dêrî diqerimî  
 Qet tu kametê şêrîn kengê ji mal derkeve dere  
 Min dît ji birca belek derket devre te li serî şara zere  
 Gidîno te li paştê xas kember e, şam û qutiyê Helebê  
 Li bejna tenik û zirav bû qenter e.  
 Hûnê pirsra esmera delal ji min dikin,  
 Di lingan de qundura Entapê çar tiliya bilind e,  
 Reben ezim nikare pê zû were  
 Gelî gundî û cînarno  
 Hûnê ji min dipirsin dibêjin esmer yeke bi çi rengî bû  
 Tu ji bo esmera xwe kûr dinalî  
 Esmer yeke  
 Bejn zirave,  
 Çav bi kile,  
 Biskû têt e,  
 Çepil dirêje,  
 Por kej e,

*Nav qendîl e,  
Xwîn şêrîn e,  
Reben ez im  
Gerdan zer e,  
Hey gidîno gerden zer e,  
Reng esmer e,  
Esmer ezê bi tekim tu rabiyê dihebînî ezê bimeşim kaniya binya mala Ereba Axa  
Bi avirê çevan  
Bi qinyatê dilan  
Bi eşaretê destan  
Bang li te bikim,  
Tu Xwedê dihebînî mezkê zû bike were  
Deşîfrekirin: Zekî Gürür*

### **NÊÇÎRVANO**

*Lo lo Nêçîrvano, Sekvano bihare li vî berî ha li vî berî  
Evdalo gelo vê sibengê li vî berî ha li vî berî  
Sekvano, hey malmîrat tu çawa ji xwedê diwêrî  
Tu ji malê sar dibî Bozî Çaçanî Kapresî çavreş  
bêşlike Romê davêjî milê çepê  
Cotê tajîyê kemê resê xezalî davêjî mere  
Gidî gelo tu sêhr bike li qarişi konê mala bavê min rebena xwedê dajo li vî  
henberî Sekvano  
Hey malmîrat tu nizanî vê sibengê ez Xezal im, Xezal a Egit im  
Gerdena min zer e, çepilyê min dirêj e, porê min kej e  
Nava min qendîl e, zenda min bazin e, tilya min bi gustîl e  
Sî û sê gulî ser namilya min bune çîte  
Tu dêna xwe bidê di dêrisê gundê me da bîst û çar eşîrin  
Hela bala xwe bidê îro çendê me tamam bû bê bextîya meke  
Vê sibengê ser milê xwe ê çepê bizvire ser ucan li gencê xelkê mêze ke  
Tu bala xwe bidyê seva xatirê çav û biryê minê reşû belek  
Di dêrisê gundê me da ketine dawê, wê hê bîst û çar serî  
De lo lo ê lo ê lo Nêçîrvano way ez nemînim gidiano lo Sekvano*

*De lê lê lê lê Xezalê*

*Ez bi heyran gelo sibe bû tu nizanî ez Şemo me hê hê hê ne Şemo me*

*Hey malmîrat tu bala xwe bidê vê sibengê ez Şemo me*

*Xwedanê heftsed mîyê serê di çîyê, danzdeh keêlê serê tewlê me*

*Li malê sar dibim ji Bozî Çaçanî Kapresî çavreş*

*Bêslîkî Romê davêjime milê çepê*

*Ji jor da tajîyê kemê xezalî davejime merezê*

*Berê xwe didime bêranê bilind nêçîra van Xezal a*

*Tu bala xwe bidê di dêrisê gundan da tu sêhr bike*

*Ji xênî muhuba dilê xwe ne bi aşiqê qîz û bûkê di xelkê me*

*De ancax bi aşiqê rihma ha di Xwedê me*

*De lê lê lê lê Xezalê wax ay*

*Bejn ziravê, çepil dirêjê, por kejê*

*Nav qendîlê, suret sorê, rû bi xalê*

*Ezê li Birca Belek runiştîme,*

*Qasekî were li kêleka min runê, li yalî malê*

*Lo lo Nêçîrvano lo lo lo lo...*

*Lo Sekwano bihare malê me danî zozanî jorîn ber beleka*

*wê hê hê hê ber beleka*

*Hey malmîrat te anîye serê pir û pir gelean*

*Bi malê dinyaliga derewîn bawer me be vê sibengê*

*Tim û tim caran poşmanîye te yê têda hebe*

*Tu bala xwe bidê vê sibengê ezê tu nifirê li te nakim*

*Belkî hêvî gumana min heye ji Xaliqê Alemê rebê jorîn,*

*mîrê ji mîra, ji şêxê melean*

*Tu sêhr bikê vê sibengê malxirabo, tu bala xwe bidê belkî vê sibengê*

*Tu qir bikî hefsed mîyê serê di çîyê, danzdeh keêlê serê tewlê*

*Di darê biharê ra bi hasilê dewê heft çêlekan*

*De lo lo lo lo Sekwano wêy axa*

*Lawiko serê min bi heyran canê min bi qurbano*

*Deşîfrekirin: Zekî Gürür*

## **EMRO**

*Emrooo,*

*Emro sibe ye qîz û bûkê gundê me meşiyane avê*

*Delal, bejn ziravan çepil dirêjan, por kejan nav qendîlan*

*Xwe dane pêşiyê.*

*Kinan û miskînan û dêkotiyên*

*Xwe dane dawiyê.*

*Qemera mine bi nîşan dixemilî,*

*Ser xatirê dilê rezîl, xwe dabû navê.*

*Gelî gundî û cînarno,*

*Gilî, gazin û loman ji min nekin.*

*Min sond xweriye tu caran,*

*Di ser kewa xwe ya kubar ra*

*Li tu qîz û bûkê xelkê nakim*

*Merhebatî û tu silavan*

*Gidîno kubara min nazik û nazenîn*

*Fenanî bayê şokekê, ji golê xêmûr rabe*

*Etekê sinê bi sînekê pelê xwe diweşîne,*

*Ji berfê, ji qirawiyê, ji xwenavê.*

*Eman dê ecemê lê.*

*Dîlberê ji bo xatirê navê xwedê ve,*

*Ezê ji bona te mirî me,*

*Ax zalimê nizamî lo tu çawanî?*

*Emroooo*

*Emro sibe ye, vê sibeyê diçûme Heleba şewitî,*

*Cîhê gewran û rindan.*

*Dîkê şevê nivê di şevê min xulxuland.*

*Delal, welatê xerîbo, dûr û ji bi beraz bûm.*

*Ezê nexweşê bêhal nexweşê nava cîh bûm.*

*Bê qewm û bê lêzîmo, bêkeso, bêxwedî bûm.*

*Serê min ser balgîh bû balîfê, çavên min li xewê bû.*

*Guhê min li guhdariyê bû, min serê xwe ji xewa şirin bilind kir.*

*Min dît cote pîrê melûmê keza ber serê min sekinibû.  
Bexê yekî kefenê min dibirî  
Yekî meqes hilda difesiland.  
Mirin emrê xwedê ye ez dimirim.  
Min dît kubara min xwe dabû ber pencerê.  
Bi qram û derheman kilê siphane  
Di kira belek çawa,  
Bê dîlberê xwezila min bizanibûya.  
Gavê din da tê ji kê ra dineqîşiya, dixemiland.  
Eman dê ecemê hayêêêêêê  
Dilberê ji bo xatirê navê xwedê ve  
Ezê ji bona te mirî me.  
Ax zalimê nizanim lo tu çawanî?  
Deşîfrekirin: Zekî Gürür*

### **BAVÊ BEHCET**

*Hey li minê, wey li minê hey wey axayo.  
Dilşê digo lo lo Beçhet bexê,  
Sibe bû ezê diçûma şewitiya Sînaniya Bismilê.  
Min rebenê bala xwe berdayê,  
Nizanim çi bû çi qewimî, lo çi ciriya.  
Agirê kulê bikeve mala cendirmeyê Sinaniyê,  
Mefriza Bismilê eşîra Badika, giregirê di Xîya.  
Li derê dîwana bavê Behçet, şêxê kubar,  
Şêwrû min şêwre bû, hewu rebenim gelo li hev civiya.  
Min dît bavê Behçet şêxê kubar,  
Çek û silahê xwe hilanî  
Bi hafê riza, baxçeyê gula da dimeşiya,  
Ewraqê bavê Behçet ketibû destê gire gira Badika di Xîyan.  
Li derê hikumeta Sinaniyê bismilê,  
Reben ez im gidîno daîre bi daîre digeriya.  
Agirê kulê bikeve mala qumandanê Bismilê,  
Mefriza xwe hilanî ketibû Geliyê Godernê,  
Newala Hesikê li hafê reza.*

*Min rebenê bala xwe berdayê li dû  
Bavê Behçet şêxê kubar ji xwe ra digeriya.  
Derbekî bi destberdanê bavê Behçet şêxê kubar,  
Cinyazê bavê Behçet avêtine makineya,  
Berê wî dane şewitiya Hezro,  
Dema li derê hikumeta Hezro da datanî,  
Dilşê li çokê xwe dixist,  
Digot lo lo Behçet berxê,  
Hînga min dizanibû,  
Urt ocaxê mala bavê Behçetê min qeliya.*

*Sovyê xerzê digot mecîdê zaza bibê-je-  
Komê xulama hûn merevin ca hûn bazmedin.  
Lawo bavê Behçet şêxê kubar,  
Emekdar e, çibû îro ketiye erdê temiya min li we be.  
Şîrheramiyê nankoriyê mekin,  
Terka cinyazê bavê Behçet, siwarê felek  
Hey wax li min vî xweşmêrî medin*

*Dilşê digot lo lo Behçet berxê,  
Sibe bû roka me derketiye qudretê.  
Ji mala xwedê ji aliyê Xerzan.  
Tu dêhna xwe bidê şewq û şemalê,  
Dabû bejna bavê Behçet, koçka zerçelê  
Reben ez im, ji xwe r ali sêncî riza.  
Hela bala xwe bidê girêdana bavê Behçet.  
Şêxê kubar li gul û gul ax li gulbenda li van Xerzan.  
Xwezil ji xêrê xweziyê di xwedê ra,  
Xwedanxêrkî mizgîniyekî ji xêrê bianiya,  
Bigota, efûya bavê Behçet ji qapiyê hikumatê derketiye.  
Bi çavê serê xwe bidîtiya fenanî cara  
Li qarşî xort û bendê di Xerza,  
Xwe girê bida bi çil qaîdê, bi diwazdeh terza.*

*Soyyê xerzê digot mecîdê zaza bibê-je-  
Komê xulama hûn merevin ca hûn bazmedin.  
Lawo bavê Behçet şêxê kubar,  
Emekdar e, çibû îro ketiye erdê temiya min li we be.  
Şîrheramiyê nankoriyê mekin,  
Terka cinyazê bavê Behçet, siwarê kuvî  
Hey wax li min vî xweşmêrî medin  
Deşîfrekirin: Zekî Gürür*

### **LO AXAWO**

*Lo axay axayo  
Lo lo maqulo sema dîyarê Cemalvêre diketin biavêje  
Tu bala xwe bide helhelîna bava qîziniyê çapila martêla  
Tivinga destê Seyidêxan malê romê baruta xwe dirêje gula xwe xweş diavêje  
Her çî dîvana egîtê mala bavê min tê da runiştibe  
bila kes rumenê xeberê kin ne dirêj mebêje.  
Rabe, her çî dîvana egîtê mala bavê emîn tê da runiştibe  
kes rumenê xeberê kin ne dirêj mebêje.  
Teybo bi sê denga bang dikir digot Seyidxan mala te xirab be.  
Helhele ez herim mala bavê Salih bexê mala Usivê Seydo.  
Peyayê xerîb mêrê mêrxas kewê ribat ne ez birayê te me.  
Min bi telaqê jin berdanê sond xweriye.  
Li devê Muradê fişeng avêtiye devê çapiliyê  
Gelo vê sibengê gerek îro Cemalvêrdê mêran bikujim.  
Fenanî miya ku berxa xwe winda bike dê ewladê milê xwe biavêje  
Hela danê hela danê egîtê mala bavê min nemayê hela danê  
Ez j ite re sond bixwim, sonda qesemê bi navê quranê  
Bexê mala bavê min bêhna barûdê hildane.  
Sond xwerin bi telaqê jin berdanê heya mêran nekujin  
Bi silametê ra nabin ji erasa vê meydanê*

*Lo axayo axayo axa.*

*Lo lo maqulo sema diyarê cemalvêrê diketin darî ter e.*

*Sibeye Seyidxan derketiye banê bi sê denga bang dikir Sdiqê Hecî Mistefa Begê*

*Ez bextê gora bavê te ketime, pêşiya fîrarê me berde  
Gidî fîrar gunehne bira derbas be here.  
Ey malmîrat, tu nizanî çend salê me tamam bû  
Hikumeta cimhuriyetê li sirgun kirina çolix û çocixê birîna serê me digere  
E Sidîqê Hecî Mistefa Begê digot welle nabe billa nabe  
Min serê Şêx Bahdîne erdê Dignugê sond xweriya tu car nabe  
Heya li dinyayê sax û silamat bim fîrarê Seyît û Berazan nayên  
Bi silametî di ser min ra derbs nabe.*

*Rabe, Teybo bi sê dangan band dikir got Seyîdxan mala te xerab be  
Helhele ez herime bavê Salih berxê mala Usivê Seydo.  
Peyayê xerib, mêrê mêrxas kewê ribat ne ez birayê te me  
Min bi telaqê jin berdanê sond xweriye  
Li devê muradê fişeng avêtiye devê çapiliyê  
Gerê îro cemal vêrdê îsmet xerabo mêran bikujim.*

*Ez ji te ra sond bixwim fenanî miya ku berxê xwe wenda bike  
Gidî dê ewlatê milê xwe bigere.  
Hey malmîrat li şerefa mala me ra eyb e.  
Li ber xelkê tu negere.*

*Tu nizanî peyeyên bikevin qarşî kozika birayê te bi tenê.  
Ez ji te re sond bixwim bi telaqê jin berdanê bi sax û silematî  
Bi ser çolix û çocixê xwe da venagere.  
Hela danî hela danî egîte mala bavê min nemayê hela danê.  
Ez ji te ra sond bixwim sonda qesemê bi navê quranê  
Beroxê mala bavê min gulîbirê bêhna barutê hildane.  
Sond xwerina bi telaqê ji berdanê  
Heya mêran nekujin, bi silametî ra  
Bi silametê nabin ji erasa vê maydanê.*

*Lo axayo axayo axa.*

*Lo lo lo maqulo sema vê dîyarê cemal diketim çem û kanî  
Sibeye musa derketiye banê bi sê dangan bang dikir sidîqe Hecî Mistefa Begê.  
Li bextê gora bavê xwe ketime serê xwe ji xewa şêrin bilind bike.  
Hela bala xwe bide helhela law û bavan qîrçîniya çapiliyan û martêliyan  
Fîrarî Seyîdan û Berazan bi nimêja sibêr a gunf hilanî*



*Ca agirê kulê bikeve mala xelkê Entapê ser serê egîte mala bav êmin nemayê  
 Ji êvar de agir dadan kirin kafrdistanî.  
 Rabe, Teybo bi sê dengan bang dikir got seyîdxan mala te xerab be,  
 Helhela ez herim mala bavê Salih berxê mala Usivê Seydo.  
 Peyayê xerib mêrê mêrxas kevê ribat ne ez birayê te me.  
 Min bi telaqê jin berdanê sond xweriye  
 Li devê Muradê fişeng avêtiye devê çapiliyê  
 Gerê îro cema vê ardê Sdiqê Hecî Misfeta Begê Musa Begê tevî Mamê begê  
 Komê xulaman bikujim.  
 Li qarşî çolix û çocixê wan çek û silahê wan ji desta bitsînim bi mêranî.  
 Xelk bizanibe lawê bavan hebû li piştî xerabiyan  
 Xelkê ji bîr nekir heyfa xwe hilanî.  
 Hela danî hela danî egîte mala bavê min nemayê hela danê.  
 Ez ji te ra sond bixwim bi sonda qesemê bi navê quranê  
 Berxê mala bavê min gulîbirê bi dil û cigerê xwe given in.  
 Sond xwerine bi telaqa jin berdanê  
 Heya mêran nekujin bi silametî ra nabi  
 Deşîfrekirin: Zekî Gürür*

## **ASÊ**

*Asê cerdê ye,  
 Delalîka dilê min ji konê mala bavê xwe  
 Meşmeş bike ax were li konê me ye.  
 Go kuro delalîko,  
 Awirê çavan, qinyatê dilan,  
 Ji dûrî va boş e ax bê fayde ye.  
 Destê min esmerê bigre,  
 Birevîne biavêje konê.  
 Ebvilmecît begê Sîpikê tu nizanî,  
 Axakî di axayê pir zêde ye.  
 Hey bêbexto tu nizanî  
 Heya dinya xweş û ava be,  
 Taxima sîng û berê min keçikê,  
 Li meydana lo hezinê te ye.*

*Hey lo li min hey lo li min delîlo.  
Kuro delalîko min ji te ra negot dilçeten e.  
Malxirabo li derê mala bavê min nere neyê,  
Li qarşî kon ême nesequine.  
Tu nizanî malxirabo der û cînar,  
Temamî fesadê me dilê teva min e.*

*Keçikê dînê ez neyarê sibengê malxirabo.  
Ezê li derê mala bavê te sekinîm,  
Derdê dilan lo ez kuştîme.  
Malxirabê tu dêhna xwe bidê vê sibengê,  
Birîna min birîna pîrr zêde ye.  
Ezê vê sibengê () bisekinim,  
Li derê konê jêrîn konê me ye.  
Tu rabe bejna zirav bide ()  
Gelo vê sibengê malxirabo qolê zêran  
Bikute eniya kever, sê cerge ye.  
Malxirabê tu bala xwe bidê,  
Awirê çavan, qinyatê dilan, eşaretê destan.  
Boş e, lo bêfayde ye.  
Bextê te û xwedê ketîme, tu ji destê min bigre.  
Ezê bi destê bigrim biavêjim,  
Mala Hurşîr begê lawê evdilmecîr begê,  
Ew xortekî ji xortan zêde ye.  
Ez ji te ra sond bixwim vê sibengê,  
Axayekî li şertê xwe ye.  
Ax ax dilçeten e.  
Esmerê dilçeten e, vê sibengê  
Te dilê min kiriye vê sibengê malxirebê.  
Gurzekî gihayê kode agir ji (siwêdê) bigre were,  
Binihêre tu dêhna xwe bidê,  
Ez ji te ra sond bixwim.  
Fenanî agirê darê palutê,  
Kesek ji ber dilê rezîl nasequine.*

*Kuro delalîko,  
Gotina te çi qas gotineke xweş e.  
Binya mala me bi ce ye.  
Hatîn û çûyîna alemê ji xwe ra temamî  
Gelo ji xwe ra qiyale ye.  
Kevir û kuçikê rûdinyayê  
Ji bextê min û te ra paleme ye.  
Fesad û şeytanê gundê me temamî  
Bûne fesad û şeytanê li dora min û te ye.  
Ez bextê te û xwedê ketime,  
Min jê nivîsiye, darê kemal kekê  
Cemal axayê, axayekî pir zêde ye.  
Tu destê min esmerê bigre,  
Biavêje ber bextê axayê xortan.  
Gelo bejna zirav xwe daye simêla sora yasme ye.  
Hay lo li min hay lo li min dilçeten e.  
Esmerê serê rihana dilçeten e,  
Malxirabê te dilê min kiriye  
Fenanî gurze gihayê kode.  
Agir bigre serî şewat were,  
Tembîh û weyseta min li te be.  
Lawiko li qarşî konê me nere  
Neyê berxo lo neseke.*

*Deşîfrekirin: Zekî Gürür*

### **DEWRÊ**

*Ê de dewrê dewrê dewrê  
Ê de dewrê sibe ye, dilê min  
Hêlîna teyrê di sîmir e.  
Bexê gidî bira lê nexista  
Sira sibê bayekî gur e.  
Gidîno meraqa min gelek e,  
Kula ma li hindir e.*

*Xwedê xerab bike fesad û şeytanî.  
Welatê min ra qebûl neke qe hilne de.  
Şeva rêyeka li (hjlşlkj) xanima porsorê,  
Ji hewşa mala bavê min dibire,  
Bê dewranê dewrê.*

*Ê lê dewrê gelo li me sira sibê, bîhna bê tê.  
Gidîno kanî dûr e,  
Mihuba dilê min ji av êtê.  
Hela bala xwe bidê qerdena zer, qolê zêran,  
Bejna zirav, kembera zivîn çî qas lê tê.  
Ê gidîne narîna li ((tîwatê)) xanimê  
Siwarê porsorê ki hewşê tê.  
Hûnê pirsaxayê keçikan ji min dîkin,  
Bi çalima berê ji çawirmê jêrê ji axê tê.  
Bê dewranê dewrê.*

*Deşîfrekirin: Zekî Gürür*

### **XANÊ**

*Le kula giranê tu bala xwe bidê  
Vê sibengê, ez ê li du sêvê xelatê diketim dar û tirî,  
Sêyr bike ji gavê din da gelî gundî û cînarno  
Tu bala xwe bidê vê sibengê  
Xana min ji xwe ra ji malê derketiye,  
Gelî gundî û cînarno ji xwe ra runiştîye,  
Li ber dara dergûşê.  
Hela bala xwe bidê ji kedera  
Dilê minê bi kulê bi meraq ra,  
Vê sibengê ji kedera dilê rezîl ra dibêje,  
Gelî gundî û cînarno ji xwe ra wa digirî.  
Gelî gundî û cînarno!  
Xelq bû aşiqê mal û halê temel û dinyalikê,  
Ez evdalê xwedê bum aşiqê  
Girêdana qolê bafilê gelo vê sibengê,*

*Dev û lêvê siyanê de xerab be,  
Dev û lêvê şekirîn yanaxê ehmedî.  
Terzê di hakimê şemlê di erebî,  
Tu bala xwe bidê şê û şêbiskê di çêkirî.  
Ezê bibêjim xanê,  
Kula pir giranê,  
Derdê bêdermanê,  
Tu rabe vê sibengê li destê min bigre malxirabê,  
Xwe biavêje terkiya lawê merikê qereçobanê,  
Siwarê li ser hespê ru bi xwir î.  
De kula pir giran î,  
Derdê bê derman î,  
Derdê bêderman bikeve  
Can û bedena mêrê misilmanê,  
Te heft xortê mala bavê min kuştine bi ramûsanê,  
Tu bala xwe bidê xwîna van xweşmêran kanê,  
De xanê de xanê de xanê.*

*Deşîfrekirin: Zekî Gürür*

### **SEBRÊ**

*Sebrê dilê rezîlê wê li mayê,  
Were hay.  
Hewu zalimê dilê rezîlê min dil tê da,  
Ji xwe ra ca li wê ma.  
Gidîno belekê berfê diheliya,  
Gelo li quntarê çiyê ma.  
Sebrê yazî min qedere xwe dane li jorê,  
Li hêviya xaliqê alemê rebê jorîn.  
Bexê li jêrê li hêviya maqulekî çê man.  
Kê ditiye kê bîna ye, tu dêhna xwe bidê vê sibengê,  
Her du dilê maşûqê din ji hevdu biqetin,  
Bihar e, yek derkeve zozana,  
Yek di dêrisê gunda da li ber germê ma.  
Êrê derî welato, welatê me nîne.*

*Gidîno welatê gêwir e,  
Tu dêhna xwe bidê herçî kesê di dêrisê gunda da,  
Mihuba dilê wî tune be,  
Ez ji te ra sond bixwim bê qedr e, bê rûmet e.  
Sebrê qedr û qiymeta wî tunîn e.*

*Sebrê gelo li bilinda wayê li bilinda,  
Were hayê hayê.  
Hewu zalimê min ji te ra negot li bilinda ha li bilinda.  
Bihar e,  
Li welatê me hatiye pelê gulê û sosin  
Rihan û leymûnê li me vebû.  
Qedera min bi reş bû şansê min tune bû.  
Berfêkî li me barî.  
Pelê gulê û sosinê ma di bin da.  
Ezê rabim destê kubara dilê xwe bigrim,  
Di kêfê ra bimeşim dêrisê gundan.  
Qasekî rûnim li nava dêreçitan,  
Mêzerhêşinan, laçikspîhan,  
Kuwlikêlan, çepildirêjan,  
Gerdenzeran, bejnbilindan.  
Hewu rebenim vê sibengê li kêleka gewran û rindan.  
Lo bêbexto, çi bêbextibû di gundê xerab da,  
Derba xençerê te li min da.  
Kê dîtiya kê bînaye,  
Her du dilê maşuqê di hevda ji hevdû biqetin,  
Bihar e, tek derkeve zozanan,  
Yek bimîne li germ û germistana kawilê gundan.  
Êrê zerî welato, welatê me nîn e.  
Gidîno welatê gêwir e, kesîretiya giran,  
Derdê xerab ji xwe ra ma di dil da.  
Ew herçî kesê ku di dêrisa gunda da,  
Mihuba dilê wî tune be,  
Ez ji te ra sond bixwim,*

*Bê qedr e, bê rûmet e,  
Sebrê qedr û qiymeta wî tunîn e.  
Deşîfrekirin: Zekî Gürür*

### **DELAL RONÎ**

*Dilber heyran ji vebû gelo vê sibengê  
Min ji te ra negot malxirabo  
Delal ez bi qurban,  
Gelo ji te ra dibêjim delal ronî.  
Malxirabo gelo li ber çavê min keçikê  
Tu mum î, tuş meşal î,  
Wey la li min nemayê,  
Dîsa lo çira danî,  
Wî bêbexto gelo vê sibengê  
Rabe bi qayidê xortê xerzanî  
Xwe girê bide vê sibengê,  
Dîsa tim û tim caran  
Li ber çavê min,  
Tu gula kon î.  
Hewar xwedê,  
Gelo ji xwe qîz û bûkê xelqê  
Radibim tişte (pişt te) nîne  
Herkes rojê dostekî dihebîne.  
Ez ji te ra sond bixwim bi sonda qesemê  
Bi navê quranê  
Di dêrisê gunda da  
Heya ez sax bim,  
Dîsa ji min ra berxo dîsa tu son î,  
Yemaan gidî.  
Ax delal delal delal delal şênî.*

*Deşîfrekirin: Zekî Gürür*

**T.C.**  
**Mardin Artuklu Üniversitesi**  
**Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü**  
**Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı**

**Yüksek Lisans Tezi**

**KÜRT DENGEBÊJLİK GELENEĞİNDE ŞAKIRO**  
**(HAYATI VE ESERLERİ)**

**Serdar ÖZTÜRK**  
**10711015**

**Tez Danışmanı**  
**Yrd. Doç. Dr. Hayrullah ACAR**

**Mardin 2014**